

•

Morfolojiya kurdî ya hemdem

•

Abdusamet yigit

Soran Felsefe

·
·
·
·
Morfolojiya kurdî ya hemdem
Abdusamet yigit
@Abdusamet yigit
Çap 2
Berlin/2015

·
email: han-grafik@hotmail.de

·
Çap û Grêdan :
Concept medienhaus
HAN-GRAFIK Verlag & Werbeagentur
Bûlowstr. 56-57 10783 Berlîn
ISBN 978-3-945956-01-4

MORFOLOJÎYA KURDÎYA HEMDEM

Ziman, weke heyîneka ku hebûna tşkiliyê didêne, ku mirov li wê dihizirê, mirov wê ziman di çerçoveya tşkîneka dîrokî ya ku bi wê re û bi jîyanê re pêşketiya jî fahm bike û werêne ser ziman. Her wusa, tşkîna ziman, weke tşkîneka ku mirov divê ku hûr û kûr li ser wê bisekinê û wê werêne ser ziman. Ziman, dema ku em wê di hildina ku dest, em nikarin ji aliyekî wê ve ji tşkîne zêhnê û heyîna wê dûr werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku tşkîna ziman, bi giringîya wê re weke tşkîneka ku mirov divê ku wê hilde li dest û fahm bike ya. Mirov, tiştta ku di jîyanê de dît, mirov wê êdî wê salix bike û werêne ser ziman. Lê li vir,, dema ku mirov bahse gotina salixkirinê dike, mirov bahse çi dike? Mirov di keve wê zanînê de ku mirov bahse hişariya di derbarê rewşê de dike. Yanê, bi 'wêne kirina rewşê' ku em di çerçoveya tşkîna morfolojikî de hilde li dest, her wusa di vê çerçoveyê de wê weke aliyekî tşkîniê ê hişî û hişarî jî xwe bide dîyarkirin. Mirov, dema ku rewşê di mejiyê xwe de salix dike, mirov wê rewşê, baş fahm bike. Ankû, mirov wusa di xwe de zan dike.

Li vir, rastîya salixkirina gotinan, deman ku mirov li rewşê dinerê, her wusa li ser wê re dike. Lê li vir, berî ku em di destpêkê de vê şîrove bikin, divê ku em bi tşkîniya dîrokê, her wusa li ser 'gotin'ên ziman re hinekî bi dîrokê re bimeşin û werênina ser ziman. Hizirkirina bi jîyanê re her wusa,

li vir, weke aliyekî ku mirov divê ku wê baş werêne ser ziman. Her wusa, li vir, dema ku em bahse salixkirina gotinan dikin, em bi wê re bahse têgîna bi dîrokê re ku pêşketî jî dikin.

Em vê yekê divê ku werênina ser ziman ku bi dîrokê re zanîna pêşketîya. Ev gotina, zanîna me bi dîrokê re pêşketîya, weke gotinaka 'razber' a û li vir, dema ku mirov li ser ziman re hewl dide ku rengê pêşketina bi mejiyê xwe re fahm bike, hinekî jî bê, êdî di çerçoveyê re ew razberî wê vegehihê li 'şenberîyeka' ku em li vir dikarê bi heyîn û hebûna ziman re werênina ser ziman a.

Aqil, dema ku em bahse wê dikin, bi dîrokê re pêşketina wê re, her wusa bi pêşketina ziman re mirov wê dihêne ser ziman. Rastkirina pergaliya pêşketina aqilî, her wusa wê li ser darêjka ziman û gotinên re bê. Ev jî, wê weke aliyekî din ê ku em li vir, bi têkiliya ziman û aqil a bihevdu re ku hildina li dest û werênina ser ziman a. Rastî, li vir, dema ku mirov bahse aqil dike, mirov bahse pergaliyek têgîn a li hevdu hûnayî ya ziman jî dike. Di vê çerçoveyê de mirov divê ku werêne ser ziman ku ziman, di vê çerçoveyê de weke aliyekî giring ê ku mirov li vir weke 'hîm' hilde li dest a. Dema ku mirov di çerçoveya 'gotin' û 'ziman' de dihilde li dest, mirov dibînê ku ziman, weke aqilê li hevdu hûnayî dihe li ber me. Ji xwe filosofên serdemên kevnara û piştre ên serdemên navîn, ku ev rewş hinekî jî bê didîtin û li ser wê re bahse aqil bi 'gotinên ziman' re dikirin. Her wusa, ên ku aqil ji hûnandina gotina a li hevdu û pê ve, dîtina jî, di vê çerçoveyê de li ser vê têgîn û dîtîna re hizrên xwe hanîna ser ziman. Li vir, dema ku mirov di vê çerçoveyê de li rewşê dinerê, her wusa, ya ku dihê li berçavên mirov, ew a ku weke ku 'aqil ji gotinan a.' Ev weke têgîneka ku bi demê re temenê hizirkirina mirov a bi demê re jî ya. Bo vê yekê, têkiliya aqil û ziman, hertimî, ketîya ber nîqaş û lêpîrsînê de. Di vê çerçoveyê de em divê ku ziman baş fahm bikin. Bo hizirkirineka bi aqilî û pêşketina bi demê re ziman û têgîneka wê bi 'rewşên wê wênakirina bi gotinî' û hwd, di çerçoveya têgîna morfolojikî û hwd de, divê ku mirov wê werêne ser ziman. Her wusa, bi gelek minaq û têgînî dîrokî ên felsefîkî dikarê ev mijar werê berfiretir kirin. Emê li vir, bi teybetî, di çerçoveya zanîna morfolojikî de bi dîrokî re hewl bidin ku têgîna zimên bi pêşketinên wê ên di jîyanê de re fahm bikin. Ev, wê bo pêşketineka hemdemî a bi demê re jî weke pêwîstîyeka giring a bi berpîrsîyarî bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê li ser ziman re werêne ser ziman ku rêzimanîya ziman, di çerçoveya

gotinên wê yên ku bi hevdûre hatina hûnandin re wê xwediyê temenekî ku em li vir hewl bidin ku fahm bikin bê. Her wusa, gotinên ziman, dema ku mirov li wan dihizirê, di vê çerçoveyê de em dibînin ku bi ziman re dema ku dihên ser ziman, bi dengekê ku bi wê re dihên derxistin re dibin. Ev aliyê gotinê ê morfolojikî û hwd jî, wê her wusa di çerçoveya darêjka li hevdû hatî, wê xwediyê têgînekê bê. Den, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov bi wê levkirina wê re wê fahm dike. Her wusa, her deng, wê di vê çerçoveyê de xwediyê wê adilandina ku bi wê re bê. Ev adilandin, aliyê wê dengî û ankû gotinî, bi wê re aliyê wê fîzyolojikî ku di laş xwe de biadilandina wê re ku li gorî wê dibê jî, weke mijareka ku divê ku mirov wê li vir bi teybetî hilde li dest û fahm bike ya.

Aqil û ziman, weke mijaraka giring, di vê çerçoveyê de dema ku em bi têgîneka rêzimanîya zimanî re lê dinerin, ew têgîna 'zimannasîya gerdûnî' xwe biwê re dihêne ser ziman. Têgîna aqil û her wusa bi gotina aqil re hewldana fahmkirina ziman, di vê çerçoveyê de, wê me bi xwe re bibe û bigihêne têgîna 'zanîna zimanî a gerdûnî' jî. Ev jî, her wusa, divê ku mirov wê bi teybetî werêne ser ziman ku bi aqil û piştre weke ku me bi felsefeyê re hanîna ser ziman bi 'zêhnê' me re ew dihê û dibê.

Em ku ji kîjan aliyê ve jî lê binerin, em dema ku di çerçoveya zanîna ziman de dihizirin, her wusa, di vê çerçoveyê de têgîneka aqil û ankû ya 'aqilê zêhnî' xwe dide dîyarkirin. Ev jî, her wusa, di temenê wê de weke hîmî hişarî heya. Em li divê vê yekê bi aqil kifş dikin. Rewşa aqil, dema ku mirov wê dihêne ser ziman, di vê çerçoveyê de zêhnê mirov jî xwe dide dîyarkirin. Têkiliya di nava ziman û aqil de, wê bi hişarîya rewşî a ku dibê re rastîyeka zanîna ku em bi zêhn werênina ser ziman, wê bi me re bide têgihîştin kirin. Ev jî, her wusa, wê weke aliyekî giring ê zimanî û têgînî ê felsefikî jî bê. Li vir, dema ku em bahse felsefeyê dikin, em di farqê de na ku em bahse zêhn û pêvejoyek pêşketinên bi aqilê xwe re dikin. Her wusa, di vê çerçoveyê de, em divê ku bi gotina 'felsefeyê' re li ziman û pêşketina wê ya bi demê re bihizirin. Ev jî, wê weke aliyekî giring bê. Ji xwe dema ku em bahse gotinan dikin, di mejiyê me de, ew yeqînî diafirê ku mirov bahse 'aqil' dike. Her wusa, di vê çerçoveyê de, têkiliyeka dinava ziman û aqil a ji navikê ve ku heya, vê têgînê û hişmendiyê bi me re dide çêkirin.

Em li vir, divê ku vê yekê baş fahm bikin ku ziman, weke gotinna, tenê mirov nikarê wê werêne ser ziman. Her wusa, ji wê zêdetirî, divê ku mirov vê yekê pêşdedit bibe. Felsefeya serdemên navîn, her wusa di çerçoveya

‘têgîn û madeyê’ de hildeya li dest. Her wusa, felsefeya Manî, di vê çerçoveyê de, wê weke têgîneka hîmî bê ku em karibin wê li vir werênina ser ziman. Piştî wî re, li dûv hevdû Sipînoza û piştî wî re Descartes, wê di vê mijarê de û di çerçoveyê de hizrên xwe werênina ser ziman. Hizrên Descartes ku em dikarin di çerçoveya têgîna ‘zêhnê’ de werênina ser ziman, li vir, ji têgîneka ‘madeyî’ na buhurê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê xwe bide dîyarkirin.

Em li vir, vê yekê fahm dikin ku aqil, li vir, pêşketineka dayimî ya ku bi mejî re dide çêkirin. .. Ev jî, her wusa dema ku mirov li wê dihizirê, bi dayimîti û demê re wê bi gotinan reherîkîneka tevgerî ya afrîner jî bide çêkirin. Ev tevgerîtiya afrînerî, her wusa wê weke temenê têgîneka afrandina zimanê hemdem û dengtêgînîya wê bê. Em li vir, dema ku vê yekê dibêjin, em di mejî xwe de timî têgîna ‘darêjkê’ jî zîndî dihêlin. Di wê çerçoveyê de, em dema ku gotinên xwe di hunin û dihênina ser ziman, em her wusa bi wê aqiliyê dihênina ser ziman. Lê li vir, dema ku mirov bahse wê teginîyê dike, em li vir divê ku vê yekê werênina ser ziman ku zanîna ziman, her wusa, wê xwediyê afrînerîyeka bidemê re bê. Zanîna bi aqil, ku ziman, wê dike ku ‘kifş bike’ û ‘werêne ser ziman,’ wê her wusa di vê çerçoveyê de weke têgîneka bi dîrokê re ya ku wê were esas girtin bê. Em li vir, di vê têgînê de na ku ziman xwediyê wê pêşketina bidîrokê re ya. Her wusa, di vê çerçoveyê de, bi ziman re levkirina bi pergali ku heyîya kirin û çêkirin, wê rengê aqilê me jî bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de ziman, weke aliyekî giring ê domandina jîyanê, divê ku mirov wê werêne ser ziman. Jîyan, di çerçoveya wê pergaliya xwe ya ku bi wê re heya de, ew pêşketina ku em bi wê jîyan xwe re dijîn, wê bi ziman re xwe bi pergaliyeka ku bi wê re di ahengekê de ya re wê werêne ser ziman. Ev jî, her wusa ziman, bi wê rastkirina wê ya bi gotinan re dike ku weke aliyekî têgînî ê di jîyanê de ku levkirî bê, werêne li berçav. Li vir, têgîna darêjkê, divê ku mirov bahse wê bike. Ev jî, wê her wusa bi gotinê re xwe bide dîyarkirin. Her wusa, dema ku em bahse gotinê dikin, em bahse darêjkek têgînî ya bi hişar bûya dikin. Di vê çerçoveya wê têgînê de morfolojiya zanîna ziman û dengên wê xwe êdî biçerçoveyî dihêne ser ziman û dide dîyarkirin. Hizirkirina bi aqil, wê weke aliyekî giring bê. Her wusa, em li vir, vê çerçoveya bi gotina ‘hizirkirinê’ re ku hewl bidin ku fahm bikin, emê hingê, bi wê re bigihijina wê têgîna zanîna ziman û gotinên

wê ên bi demê re ku dibin in. Çêkerîya zimanî a bi zanîna wê re jî, di vê çerçoveyê de mirov divê ku wê werêne ser ziman.

Ku em hewlbidin ku rastîya ziman, di çerçoveya wê ya dîrokî de hildina li dest û fahm dikin, divê ku em di serî de pêşketinên bi dîrokê re di berçav de bi wesîfîye wan re hildin li dest û fahm bikin. Li vir, divê ku ez vê yekê werênina ser ziman ku dema ku ez li ziman, dihizirim, hûy û tevegerîyên mirov ên civatî bi awayekî zêhnî dihênina berbîra mirov. Her wusa, ji vê yekê, dihêê fahmkirin ku bi zêhnî, têkiliya ziman tevger û xûyên mirov re heya. Dema ku mirov ji aliyê zêhnî ve dinerê, bi karîgerî û gêrûfê mirov çerçoveya wê ya zêhnî, her wusa mirov dibînê. Ev jî, her wusa di temenê wê de têgînna zêhnî ên dîrokî ku bi dîrokê re pêş dikevin, di temenê wê de na.

Çerçoveya tevger û xûy, dema ku mirov li wê dihizirê, di vê çerçoveyê e weke têginekê mirov kifş dike ku werêne ser ziman ku ew têkerîya tevgerî ku mirov li ser bûyîn û kirina tevgerîyan re kifş dike, bi bûyîna wan ya bi demê re, wê weke aliyekî darêjkî xwe bide dîyarkirin. Ji xwe, dema ku em bahse tevgerî û xûyan bikin, divê ku em di çerçoveyeka têkiliyekê de her wusa bi fîzyolojikî re têkiliya wê bi wê çerçoveya wê ya bandûrî re werêne ser ziman. Tevger, weke darêjkên ku mirov dikarê wan kifş bike û werêne ser ziman in.

Kirin û kiryar, her wusa, bi mejî re xwediyê heyîna darêjkî na. Mejî, dema ku li wê dihizirê, her wusa, bi wê re kifşkirinê dike. Hizirkirina mirov bo fahmkirina mirov, wê her wusa, aliyê mirovî ê aqilî bê. Ev jî, wê her wusa, bi wê re hişariyê weke ardnigarîyê ji xwe re pêşbixe û li ser wê re vê yekê bike.

Aqil, her wusa, dema ku mirov li wê dihziirê, mirov di kirinîya di jîyanê de wê kifş dike. Kirin, weke tevgerîya zêhnî a ku bi wê re xwe şenber dike, her wusa, di çerçoveya dîtina bi wê re ku bi hişarî dibe re êdî rengê xwe bifahmkirinê re distêne. Her wusa, aqil, li vir, dema ku mirov wê dihêne ser ziman, bi rengê fahmkirina wê ya di vê temenê de mirov wê dihêne ser ziman.

Di nava rûpelên dîrokê re her wusa, civate kurd, dema ku mirov li hebûna wê dihizirê, di vê çerçoveyê de mirov bi wê pêşketina wê re jî kifş dike. Çerçoveya wê ya têgînî ku em bi pêşketina wê ya zimanî re wê kifş dikin, her wusa, li vir li ser wê re êdî dikin û wê werênina ser ziman. Di kurdî de gotinên weke 'zanînê', hiş' û hwd, gotinên aqil in û bi dîrokên

xwe re ta serdemên sûmerîyan diçin. Di vê çerçoveyê de mirov wê dibînê. Gotinên weha ên zanînê gotinên ku aliyekî wan ê giring heya ku mirov dikarê wan kifş dike. Li vir, divê ku mirov vê yekê, fahm bike ku bi demê re gûharinên ku di dengên ziman de dibin, em vê di gotinan de dibînin. Minaq, gotinên a 'hiş', ku ddi serdemên gûtî, hûrî û mîtanîyan de dihê bikarhan, wê di serdemên medîya de ku weke ku di 'avêsta' de jî dihê dîtîtin, gûharîn û herîkîn di wê de bibe û bi rengê 'ûs' û hwd, xwe bide dîyarkirin. Ev rengê gûharînê, ku bi dengê re dibê, her wusa, weke aliyekî giring ê têngîna morfolojikî jî bide dîyarkirin bê. Gûharînên morfolojikî, dema ku mirov li wan dihizirê, mirov wan bi demê û dîrokê re kifş dike. Her wusa, herîkîna bi demê re ku bi dangan re dibê, wê weke aliyekî giring ê ziman bê. Ev, herîkîn, wê bi demê re temenê çêkerîyekê jî bê bi dengnasî û morfolojikî.

Herîkîna di nava dangan de, aliyekî gûharînê ê bi demê re ê ziman jî dide nîşandin. Her wusa, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov vê yekê bi awayekî vekirî dibînê. Ji wê zêdetirî, ev gûharînên bi herîkînî, wê temenê pêşketinên dengzanî ên ziman ên bi demê re jî bin. Her wusa, vê yekê, divê ku werênina ser ziman, ku dengên ku di mejî de salixkirina wan bûya, her wusa, wê aqil bi hişarî wan di xwe de bi tengîneka afrînerî lê bihizirê. Her wusa, dema ku em di çerçoveya morfolojikîya dengê zimên de ku li wê afirînerîya wê dihizirê, bi wê re mirov vê yekê weke aliyekî wê yê giring kifş dike. Têngîna gûharînê a bi demê re, mirov dikarê di vê çerçoveyê de bi gelek rengên wê ên ku dibin re werêne ser ziman. Lê her wusa, dema ku mirov di çerçoveya bi 'awakirina deng' re li gotinê dihizirê, di vê çerçoveyê de mirov bi salixkirina wê ya ku bûyî re rast tê. Salixkirin, weke têngîneka dagerî mirov wê kifş dike. Di vê çerçoveyê de minaq, di kurdî de gotina 'ga' ku weke navê sawalaka gir a, wê biheman rengî xwe bide dîyarkirin. Li ser wê re, bi teybetmendî xûy û tevgerîyên xortbûnê jî, wê bi wê re werênina salixkirin. Di wê çerçoveyê de wê gotina 'ga', her wusa xwediyê têngîneka afrînerî jî bê. Ji vê gotinê gotinên ku li ser teybetîyên "wê" re ku jê hatîna derhanîn, bi wan re salixkirina wê, wê bi awayekî pergali, têngînekê bide me. Sawala bi navê 'ga', pîrr mazin û gir a. Her wusa, ji vê derhanîna gotina 'gayê gir' wê weke têngîneka xweza a wê bê. Di vê çerçoveyê de wê Ev gotin, dema ku di temenê têngîna şibandinê de dihê ser ziman, weke 'gir ga' de dihê ser ziman. Li bir, bi şibandinê re li pêşîya gotina 'ga' bicihbûna gotina 'gir' ku mazinahiya bi cismî û

fizyolojikî û hwd dihêne ser ziman, wê aliyekî wê yê giring ê ku mirov li vir wê fahm bike bê. 'Gayê mazin', ku weke 'sawala mazin', jê re 'gamêşê' mazin jî dihê gotin. Li dawîya gotina 'ga, bicihbûna dawika '...mêş''ê, wê di çerçoveya salixkirina wê sawalê de bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de dema ev sawal, her wusa navê 'gamêş''ê stand, êdî li ser wê re bi têngîna şibandîne weke ku me di hunduvê vê paragrafê de ku li jor kir de, wê bi bahskirina tiştêkî bi cism û mazin ku bi 'gir''bûna wê re werê ser ziman re wê bê gotin 'girgamêş'. Têngîna li vir, bi gotina 'girgamêş''ê re dihê ser ziman, ew a ku tiştêkî bi qasî wê gayê gir a, bahse wê dihê kirin. Yanî, li vir, weke kirdeyek duyemin ku hatîya afirandin bi wê têngîna şibandîne re li vir bahse wê dihê kirin.

Li vir, dema ku li ser vê rewşê re her wusa bi herîkîna dengî re bahsê bikin, divê ku mirov werêne ser ziman ku di dengê 'gir' de jî, herîkîna bûya. Minaq, di serdemên weke serdemên 'sûmerîyan' û hwd de, wê ev den bi rengê 'gil' jî xwe bide dîyarkirin. Ev herîkîna di deng de bi ber jidandinê ve çûya. Li şûna 'l''yê cihgirtina dengê tîpa 'r''yê, her wusa wê rewşê dide dîyarkirin. Deng, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa biteybetmendiyên mejî ên salixkirina wê re rengê têngîna gûharîne bi herîkîna û hwd jî dide dîyarkirin. Minaq, gotina 'ga', bisesanî û weke ku tiştêk li pêşîya wê nîna derxistina dengê wê, wê aliyê salixkirina wê bê. Her wusa, lê gotina 'gil', her wusa, gûharîna wê ya ku li ser dengê 'l''yê re ku bûya, her wusa mirov kifş dike ku dengê 'l' û yê 'r' ku ew navbera di nava wan de a 'nêzîk', di vê çerçoveyê de xwediyê weynekê ya. Rengê herîkîna dengê 'l''yê bi ber yê 'r' de bi teybetî heya. Ev rewşa dengnasîya tîpan, dema ku mirov li wan dihizirê, her wusa, weke aliyekî têngîna jî xwe dide dîyarkirin. Deng, xwediyê salixkirineka darêjkî ya.

Dengê 'l''yê, dema ku mirov li wê dihizirê, di derxistin wê de qiriq, di dema derxistinê de hinekî dengê dirêj dike. Di wê çerçoveyê de ew dengê ku dirêj û hinekî ne stûr derdixe, wê ew deng, di wê navbera ne zêde dirêj lê ku hinekî dirêj de wê xwe di temenê salixkirinê de bigihêne salixkirina ku em dikarin vê têngîna herîkîne bi wê re fahm bike û ankû werênina ser ziman. Qiriq, dema ku deng derxist, wê bi regekî ku derxistî wê mejî salixkirina wê bê. Ew salixkirina ku mejî kir, her wusa li ser deng derxistinê û qaydkirina wê ya di mejî de re, wê şibandîna têngîna û ankû hişarî hin bi hin bike. Ev jî, wê êdî li wê darêjka dengî salixkirinê ku

werina kirin wê temenê wê biafirêne. Ev weke aliyekî afrînerî ê zimanî û zimanzanîyê ya ku em divê ku li vir wê bi teybetî kifş bikin a.

Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku ew deng û tevgerîya ku dike û derdixe li holê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov li wê jî bihizirê. Ev jî, wê weke aliyekî din ê ku divê ku mirov wê li vir kifş bike bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku wê ev rewşa ku bi hişarî ku me bahse wê kir, wê bi aqil û li ser aqil re bibe. Zanîna ziman, her wusa, wê aqilê ziman, bi têngîna kirdeyî ya wê re kifş bike. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku bi dengî, her gotin, çend ku ji mirov re bêwate heya ku were, wê bi heman rengî biwate jî were. Ev jî, wê weke aliyekî wê gotinê ê ku bi teybetî, ku divê ku mirov li ser çerçoveya wê re ku lê bihizirê wê kifş bike û werêne ser ziman. Gotin, bi awayekî hesanî fahmkirina wê, ew a ku bi hebûna wê ya têngînî a têrkerî re mirov dikarê li navaroka wê li kirdeya wê bihizirê. Bi wê re wê fahm bike û werêne ser ziman. Kirde, her wusa çerçoveya wê ya gotinî a darêjkî ku mirov wê kifş dike, bi wê re xwediyê pergeliyek levkirîya ku mirov divê ku wê kifş bike û werêne ser ziman a. Darêjka gotinê, li vir, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê bi teybetî lê bihizirê. Darêjk, têrkerîya wê ya 'têngînî' her wusa ku mirov wê bi salixkirina wê re kifş dike û ankû dibînê, wê têngîna hebûna gotinê ya ku bi xwe re salix dike wê werêne ser ziman.

Jîr hêzeka hilberîner a. Her wusa fahmkirin jî, hêzeka hilberî ya fêrsî ya. Têngîna Zêhnê, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa mirov bi gelek awayên wê re kifş dike. Di çerçoveya hêzeka têngînî de fahmkirina zêhnê û di navaroka wê de hilberîya jîrê û fahmkirinê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov baş fahm bike. Ev fahmkirin jî, wê li ser ziman re bibe. Têngîna ziman, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, bi tevgerên mirovî re mirov aliyekî wê dibînê.

Her wusa, dema ku mirov bahse ziman dike, li vir, divê ku mirov hinekî di nava dîrokê de herê. Di nava rûpelên dîrokê de mirov wê gelek minaqên ku mirov wan fahm bike û werêne ser ziman wê bibînê. Biharhanîna ziman, her wusa, aliyekî mirov ê ku mirov nikarê wê red û înkâr bike ya. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku ziman, giringîya wê ji fahmkirina bi wê zêdetirî, bi navaroka xwe xwediyê aqilê ku em di jîyanê de bikardihênin a. Ev aqil, jîyane jî jî bixwe re rast dike. Li vir, têngîna bi gotina "çendî ku mirov biaqil dibe, zimanê mirov diadilê û çendî ku

zimanê mirov adilî jî wê bi wê re jîyane mirov biadilê”, bi xwe re tehereka têtîna ya bi ziman ku bi aqil re dihêne ser ziman. Ev têtîna, her wusa, li vir, giringîya bi fahmkirinê derdixe li berçav. Ji vê têtîna, dema ku em gav biavêji û hewl bidin ku fahmkirinekê pêş bixin, emê ji wê herina zêhn û jîra xwe ya bi aqilê xwe re. Ya ku êdî têtîneka felsefîkî a bi aqil di jîyanê de bi me re pêş dixê jî ev a. Her wusa, dema ku em hewl bidin ku di nava fahmkirin û têtîna vê de pêde herin, dive ku em ‘zansta gîyanê’ jî, her wusa li berçav bigrin û li ser re hinekî jî şîroveyna bi tevger, xûy û her wusa kirinên mirovî ên kirarî re jî werêne ser ziman. Kirinên mirov ên di jîyanê de, fahma di derbarê wan de wê her wusa bi aqilekî bê.

Di serdemên buhurî de felsefe, hinekî jî di vê çerçoveyê de bi hewldanên fahmkirinê re bidest pêşketina xwe dike. Hewldana ‘fahmkirinê’ her wusa têtîneka biaqilî a mirovî ya. Lê fahmkirinê, em divê ku di çerçoveya hebûna zindiyî de werênina ser ziman. Her wusa, di jîyanê de bi jîyane zindî de kifşkirina, ya baş û ne baş, ya ku zirerê dide û ya ku nadê, û hwd, wê bixwe re di vê çerçoveyê de têtîneka felsefîkî a zêhnî pêş bixe.

Bi dîrokê re pêşketina aqil, pirr zêde bûya. Her wusa, li vir, dema ku em bahse pêşketina aqil dikin, em bi wê re bahse pêşketina aqilê ku hatî ser ziman dikin. Ev jî, bi serê xwe weke aliyekî ku mirov di jîyanê de wê bi hişariya xwe re hîs dike ya. Rewşên jîyanî, ên ku derdikevina li ber me, mirov wan kifş dike bi qilê xwe. Bi wê re wan dahûr dike. Ev jî, wê weke aqilekî zêhnî ê jîrî bê. Li vir, divê ku mirov jîra zêhnê, her wusa di vê çerçoveyê de bi têtîna fahmkirina hişarî re werênina ser ziman. Jîr, weke ku di kurdî de xwediyê wateyê ya, bahse ‘mîrovê ku bi zêhnê xwe pêşketî’ dike. Ev gotin, weke gotinaka pirr kevn a jî di kurdî de. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov li ser wê re dihizirê, wê çaxê, mirov digihijê wê têtîna di serê xwe de ku, zêhn, pêşketina wê pirr zêde zû pêşketîya. Mîrov, li ser ziman re jî dema ku li rewşê û gotinên wê dinerê, mirov vê yekê dibîne. Heta demên Sûmerîyan, gotinên ku dihên dîtîna, ên weke ”ga”, ”ka”, ”şa”, ”ha”, ”hê”, ”hî”, ’za”, û hwd in. Em dikarin, di vê çerçoveyê de bi gotinî bi hezaran gotinên ku em dikarin bi ate bikin û yek û ankû du tîpî na kifş bikin. ”ga”, navê sawalê gir a. ”Za”, dema ku çêlîyek ji sawalekê bû, têne ser ziman, ”Şa”, navê bidilbûn û tiştê bi wê bi dil dibê ya. ”Ka”, pirsîna ku li kûderê ya, bi gelek wateyên din re bi xwe re têne ser ziman. ”Ha”, bi nîşandanê re hinek wateyên bi têtîna hebûnê re dihênina ser ziman. ”Hê”,

wateya demê ya bi 'zûbûn' û ankû 'derengbûnê' bi gelek wateyên din re dihêne ser ziman. "Hî", wateya danîşanê bi gelek wateyên bideng axiftinê û hwd, bi xwe re dihêne ser ziman. Her wusa, navê "jin"ê ku weke navê "pîrekê" ya, wê di van deman de weke "nîn" hebê. Her wusa, navê "jin", di wateya 'jîyanê', 'pîrozî' û hwd de ya. Her wusa, di van deman de jî wusa ya. Ev rengên gotinê ên piçûk û pîrr wateyî, her wusa tişteki bi xwe re dide nîşandin. Ew jî, her wusa ew a ku hiş di mejî de di temenê biwatekirinê û hwd de pêşketî ya û êdî li ser wê re bi wate dike. Rewşên ku dibin, di çerçoveya deng derxistina bi wan û bo wan de, wê salixkirinê bike. Di vê çerçoveyê de salixkirinên ku dihênkirin jî, bi dengên kin in. Ev jî, teybetîyeka wan heya. Dengên kin, di çerçoveya salixkirina wan de jî, kifşkarîyeka mejî ya xort heya. Zelal û kin in. Zû tîn tîgihîştin. Her wusa, di mejî de, dema ku ew deng hatina bi gotinkirin, û ew gotin hatina nivîsandin jî, êdî weke ku ew deng weke tîrkerîyeka heyberî, wê xwe bide nîşandin.

Li vir divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman ku ev rengê ku me bi gotinên piçûk ên du tîpî û hwd re got, wê pîrr-wateyî wê re rewşeka bi rengê dariştinê bi xwezayî li ser watekirinê û kirdeya wê re bi demê re bixwe re dihêne li holê. Ji gotinê dariştin, wê her wusa bi fahm, wate û kirdeya wê re bê. Ev jî, bi demê re li ser dengên ku weke întîba û ankû "weke ku hatî bihîstin" di mejî de û hwd, wê bi xwe re temenê pêşxistina **dariştinî** bide afirandin. Dariştin, bi fahma jî jîra aqil dibe. Dariştin, her wusa, wê li ser deng re xwe bide pêşxistin. Pîrr-wateyî, çendî ku weke hîmekî bingihînê ê dariştinê ya, her wusa, wê weke reneki pêşketina ku bi ber wê ve jî bê. Her wusa, wê ev jî, xwe bi pêşxistinê re bide dîyarkirin. Her dengê ku bi tîgînê û hişmendî ku weke întîbayekê bi me re çêkir, wê ew temenê derhanîna gotinekê bi dariştinê jî bê.

Dengên gotinê, her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku di van deman de, wê pîrr zêde di vê çerçoveyê de pêşketî bê. Em vê yekê bi hizirkirin û fahmkirina xwe re dibînin ku bi gotinên kin ku yek û ankû du tîpî û hwd, wê pîrr wateyî zêde pêş bikeve. Ev jî, bi pêvajoyên buhurîna pêşketinê ên bi aqil û ankû bi jîra mirov ve girêdayî na. Mînaq, em dema ku di çerçoveya zimanê kurdî de dihêne ser zimana gûtî, hûrî û mîtanîyan û hwd, em dibînin ku wa gotinên weke gotinên "zanîn", "ziman", "laleş", "Sittar", "huwar", û hwd wê werina dîtin. Ev rengê gotinan, weke gotinna ku pîrr-tîpî na. Bi gelek tîpan dihên nivîsandin. Di

vê çerçoveyê diwateya ku li wan dihêkirin jî, wateya mazin a. ‘Ziman’, navê wan dengên ku em bi axiftinê derdixin a. ‘Zanîn’, navê wê têgîn û têgihîştina jîrî û fahmî a di gotinên mirov de ya. ‘Laleş’, navê cihê bergê ê bawerîyê ku li wê civatê dihê li hevdu civîn a. ‘Sittar’, navê têgîneka nîrxî ya ji dil kirina hawar a. Her wusa, sittar, hinek dayikên kurd, bi devkî, wê digihênina gotina Starê ku weke ‘hawara gihandina li starê’ jî dixwênin.

Li vir, em vê yekê dibînin ku serdemên gûtî, hûrî û mîtannîyan, weke serdemna ku pêşketî ên hemdem ên di dema xwe ya dîrokê de na. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ev li ser têgîna ziman re, dema ku mirov wê fahm dike, weke aqilê ku hatî şenberkirin mirov rastî wê tê. Di nava kurdan de heta roja me jî, bi têgînî û yeqînî dihê gotin ku ”bi gotinkirin, mayînda dike.” Her wusa, di vê çerçoveyê de di nava civatên xwe de êdî dihanîn ser ziman. Têgîna ”bi gotinkirin mayînda dike”, weke têgîneka têgihîştî, mirov rastî wê dihêt.

Ev serdemên berî van serdeman, dema ku mirov li wan dihizirê, her wusa, mirov bi wê re kifş dike ku aqilê demê bi gotinên piçûk û bi hişkirî re dihê dîtin. Bi vê yekê re weke gotinên piçûk ku du tîp jî, dihên cem hevdu, di mejiyê yekî kurd ku bi zimanê dayika xwe mazin bûyî re wê wateyekê pêşî bide çêkirin û piştre jî wê li ser wê wateyê re gelek wateyên din hin bi hin biafirin û derkevina li holê. Ev, her wusa, temenê wê, ev pêşketinên wan serdemên buhurî ya ku di xêva mirov de, bi pêşketinên xwe re hatîya qaydkirin a.

Têgîna ziman, li vir, divê ku mirov vê yekê bi wê re werêne ser ziman ku giringîya wê, ew a ku mirov di vê çerçoveyê de wê bi pêşketina mirov re dihêne ser ziman. Ez li vir, di vê çerçoveyê de vê yekê divê ku werênina ser ziman ku ziman, weke aliyekî giring ê pêşketina mirov a. Her wusa, li vir, ez dûbare balê bikişênina wate û giringîya zimanê dayikê. Ji ber ku ev, weke mijaraka ku çendî ku mirov wê hûr û kûr lêbikolê û lêgerînê bi mejî û pêşketina mejî re û biwê re bike, wê cihê wê bê. Mirovekî ku bi zimanê dayika xwe mazinbûyî, di serdestîbûna wî ya li ziman de, wê hertimî ji ya mirovên din zêdetir û pêşketîtir û bi têgihîştintir bê. Her wusa mirovê ku bizimanê dayikê mazinbûyî, di afirîn û watekirinê de jî, wê li pêş bê. her wusa, ji ber ku xêva mirov, bi gotinên wî zimanê dayikê re weke xwediyê miftiyên xwe yên pêşketinê na. Gotinên ziman, li vir, divê ku mirov di çerçoveya têgîna bi mejî re û bi xêvê re mirov bahse têkilîya wê bike. Her wusa, li vir, divê ku mirov têkilîya di nava xêv û ziman de, li vir, divê ku

bi giringî hem bi aliyê wê çandî û hûnerî û hem jî bi aliyê wê yê fîzyolojikî û hwd re divê ku mirov bahse wê bike. Em nikarin, tenê ziman, bi gotin û têngîna wê ya di nava wê de re, tenê bi aliyê wê jîyanî û ankû çandî were werênina ser ziman. Bi vê aliyê hanîna ser ziman, wê pîrr di fahmkirinê de kêmesîyê bide çêkirin. Her wusa, dema ku mirov tenê bi aliyê wê çandî re hanî ser ziman, mirov wê bi dîrok û pêşketina wê ya di nava rûpelên dîrokê de, mirov wê bi sînor werêne ser ziman. Mirov, wê bi aliyê wê yê hîmî ê weke xêvî û hwd jî, êdî ji nedîtî ve were. Ji ber ku aliyê hîmî ê vê pêşketinê divê ku mirov nêvî bi nêvî li ser xêvê re werêne ser ziman. Heta ku, mirov dikarê zêdetirî jî li ser xêvê re werêne ser ziman. Têkiliya xêv û ziman, di çerçoveya hebûna dayikê de xwediyê hîmê xwe yê pêşketinê ê rakendî ya. Bi zimanê dayikê, ku mirov hîç nekeve zorê de di fahmkirinê de xwediyê bêsinorîyekê bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de bixwezayî fêrbûn bi awayekî afrîner xwe dide dîyarkirin.

Her wusa dema ku mirov bahse fêrbûnê bike, divê ku mirov bi teybetî li ser têngîna ziman re bimeşê. Fêrbûn, wê ziman ji xwe re bike weke pêpelok. Gotinên ziman, salixkirina wan, bi rengên ku hatina kirin, di nava têngîna kevneşopîkî de, wê wateyekê bi xwe re bidina me. Her wusa, her gotin, bi 'rengê' xwe re wê wateyeka wê ya "xweza" wê hebe. Divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman. Dema ku me got "av", û ankû dema ku me ji deverekê û an jî kû ji evê yekî me bihîst, em dizanin ku em bahse 'ava vexwartinê' dikin. Ev rengê gotinê ya. Her wusa, rengê gotinê, bi rengê wateya ku hatî salixkirin re, xwediyê wateyekê ya. Li vir, ev rengê wateyê, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, di vê çerçoveyê de rengê gotinê, weke wateyeka salixkirî, wê xwediyê têngîneka giring a zimanî bê. Ev her wusa aliyê têngînî ê morfolojikî ê li ser navan re dihêne ser ziman. Dema ku em hewl bidin ku morfolojiya navê fahm dikin, her wusa, li vir, divê ku em li ser şenberîya salixkirî a bi navkirinê re bidest hanîna li ser ziman bikin. Têngîna navên, her wusa, giringa ku li vir, divê ku mirov li ser bisekinê. Di kurdî de morfolojiya navan, her wusa, weke aliyekî ku mirov divê ku bi teybetî werêne ser ziman.

Têngîna ziman, dema ku mirov ji vê aliyê(morfolojikî) ve ku mirov li wê dihizirê, mirov navdayînen kurdî, bi şenberîyeka xwe ya salixkirî a têngînî ku dihênina ser ziman re werênina ser ziman. Salixkirin, weke aliyekî giring ê ku di vir de bi teybetîyên wê re bi navkirina dihê dîtin. Li vir, dema ku mirov bahse bi navkirina wê bike, ji du aliyên ve mirov divê

ku werêne ser ziman. Aliyek, weke aliyê têtênî ku di temênê watetiyê de xwe dide li dest a. Minaq, 'ga', navê sawalaka mazin a. Lê dema ku bahse sawalê dihê kirin, her wusa, bi wê 'mazinbûna' wê re dihê ser ziman. Me li jor, bi çend gotinan jî bê bahse salixkirina bi 'gir'bûn û navê 'ga' re kir. Her wusa, li vir, di vê çerçoveyê de mirov dikarê hinekî din jî li wê binerê. Em li vir, vê jî, werênina ser ziman. Dema ku minaq, bi navê "dest" re mirov li mijarê dihizirê, her wusa mirov dibînê ku bi navî, weke rengê têtênî 'kokî' derketina li holê dibêt. Fahmkirina ji gotina 'dest', ew a ku bahse destê mirov ku mirov bi wê dirajihê tiştêkî ya. Her wusa, bi wê hertişt û karê xwe yê jîyanî dike. Lê dema ku minaq, weke kokî mirov li ser wê re gotinê bi afirêne, her wusa, wê derkeve ber me. 'Dest', 'destavêtin', 'destdirêjî', 'destar', 'destmal', 'destik', 'destpêk' û hwd. Ku em li vir, di çerçoveya vê rengê ku me hanî ser ziman de ku em bidomênin û werênina ser ziman, emê rasttir bikin. Her wusa, li vir, gotina 'dest' weke gotina 'kok' em hildina li dest, Di rengên lêkerkirina li gotinê de mirov dikarê gelek gotinên din ku ev weke kok a, werêne ser ziman, Minaq, 'destkevî', 'destketî', 'deste', 'berdest', 'bindest', 'ji dest', 'bidest' û hwd. Li vir, ku gotina 'dest' weke kok a, gotinên ku bi navdayînê ku hatina afirandin, wê wateyna din bi lêkerkirî wê bidina me. Gotina 'dest' jî, koka wê li ser "de" ya ku di keve wateya "dayîn", "hildan", "bi wê re bûnê" û hwd a. Her wusa, mirov dikarê ji vê hinek wateyên din jî, derxe. Lê li vir, tiştêk bi xwazê, weke ku me bi li jor bi gotinên du-tîpî re ku hanî ser ziman, bi gotina 'dest' re jî derdikeve li holê. Her wusa, weke ku ev gotin jî, berê bi heman rengî bê û piştê li dora wê hatibê hûnandin, rewşek derdikeve li holê. Li vir, bi gotinê re tiştêka din jî, mirov kifş dike. Ew jî, her wusa rêzimanîya afrîner ya gotinê ya. Li vir, mirov, mirov vê yekê kifş dike. Bo vê aliyê zanîna ziman a afrîner mirov fahm bike, mirov dikarê bi minaqî lê zêde bike. Her wusa, me ku li ser koka "de" ava ya, me bahse dest kir, emê ji wê dûr nekevin û bahse "dev" bikin. Li vir, li dawîya "de" bicihkirin tîpa "v", wê dengê deng derxê. Ev jî, dema ku em ji wê gotinê werênina ser ziman, "devkî", "dever", "devî", "dev" û hwd. 'Dev' bixwe jî, dikeve wateya devê mirov ê ku mirov bi wê dixwe û divexwe ya. Ev rewşa kokî, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov li ser wê re digihîjê têtênîka hîmî. Em dema ku li herêmên kurdistanê digerihihin, dengên ku bi heman gotinên re derdikevin, em rastî cudahiya wan jî, tên. Minaq, herêma botanê, çendî ku di axiftina xwe de zû û sivik bê, wê herêma kurdistanê a serhedê, hinekî

giran û stûr bê. Lê di ahengekê de, dema ku mirov ji van herêman ji yekê diçê ya din, her wusa, mirov wê hin bi hin kifş dike.

Li vir, dema ku em li ser gotinên piçûk ên kurdî re herin, emê her wusa jî kûrtir herin. Weke ku me li jor, bi gotina ´de´ û hwd re hanî ser ziman, li vir, ku weke gotinaka nava hevokê û ya di nava gotinê de ya bi hevdû ve girêdayan gotinan jî tê dîtin gotina ´kû´ ya. Her wusa, roja me de, di dengê zimanê kurdî ê roja me de, weke pirseka ku li ´kûderê´ ya jî ji wê dihê dîtin. Lê kû, giringa ku mirov li vir, bi kokî wê hilde li dest, ev gotina di kurdî de, weke koka navê kurdî ku di dema sûmerîyan de weke ´kur´ jî dihê xwandin a. Her wusa, em dibînin ku di dema gûtî, hûrî û mîtannîyan de wê gotina ”kurd”, weke navê civate kurd, wê tekûz were bikarhanîn û dîtin. Li vir, ´kû, her wusa, weke gotinaka ku mirov di serî de bo fahmkirina wê ya ku em pêde herin, em divê ku hinek peyv û hevokna bifahm bi wê werênina ser ziman. kû: ´Ew çû kû?´. ´Ji kû: hûn ji kû hatin? Li kû: tu li kû yî?´ Male te li kû ya? Tu kû ve diçê? û hwd. Dema ku em her wusa, li vir, bi kortasîya wan re dinivîsîne, bi vî rengî jî mirov dikarê werêne ser ziman. ”kûve”, ”kûderê”, ”kûde”, ”kû dê”, ”kûder”, û hwd. Mirov dikarê bi ser vê ve lê zêde bike. Li vir, ev gotin, di wan de di temenê têngîna pirskirinê de jî, weke hîm, gotina ´kû´ dihê dîtin.

´Kû´, her wusa, di aliyê dengê xwe ve hin bi di hin gotinna de bi ber ´xû´, ´qû´ û hwd de herîkînên wê ên ku bûna hena. Ev jî, bi demê re bi wê re bûna. Dengê ´kû´, car bi car, di nava kurdan de, bi dengî ku deng hatîya derxistin de, weke Dengekî bi ber ´q´ de jî hatîya derxistin. Her wusa, di roja me de jî, gelek gotinên ku bi ´k´ hatina nivîsandin, di deng derxistinê de dengêkî nêzîkî ´q´ hatîya derxistin biwan re. Di aslê xwe de ya di zanîna dengê de ku herîkînê û ankû gûharînê bi demê re dide çêkirin, wê ev bê. Dengên ku nêzîkî hevdûna bi tîpî, hertimê derfet û temenê şibandina ji wan heya. Ew şibandin jî, di mejî de temenê têngîna hişarî ên ji wan ku werina afirandin in.

´Kû´, bi awayekî xweza, dema ku bi çav dîtinê re ku hat dîtin, ´nîşandinê´ bi xwe re dide kirin a. Her wusa, di vê çerçoveyê de di çerçoveyek xwezayî de, dengê xwe yê hîmî ê ji qiriqê ku derdixê ya. Li herêma rojhilatê kurdistan û başûrê kurdistanê de, herîkîna dengên kurdî, her wusa, hinekî dîn bi teybetî dihên dîtin. Ev herîkînên ku weke ku ji ´kû´ ku dawîya wê bi ´v´ bicihkirinê re ´kûv´ diafirênê û ´kûv´ jî ku hat afirandin dikeve wate ya ´tê herê kû´ û ankû ´tê biçê kûderê´ û hwd bi

hinek wateyên din re bi xwe re dihêne ser ziman, wê li van herêmên kurdistanê ên weke rojhilat û başûr, li şûna 'v', wê 'r' were bicihkirin û wê bê gotin 'kûr' û hwd. Hinek jî, dengê 'kûr' weke kokî bikar dihênin û dibêjin bi 'kûr ve(?)' Di vê çerçoveyê de her wusa herîkîna li ser dangan re dihê dîtin. Lê ev herîkîna li ser dangan re wê, temenê afirandina dengên gotinî ên piştîre bin. Li vir, mirov vê yekê bi başî fahm dike ku di demên ku hê nivîsandin pêşneketîya de, gotinên kin weke du û ankû sê tîpî û hwd, wê karekî girîng ê di hiş de girtinê jî bibînin. Li vir, mirov vê yekê kifş dike, ku em dema ku li koka gotinên kurdî dihizirin û wan lêdikolin, mirov rastî wê tê, hemû jî, di vê çerçoveyê de xwediyê heyîniyeka hebûnî na. Gotinên du-tîpî, weke teybetîyeka hîmî ya zimanî derdikeve li ber me. Her wusa, "da", "zû", "va", "wa", "la", "na", "ma", "ja", "ka", "ba", "pa" û hwd. Ev gotin û pirranîyan gotinên bi vî rengî du-tîpî ku mirov wan dinivîsîne, wê bi wate bikin û kok bin. "Da", di wate dayîn û koka gotinên wê ya. "Zû", wateya 'lezendin' û ankû 'lezkirinê' de û wateya kokî ên gotinên wê de ya. "Va", di wateya bi destdayîna tiştêkî li yekî û gotina 'vaya' û her wusa hîmê gotinên dayîne ya. 'Wa', wateya nîşandina li berçav a û keseyetîyê ya. Her wusa, 'va' jî weke jî ya. "La", di wate ya gotinên 'lêkirin' û hwd de ya û kok a. "na", di wateya 'redkirin' û nebûnê de ya û koka wê ya. "Ma", di wateya zayendîtîyê û hebûna wê ya keseyetîyê de ya û minaq tawandina gotinê jî bi rengên weke "mê" û hwd re dibê navê zayendekê û koka wê têne ser ziman. "Ja", ku koka "aidîyete" bi 'ji wê tîyê' dihêne ser ziman û koka wê diafirêne. "Ka", ku wateya kokî ya navkirinê ya û bi tawandina wê re û hwd, weke "kû", "ku", "kê", "ke" û hwd, ku diafirêne weke têngîneka ku temenê pir-rengên dengî ên gotinî ya. "Ba", di wateya "bal kişandina li ser" û ankû kişandine heyê li ser dihêne sser ziman û koka wê balê bi wê re diafirêne. Bal, dema ku heya mirov çû ser tiştêkî û li ser wê ma dihêne ser ziman. Her wusa, Ba, piştîre bal, piştîre jî heta ku diçê gotina bawerîyê', wê renegekî gotinî li dûv hevdu bide dîyarkirin. Her wusa "pa" jî, têngîna "paş", "panî", "par", û hwd bi gelek wate û gotinên din re bi xwe re diafirêne. Dema ku "pa" hat tawandin, her wusa jê "pê", "pêr", "per", "pen", "pêjn", û hwd bi gelek watên din re bi xwe re diafirêne. "pêr" di wateya roja duyemin a buhurî de ya. Per" di wateya bask de ya. 'Pen, di wateya xweşikati û bêhnê de ya. Pêjn, di wateyên bêjîngê bejnûbalê û hwd de ya. Her wusa, her yek ji wan gotinan, weke hemû gotinên li jor, mirov dikarê hinek wateyên din ên ku

li wan hatina kirin, bi wan re kifş bike û werêne ser ziman. Ev rewş, hemû jî, tiştêkî didina nîşandin, Her wusa, dengê gotinê, her wusa, di mejî de çî di şibênê û bibîrdixê jî, her wusa wê bi xwe re werêne li holê.

Li vir, dema ku em li ser gotin û salixkirina wan ya li ser deng û wate dayîna wan re dimeşîn, em vê yekê dibînin ku her wusa salixkirina gotinan bi kokî, ji wan afirîn bûya. Lê li vir, gotinên kokî, her wusa, temenê wan li ser rewşên jîyanî ku hatina dîtî û kifşkirin a. Minaq, em î ro pirr gotina "dîrokê" bikardihênin. Weke koka gotina 'dîrokê' em rastî gotina "dî" tên. 'Dî', em rastî gelek watekirinên bi wê re tên. Lê wateya wê ya hîmî bi 'dîtina ku hatî dîtî' re dihê kifşkirin. Yanî, tişt û ankû rewşa ku hatî dîtî, bi wê re dihê salixkirin. Di vê çerçoveyê de weke koka wê ya din jî, "ro" ya. 'Ro, di wateya dîtî, û rojê de ya. Ji wê, 'rok', 'roj', 'roh' û hwd hatina derhanîn ku hema bêja di wateyên nêzî hevdû de na. Her wusa, ro, navê wê rohnîya rojê ya. 'Rok', li gorî ku hatîya salixkirin, dikeve wateya rojeka ku buhurî de lê ku ne kifşa ku kîjan roj a. Di vê çerçoveyê de hanîna rex hevdû ya 'dî' û 'rok', her wusa, 'rojek buhurî' û ankû dîtinek bûyî û an jî kû 'dîtinek bûhûrî' bi xwe re salix dike û dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de dîrok, weke gotinaka ku hem koka dîtîna a 'dî' yê û hem jî koka rojê ya 'ro' yê di ke temen, hundûr û nava xwe de. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî werêne ser ziman ku mirov dikarê li ser koka 'ro' re bi gotinên weke 'ronahî', 'rojbûn', 'rodên', 'rodan', 'rojbîn', û hwd bi gelek gotinên din re biafirênin. Em li vir, hinekî din li ser gotina 'ro' yê kûr herin. Ji ber ku ev hinek wateyên din bi serekeyî ku em divê ku li vir kifş bikin bi xwe re dide kifşkirin. Minaq, dema ku me dahûra gotina koka 'ro' kir, me got bi sereke . ji wê, 'rok', 'roj', 'roh' û hwd, sê gotinên sereke me hanîn ser ziman. Li vir, gotina dawî a "roh", em divê ku hinekî li ser wê bisekin in. Her wusa, li vir, dema ku mirov li ser wê dihizirê, ku weke koka wê 'ro' ya bi wateya 'rohnîyê' re dikeve wateya "ruh" de jî. Ruh, em di zanîn ku roja me de di wate ya gîyanê de, her wusa dihê bikarhanîn û ser ziman. Ev li vir, vê yekê, werênina ser ziman ku di nava têngîna koka 'ro' de têngîna 'dî' ya bi dîtîna re li ser wê têngîna rohnîya rojê ku heya re di nava têngîna koka 'ro' de xwe dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de her wusa têngîna 'dîtîneka salixkirî', mirov di nava vê têngîna vê gotinê de kifş dike. Têngîna gotina 'ro' de, wê her wusa weke tiştêkî ku heyî lê ku bi dest nayê girtin, wate distêne. Ev jî, wê êdî bikeve wateya gîyanê bixwe de jî. Li vir, di rengê wateya gîyanê û bi navkirina wê de

hanîna ser ziman gotina ´roh´ û ankû weke ku di roja me de dihê ser ziman a ´ruh´, wê di vê çerçoveyê de xwediyê wateyeka ku em li vir li ser wê bisekin bê. Hizra têtîna ruh´ê, wê her wusa, weke koka xwe têtîna ´ro´yê bi afirandina xwe ya ´roh´ re bike temen û hîmê xwe de. Di vê çerçoveyê de wê li ser wê re êdî xwe werêne ser ziman. Li vir, em li ser têtîna bi tîpa kurdî ya ku mirov ji wê fahm dike jî bisekinê. Her wusa koka ´ro´, dema ku tîpa ´h´ di hilde dawîya xwe ya, her wusa, bi wê re têtîna ´tiştêkî ku heyî´ jî bi xwe re dihêne ser ziman. Bi rengê kokî ´h´´ê, weke kokî ´ha´´ ku mirov wê hilde li dest, têtîna û wateya ´hebû´, ´heyîn´, ´hey´, ´heya´, û hwd bi gelek wateyên din ên bi gotinê re bixwe re dihêne ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de hê, weke têtîna ´hebûnê´ êdî xwe dide dîyarkirin. Li vir, di vê çerçoveyê de, dema ku bi koka ´ro´ re dihê cem hevdu, her wusa, wateya ´rohnîyeka ku heyî´, wê bi xwe re werêne ser ziman û dîyar bike. Li vir, di nava rohnîyê û ankû rojê de, hertimî li hebûnekê lêgerîn bûya. Rohnî, weke heyîneka jîyanî ku bûya temenê hewldanên mirov ên salixkirinê. Hewldanên salixkirina rohnîyê, di vê çerçoveyê de bi hebûnekê, wê di nava têtîna ´roh´´ê de xwe bide dîyarkirin. Ev jî, wê herwusa, temenê wê têtîna ku mirov weke zîndî ku dijî, ew jîyandina mirov jî ku weke ´hebûneke dijî´ ku were ser ziman. Ev jî, êdî weke têtîneka ´roh´ û ankû êdî bi gotinê weke gotinaka ´rohî´ ku wê salix dike, hatîya dîtin û ser ziman. Roh, ku bi koka xwe ya ´ro´ re her wusa, weke gotinaka giring ya kokî ya. Rengê wate û kirdeya xwe ya ji wê rohnîya rojê a ku heya digirê.

Dengê gotinê, her wusa, weke dengêkî ku ji qiriqê bi du-pêpelokan derdikeve ya. Di vê çerçoveyê de dengê ro´yê, di hanîna wê ya ser ziman de, xwediyê têtîneka giring a heyînê ya.

Em li vir, divê ku hinekî din pêde herin. Li vir, me li jor, bahse koka ´dî´ ya zimên kir. Li vir, her wusa, em divê ku hinekî din li vir, bi wê re herin. ´Dî´. di wateya dîtinê de ya. Lê her wusa, dema ku mirov li koka ´dî´ dihizirê, her wusa, bi rengê ´weke dîtinaka li şûn mayî´ û anû weke ´tiştê duyemin´ dike. Bo vê yekê, dema ku di nava hevokê de dihê ser ziman, minaq ´Zilan, bahse tiştêkî din dike.´, her wusa weke gotinaka ku di wê de ku bi koka ´dî´ re tiştêkî din ê duyemin dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de ´dî´, weke têtîneka zimanî ya giring a. Li vir, di hundurê gotinê de tiştê ku bahse wê dihê kirin, bi gotina di hundurê gotinê de a ´..tiştêkî din ..´ dike, bahse yek tiştî dike. Li vir, li dawîya ´dî´´ê ku tîpa

‘n’ hatî bicihkirin, her wusa wê di nava gotinê de wê tişta ku hatî dîtin, wê dîtina wê salix bike ku hatîya kirin.

Têgîna dengê, her wusa, li vir, divê ku mirov wê werêne ser ziman ku weke aliyekî giring ê salixkirî mirov wê kifş dike. Salixkirina deng, her wusa, wê di mejî de bibe. Bi wate kirina wê, wê bi pêşketina aqil û hişariya aqilê mirov re bibe. Li vir, li ser gotinên zanînê re dema ku mirov bi kokî diçê, mirov rastî rewşeka bi vî rengî tê. Minaq, ”za”, ”ji”, ”jî”, û hwd, wê di wateya afirandinê de bin. Koka ‘za’, di wate ya hanîna dunyê de ya. Her wusa ‘ji’ jî, wê têngî û wateya ‘ji wê’ û hwd ji xwe re bike temen. Li vir, di vê çerçoveyê de, têngîna ‘tişta ku ji wê afirî’ wê bi wê re were salixkirin. Aqil, ji mejî diafirê. Zanîn, ji aqil diafirê. Her wusa, fahm ji fêrbûnê diafirê.

Weke têngînekê ‘ji wê afirîn’, her wusa, wê temenê têngîna pêşketina bi zanebûn û bûyîna wê bê. Ji xwe, heta roja me jî, gotina ‘za’, di wateya welidandina dayikekê, hanîna dunya a sawalakê çêlika wê û hwd de ya. Di vê çerçoveyê de, di wateya bûyînê de ya. Bûyîn, weke ku nû li dînyê bûyî, bi wê re dihê salixkirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de têngîna ‘afirandinê’ di vê çerçoveyê de bi wê re xwe dide dîyarkirin. Dayikek diafirêne bi hanîna dunya a zarokên xwe re. Her wusa mejî jî, diafirêne bi çêkirina aqil û zanîna wê ya di xwe de. Temenê têngîna bûyînê, bi hatina dînyê re her wusa di vê çerçoveyê de xwe dihê ser ziman. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê biteybetî werêne ser ziman ku têngîna afirandinê, bi gotina ‘za’ re bi temem a. Li ser gotina ‘za’ re tişta ku bû, êdî weke tişteki ku bûyî ya. Tişta ku bûyî, êdî heya û bûya. Ev têngîna bi gotina bûyînê re jî, wê bi koka ‘ba’ û rengê tawandina wê a ‘bû’, ”bî”, ”bê” û hwd re werê ser ziman. Ev têngînen ku bi gotinên kokî ên weke ‘bû’, ”bî”, ”bê” û hwd re ku dihên ser ziman, wê bahse wê tişta ku bûyî bikin. Yanî, wê li vir, ew tişta ku bûyî û êdî heya wê, bahse wê bike. Ji xwe, bi gotinî, salixkirina wê tişta bûyî, bi gotina ‘bû’ re bi ya ‘hebûnê’ re ya. Her wusa, gotina hebûnê, li vir, divê ku mirov bahse têngîna wê ya bingîhîn, bi wê tişta ku bûyî û heyî weke hebûnekê re heyî bi têngîni bike. Li vir, têngîna hebûnê, li jîyanê, hebûna ku heya, bahse wê dike. Li vir, cûdahiya di nava koka ‘za’ û ya tawandina ‘ba’ yê ‘bû’ de, ew a ku têngîna bi ya ‘za’ re ku dihê dîtin, ew tişta ku hê nû ku ji dayikê dibe û dihê dînyê ya. Lê piştî ku bû, êdî ew li jîyanê heya weke ‘hebûnekê’. Êdî wê ji wê re weke tişteki ku heyî û bi hebûnî bahse wê were kirin û wê bi hebûnê re ew were ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê yekê bi teybetî di çerçoveya dengnasîya zimên de werêne ser ziman ku têngîna dengî, bi salixkirina wê re, bi afirîna deng re rengê gotinê û ankû bi tîpkirinê afirandîya. Ev jî, wê pişte temenê salixkirina wê û pişte jî nivîsandina wî bixwe re werêne. Nivîsandin, wê zimên ji astekê bi buhurêne li astaka din. Em vê yekê dikarin bi teybetî binxatkin û bibêjin. Her wusa, zimanê kurdî, ji rengê pêşketin û pêdeçûna wê ya gotinî û afirandina gotinî, mirov fahm dike ku hê di serdemên sûmerîyan de weke zimanê nivîskî pêşketîya. Her wusa, em vê yekê ji afirandina gotinên dirêj ku du û ankû sê kokakn bi hevdû re dikina nava xwe de ji wan fahm dikin. Minaq, gotina "gilgamêş" nîşanak û birhana vê yekê ya. Têngîna ziman, her wusa, piştî ku nivîsandin bi wê re dibê, êdî li ser dagerîyên tîpî ên bi nivîskî û hwd re, wê rewşeka xwe ya dengnasî û hwd bi zelaltir bide nîşandin. Li vir, di naskirina dangan de, bi salixkirina dangan û her wusa bi dagerkirina wan salixkirinan û bi tîpkirina wan dageran û her wusa pişte nivîsandina wan, wê her wusa, bi pêvajoyên wê ên pêşketinê ên bi mejî re bin.

Têngîna fahmkirinê a bi nivîsandinê re, wê di serdemên şariştaniyê de pîrr zêde pêş bikevin Di aslê xwe de zimanê nivîskî, êdî zimanê pêşketî ê şariştaniya. Her wusa, ev ziman, di çerçoveya dengên ku derdixe û levhanîna bi gotinan re ku dike, pergela xwe afirandîya. Ev pergala jî, wê hin bi hin rengê pêşketina civatê bi pergala bi demê re di çerçoveya jîyane şariştanî û hwd de, bide dîyarkirin.

Jîyane şariştanî, temenê wê li ser bineterên nivîskî ya. Her wusa, ew temenê wê yê li ser bineterên nivîskî ya, em dikarin bi navê 'civatê' re werênina ser ziman. Gotina civatê, koka wê li ser 'ci' ya ku ev dikeve wateya 'cih' û hwd de. Her wusa, gotina civatê, bi koka xwe ya 'ci' re, wê rengê salixkirina kirdeyî ya li hevdû kombûnê bi xwe re bide dîyarkirin.. Di nava têngîna civatîtiyê de kombûn ku weke ku kurd di roja me de jî bi nav dikin 'komel'î û hwd heya. Ev jî, her wusa, di çerçoveyeka zêdebûna mirovan ya bi hevdû re dide nîşandin. Têngîna civatê, her wusa, di nava kurdan de bi kevnerî kevn heya. Gotina 'civatê', di nava kurdan de di du wateyan de serekeyî mirov dikarê werêne ser ziman. Hinek wateyên din jî hena. Lê bi serekeyî, di wateya bi 'civatî li hevdû rûniştinê û bi hevdû re axiftinê' dihêne ser ziman. Her wusa wateya wê ya sereka a din jî, ew a ku bi girsebûna mirovan a bi hevdû re afirandina civatbûnê dihêne ser ziman. Têngîna bi hevdû re bûnê, wê di vê çerçoveyê de bi li hevdû kombûn û

parvekirinê re wê pêşbikeve. Di serdemên civatîti de parvekirin, weke tişteki bingihîn a. Her wusa, dema ku em bahse parvekirinê bikin jî, divê ku mirov werêne ser ziman ku ziman jî, wê weke tişteki hevpar ê ku bi wê re têkilîyê bi hevdû re didênin bê. Ziman, wê temenê bi hevdû re axiftinê û têkildanînê bê. Gotinên ziman ên ku hatina bi watekirin û salixkirin, wê her wusa temenê wê bê. Gotina ku dema ku di serê min de di wateya "hilde", "were", "bigrê", "bixwe", "vexwe" û hwd, ku hena, wê di serê mirovên din ên wê civatê de jî hebin. Her wusa, dema ku bahse gotina 'bixwe' hatkirin, ez jî û ên din jî, wê zanibin ku bahse xwarina tişteki tê kirin. Her wusa, bi heman rengî wê li ser gotinên din re jî bibe. Di vê çerçoveyê de ziman, weke têngîneka hevbeş ya têkildanînê bê. Tiştê ku temenê têkilîya bi ziman û wateyên wê re diafirêne, her wusa rengê jîyanê û pêwîstî û pêdivîyên mirovî ên jîyanê ku mirov dixwezê ku bi wan bijî na. Her wusa, hewldana domandin û jîyandina jîyanê, wê temenê wê bê. Her mirov, pêwîstîya wî bi xwarinê heya bo ku bijî. Her mirov, dixwezê ku jîyane xwe bide domandin. Ev, weke xwesteka xwezayî ya mirovî a zindîyî ya. Di vê çerçoveyê de li gorî jîyanê biwatekirina li ser gotinan û hwd re jî, diafirê. Têgîna jîyanê, wê her wusa, xwe bi gotinan re werêne ser ziman. Her gotinak, bi hebûna xwe ya ku salixkirî re, wê rewşek ji wan rewşên jîyane me ya ku em wê dijîn wê bi xwe re salix bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de aqilê mirov jî, xwe diadilêne. Têgîna gotinan, temenê xwe bi vî rengî ji jîyanê digirê. Gotin, bi rengê ku weke 'têkerîyekê' hatî salixkirin, wê xwediyê heyîneka şenber a dîtbar ya bi têngîna rewşa ku bi wê re hatî salixkirin bê. Di vê çerçoveyê de gotin, dîtbarîya wê, dema ku mirov bi nixî li wê dihizirê, wê tişteki ji mirov re bibêje.

Li vir, emê ji vir hê mijara xwe bidomênin. Lê li vir, em hinekî li ser tawandina gotinan bisekin. Her wusa, ev jî, wê weke aliyekî ku mirov bi teybetî divê ku wê hilde li dest û fahm bike ya. Tawandina gotina, wê weke teybetîyaka kurdî ya kevn bê. Ji vê teybetîyê, mirov dikarê gavê biavêje û wê weke zimanekî afîner dikarin werênina ser ziman. Di nava xwe de, gotinên wê yên ku ji hevdû hatina kitakirin û ew kita ku li wan hat hizirin, bi wan xwandina bigotinê, wê weke aliyekî wê yê morfolojikî bê. Di vê çerçoveyê de, di wê çerçoveyê de bi awakirina gotinê û hwd jî, wê weke aliyekî ku di vê çerçoveyê de temem dike bê. Têgîna gotinê, her wusa, li vir, giringa ku mirov hinekî wê fahm bike. Gotin, dema ku mirov wê dahûr dike, mirov ji wê digihîje hevbeşîyeka hevgerîni ya rewşî. Dema ku

kitakirina gotinê çê dibe, weke ku ew were ji hevdûkirin, rewşek dihê li holê. Lê em dizanin ku her gotina ku afirî bi têgîn, awa û kirdeya têgihîştî bû û pê de, wê di vê çerçoveyê de xwedyê awayekê jî bê.

Di kurdî de, xwandina gotinekê bi bi gelek rengan û her wusa bi gotinekê xwandin û derhanîna gelek wateyên ku bi hevdû ve girêdayî li dût hevdû ku mirov dikarê wan kifş bike jî, wê weke aliyekî giring ê teybet bê. Gotina 'ka', tawandina wê ya bi rengê 'kê' wê li gorî reşê bê. Her wusa, em dema ku tawandinê li ser gotinê re dikin, em dikarin, weke navê ziman, em dikarin gotina 'ziman', di vê çerçoveyê de weke minaq werênina ser ziman. Çerçoveya gotina 'ziman', bi rengê wê yê ku bi wê tê nivîsandin, her wusa bi rengê asayî, weke 'ziman' dihê nivîsandin. Di hundurê hevokê de "ez bi zimanê dayika xwe diaxifim", weke gotinaka ku di wê de gotina 'ziman', bi awayekî xwe yê ku em nûha bikardihênin dihê dîtin. Her wusa, em gotina ku di wê de 'ziman', dihê bikarhanîn, bahse dayikê dike. Bi wê re jî, dihêne ser ziman ku ew ziman ji dayikê ya. Mirov, ji vê digihijê vê têgînê ku '*mirov, ji dayikê fêrî ziman dibe*'. Lê ev gotina, ku bi rengê 'mirov, ji dayikê fêrî ziman dibe', mirov dikarê bi heman rengî gotina ziman di wê de bitawêne û werêne ser ziman. Bi rengê tawandina gotinê, wê weha bê. "*mirov, ji dayikê fêrî 'zimên' dibe*." Li vir, dema ku em li ser wateya ku ev hevok dide ku mirov dihizirê, her wusa, mirov digihijê wê têgînê ku weke hevdû wateyê dide û ji me re dibêje. Lê dema ku em li hundurê wê dinerê, di yekê de gotina "ziman" bi rengê tawandî ê "zimên" hatîya nivîsandin. Têgîna tawandinê, li gorî demê dibê. Her wusa, têgîna demê ya di hundurê vê tawandinê de berfireh a. Di karê li gorî 'demabuhurî' jî werê xwandin. Her wusa, lê dikarê li gorî rewşa ku biwê hatî ser ziman a wê rewşa wê kêlikê were xwandin. Weke wê rewşa wê kêlikê xwandina wê, her wusa, di vê çerçoveyê de adilandinaka li gorî gotinê û hevokê ya bi hevokên din re ya. Ankû, adilandinaka di nava hevokê de ya li gorî rewşê ya. Ev rewşa ku li gorî wê dihê adilandin, wê her wusa, têgîna şenber a gotinê a salixkirinî bi wê dîtbarîya wê re bike temenê gûharînen bi ziman re ên di çerçoveya pêşxistina wê de. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ziman, her wusa, li gorî rewşê adilandina wê, wê li ser têgîna salixkirî a gotinê re bê. Li ser dengê ku bi wê hatîya kirin re bê. Her wusa, dengî ku hatîya salixkkirin, ew deng, wê her wusa, bi wê hişarîya di derbarê de ku bûya re wê xwe werêne holê û bide dîyarkirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bi teybetî werêne ser

ziman ku ev tawandinên ku mirov dikarê bi rewş û demê re di hemû gotinên vî zimanî de bike, bi rêzimanî ê zanîna wê re ziman dike rewşeka hilberîner de. Her wusa, zanîna ziman, ku êdî dikarê biawayekî hîlbêrêne, wê bi vê rewşê re xwe bide dîyarkirin. Zanîna ziman a hilberîner, di vê çerçoveyê de li ser têngîna gotinên ziman ên ne 'statik' re dibe. Zimanekî ku gotinên wê xwediyê teybetîya tawandinê na, ew ziman xwediyê zanînnasîyaka zimanî a hilberîner a. Her wusa, em vê rewşê divê ku bi teybetî binxat kin û werênina ser ziman. Têngîna zimanê kurdî, di vê çerçoveyê de dema ku mirov çendî li ser wê dihizirê û di nava wê de bizanîni û fahmkirina xwe re kûr û dûr diçe, her wusa vê yekê mirov bizanistîya ziman û zanîna wê re wê kifş dike. Zanîna wateyê, li vir, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê hilde li dest, Têngîna ziman, di vê çerçoveyê de giringîya wê, bi hebûna wê re dihê li holê. Li vir, bi teybetîya 'tawandina' gotinan re em li vir, divê ku bi 'watekirina kitayan a bi awayîya wêneyî' re lê bihizirê. Ev rewş, her wusa, bi dîroka ziman re li ser awayê pêşketinên wê ên bidemê re di wê de û bi wê re diafirin. Di nava kurdî de, di vê çerçoveyê de, mirov vê rastîya wê bi pêşketina wê û bi dîroka wê ya pêşketinê re bi wê re kifş dike.

Têngîna tawandinê, her wusa, mirov divê ku hinekî din jî di çerçoveya watekirina wê de pêde herî. Ev yek, li vir, weke pêwîstîniyekê bo fahmkirinê ya. Dema ku mirov li gotinên ziman dihizirê, her wusa, di vê çerçoveyê de, mirov bi vê rengê wê bi wê re kifş dike.

Têngîna tawandina gotinan, her wusan, li vir, çend ku cih bi cih dikarê bi 'demê' re jî were hanîn li ser ziman, wê her wusa bi di nava hevokê de giraniya dîtbarîya bi rewşê re weke ku zêdetirî derdikeve li pêş. Her wusa, têngîna 'demê' jî, wê êdî xwe di nava wê ya rewşê de xwe bide windakirin û yankû veşartin.

Rengê tawandina gotina, ku me bi minaqî li jor hanî ser ziman, her wusa, temenê bikarhanîna ziman bi awayekî afrîner a jî. Her wusa, bi gotinî hilberînerîya têngînî, temenê wê di vê çerçoveyê de bi awayekî xwezayî weke ku di afirê rewşek dihê li holê. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku têngîna rewşê, her wusa, têngîna tawandinê, li vir, wi di çerçoveya afirandina zimanî a bi hilberînerî de xwe bide dîyarkirin.

Ziman, gotinên wê bi rengên ku hatina salixkirin, weke ku dervî têngîna demê na. Her gotin, her wusa, wusa wê hîsekî bi xwe re bi mirov re bide çêkirin. Lê gotin, bidemê re ya. Her wusa, ji ber ku her gotin, bitêngîna xwe ya demkî re salixkirina wê bûya. Bi du awayan mirov dikarê salixkirina

gotinan werêne ser ziman bi demê re. Yek, weke ´nav´ û hwd, wê weke ku dervî demê bin, wê xwe bidina dîyarkirin. Lê bi nirxî salixkirina rewşê û ankû bi navkirina wê, wê di çerçoveya têtînek demî de bê. Di vê çerçoveyê de hebûna têtîna demê, di hundurê zimên de, weke mijaraka ku mirov dikarê ji pirr aliyên ve lê bihizirê û wê werêne ser ziman a.

Têtîna tawandina gotinan, wê weke aliyekî giring ê afrîner ê ziman bê. Dema ku mirov di vê çerçoveyê de her wusa lê dihizirê, mirov wê aliyê wê, hinek têtînen din re jî kifş dike. Zimanê ku bi vî rengî karibê hemû gotinên xwe yê zimanî ên ku bi şenberkirina, wê karibê hevgirtinê jî bi xwe re ji hinek aliyên ve bide çêkirin. Li vir, dema ku em li zimanê kurdî dinerin, vê rewşê bi wê re dibînin. Her wusa, hevgirtin(sentez)kirin, weke rewşek ku mirov divê ku ji gelek aliyên ve bi ziman re biteybetî û li gorî xosletên wê ên bi ziman re li wê bihizirê û wê werêne ser ziman. Her wusa, ev alî, weke aliyekî ku wê aliyê tawandinê ji aliyekî din ve jî dihêne ser ziman a. Her wusa, mirov vê yekê jî, divê ku bi teybetî werêne ser ziman.

Di zimanê kurdî de, bi çend gotinan jî bê, divê ku mirov bahse hevgirtina di hundurê zimanê kurdî de bike. Emê piştî di dewama wê de vegerehana hanîna li ser ziman a ´tawandina gotina û wate û giringîya wan ya di afrînerîya ziman de. Her wusa, li vir, ev wê weke aliyekî giring ê ziman jî bê. Dema ku mirov bahse zimanekî kir, divê ku mirov bi hemû aliyên wê re di derbarê wê de xwediyê zanîne bê. Zanîna ziman, temenê têtîliya baş a bi hevdû û di nava xwe de ya. Bi demê re pêşketina di kurdî de her wusa, wê di çerçoveya hevgirtina gotinan de bi demê re gotin biafirin. Î ro, di jîyane xwe de di nava kurdan de, gelek gotinên weke ´jê´, ´jêr´, ´jê re´, ´pêre´, ´pevre´, ´jevre´, û hwd, ku em dikarin gelek gotinan li van zêde bikin, wê weke gotinên hevgirtî(sentezkirî) bin. Wate gotinên hevgirtî jî çi ya? Wateya wê ew a ku gotinek, ji çend gotinan bi hevdû re pêkhatîya. Her wusa, dema ku ew tê ser ziman, wateya wan gotinên ku bi hevdû re, bi yekcarê dihêne ser ziman. Gotinên hevgirtî, bi serê xwe xwediyê hinek teybetîyên cuda na ku mirov divê ku wan bi teybetî fahm bike û werêne ser ziman. Her wusa, ew jî, aliyekî giring ê ziman û zanîna wê diafirênin. Li vir, divê ku mirov vê yekê bi vê rengê werêne ser ziman ku têtîna ziman, wê li vir, di vê çerçoveyê de xwe bide der. Fahma ji gotinên hevgirtî, fahmaka ku mirov dikarê ji hevokekê bigrê ya. Herwusa, di hin rewşna de, gotinên hevgirtî, weke hevokekê bi wate û xwedî wate na. Em li vir, divê ku di serî de li vir vê rastiyê bi gotinên hevgirtî re fahm bikin

ku gotinên hevgirtî, wê xwediyê têtgînên giring bin. Her wusa, li ser gotinên hevgirtî de, bahse 'pirr-zanînê' bi gotinekê re kirin jî, wê rast bê. Di vê çerçoveyê de gotinên hevgirtî, weke xwediyê têtgînek livandinê a hevbeş in. Her wusa, dema ku mirov gotinên hevgirtî dahûr dike, bi wê re mirov her wusa bi wê re pirr-zanetîyê jî kifş dike. Hevbeşîya gotinê, biawayekî vekirî bi wê re heya.

Mînaq, gotinên hevgirtî ku me li jor bahse wan kir mirov dikarê bi vî rengî wan ji hevdû derxe. "Jê", weke gotina ku bahse "ji wê" û ankû "ji wî" dihêne ser ziman a. "Jêr", weke gotinaka ku "li jêr" û ankû "ji wî re" û an jî kû weke "ji wî re dihêne ser ziman. "Jê re", weke gotina ku bi gelek gotinan re bahse "ji wî re" û ankû "ji wê re bike ya. Di çerçoveya levhanîna du tiştan de jî, bi dîtina tiştêkî din re ku bibêje ji "ya din re ya" dihêne ser ziman. "Pêre", bi gelek wateyan re dikarê di wate ya "bi wê re û ankû bi wî re" de werê hanîna li ser ziman. Gotina "pevre", weke gotinaka ku dîsa bi gelek wateyên dikarin werina derxistin re, bi wateya "bi hevdû re" û ankû "bi hevdû re na" û hwd werêne ser ziman. Gotina "jevre", weke gotinaka ku bi wate ya "ji hevdû re" û ankû "ji hevdû re baş in" û hwd, dikarê werêne ser ziman. Weke ku tenê bi gotinên ku me bi watekirina wan re hanî ser ziman de jî, dihê dîtîna ku weke ku her yekê ji du û ankû sê gotinan diafirê. Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov werêne ser ziman ku gotin, her wusa, bi hevgirtîna wê re heya.

Gotinên hevgirtî, her wusa, weke rengê li ser wate û ankû gotinê bixwe re ku bi hanîna cem hevdû û ankû bi rêzîkirina tîpan û hwd re ku biawayekî nû hatî nivîsandin weke bêjeyek nû ku wan wateyên wan gotinên ku bi wê re hatina cem hevdû bi hevdû re di çerçoveyek nû de ku werêne ser ziman.

..

Li vir, divê ku mirov vê aliyê her wusa, di çerçoveya têtgîneka afrînê de werêne ser ziman. Ev aliyekî bi zanîna ziman ku hilberîna dî nava ziman de li ser temenê zanîn, rêzîmanî, watekirin, û hwd re ku dikê ya. Di vê çerçoveyê de têtgîna hevgirtîna, her wusa, weke têtgîneka giring a zimanî ya. Divê çerçoveyê de, divê ku mirov vê yekê jî bi teybetî binxatkê û werêne ser ziman ku bo ku mejiyek wê hilberîna ziman bi zanîna wê re bike, divê li ziman serwer bê. Ev yek jî, weke aliyekî giring ê ziman a. Dema ku ev nebê, wê nikaribê biafirêne. Wê nikaribê wê afrînerîyê bide nîşandin û wê hilberîna bi ziman û gotinê re bike.

Li vir, divê ku em vê yekê jî bibêjin ku di serdemên buhurî de ev hevgirtin û çêkirin di nava zimanê kurdî de hatina kirin. Gelek gotinên hevgirtî ku em î ro bikardihênin, ên wan demên buhurî na. Ev jî, wê dide nîşandin ku di demên buhurî de di derbarê zanîna ziman û gotinê de têgîneka baş ku wan dikarê li ziman serwer bike bi wan re heya. Ev jî, bûya temenê afirandin û hilberînên giring bi rengê hevgirtinkirina gotina û çêkirina gotinên hevgirtinî û hwd. Ev jî, divê çerçoveyê de, weke birhanaka û ankû nîşanayaka ku em divê ku di vê çerçoveyê de ku werênina ser ziman a. Her wusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku têgîna hevgirtinî a zimanî, her wusa, di temenê wê zanînaka zimanî a biserwerî heya. Ev jî, temenê wê afirandin û hilberînê de ya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku ziman, heyîneka giring a ku diafirênê ya her wusa gotinên ziman, dema ku mirov li wê dihizirê, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku di nava afirandinaka mazin de na. Ziman, bi aliyê xwe yê ku di karê gotinên xwe bitawêne û her wusa bi aliyê xwe bi afirandina gotinên hevgirtî(sentez) re hertimî di nava hilberînekê de ya. Em vê yekê, her wusa bi ziman û dîroka wê re pirr baş û qanc kifş dikin. Dema ku em li demên ku buhurîna ku li wan dinerin, em vê yekê, her wusa biawayekî vekirî kifş dikin û dibînin. Têgîna ziman, di vê çerçoveyê de weke hêzeka afrînerî ya çêkerî di jîyanê de xwediyê afrînerîyeka zêhnî û têgînî ya di jîyanê de ya. Her wusa, bi teybetî, ev herdû aliyên ziman ên bi tawandina gotinan û her wusa hevgirtin(sentez)kirina) a gotinan re, wê her wusa, zanîna ziman a hilberîner xwe bide dîyarkirin. Di nava jîyaneka têgîhişti de jî, her wusa zimanê afrîner, zimanê pêşketinê ê ku dikarê pêvajoyê biadilênê ya. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku ziman, di vê çerçoveyê de di nava afirandinekê de ya. Ev xosletên ziman, her wusa, çendî ku ew ziman li jîyanê werê bikarhanîn, wê afirandinê bi rengê hilberînerîyê bi wê re bide çêkirin. Ev, weke rewşeka xwezayî ya ku mirov dikarê li vir wê kifş bike û werêne ser ziman. Têgîna ziman, di vê çerçoveyê de bi adilîna wê ya bi gotinan re, êdî wê rewşê bi demê re diafirêne. Li vir, em divê ku hinekî li ser têgîna ziman a afrîner biskein in. Piştî hinekî hanîna ser ziman a xosletên ziman ên tawandin û hevgirtinîya bi gotinan, êdî her wusa li ser têgîna pêşxistina bi ziman re jî mirov dikarê li ser wê bisekinê. Ev jî, wê êdî vê temenê fahmkirin û bikarhanîna van xosletên ziman bi xosletên wê ên din re di jîyanê de bide nîşandin.

Têgîna gotinên hevgirtî, di çerçoveya levhanîn û levkirina wan de heya. Di vê çerçoveyê de, dema ku mirov dahûrya gotinên hevgirtî werêne ser ziman, mirov divê ku li ser têgîna kirdeyî û wateyî ya gotinê re wê bike. Di vê çerçoveyê de levhanîn û çêkerîya ku bi kirdeyî hatî çêkirin, bi gotinê êdî li wê bi nivîsandina gotinê bi renekî nû re weke kirasekî ku li wê were kirin dibê. Her wusa, divê çerçoveyê de, têgîna kirdayî, dema ku em bi dahûrîya wê ya di çerçoveya gotina hevgirtî de werênina ser ziman, divê ku mirov bi çêkerîyeka têgîhiştî re wê werêne ser ziman. Ev çêkerî, her wusa, weke aliyekî wê yê giringa ku mirov divê ku werêne ser ziman a. Di aslê xwe de, weke aliyekî afrînerîya zanîna ziman bi awayekî hilberînerî, di vê çerçoveyê de dihê dîtin. Têgîna afirandinê, di vê çerçoveyê de bi awayekî zêhnî, mirov wê li ser gotin hevgirtî ên têgîhiştî re kifş dike.

Dema ku mirov ji aliyê aqil û zêhnê mirov re li vê rewşa afirandina gotinên hevgirtî binerê, her wusa rewşeka teybet ya ku em divê ku wê kifş bikin derdikeve li holê. Her wusa fahmkirina, wê têgîna gotina hevgirtî, wê weke levkirina darêjkî ku bi awayekî çêkerî hatîya afirandin, wê temenê fahmkirina aqilê zêhnê mirov jî bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku zanîna ji zêhnê, ji kurdî gotina 'jîrê' ji wê re tê bikarhanîn. Her wusa di wê wateyê de dihê bikarhanîn. Ev gotina jîrê jî, weke gotinaka pîr kevn a serdemên serdemê a kurdî ya. Jîr, têgîna têgîhiştî a zanîna aqilê mirov a.

Ji aliyê aqil ve, dahûrîkirina gotinên hevgirtî, wê mirov bi awayekî xweza li ser têgînên ziman û wê çerçoveya wan gotinan û afirandina wan û her wusa bi levkirina wan ya bi wateyî re ku bi çêkerî hatina çêkirin re, wê mirov bigihêne têgîna zêhn û zanîna wê. Li vir, di aslê xwe de, gotinên hevgirtî, weke têgîna zêhnî jî mirov dikarê werêne ser ziman. Ev jî, her wusa, wê weke aliyekî giring ê fahmkirin me ya ji zimên bê.

Em li vir, hê jî divê ku di fahmkirina vê gotina hevgirtî de kûr û dûr herin. Ev, weke aliyekî têgîhiştî ê ziman jî ya. Her wusa, di nava ziman de, gotinên hevgirtî, weke aliyekî zêhnî ê di nava zimên de ku êdî dihê afirandin de. Yanî, bi gotinaka din, êdî di nava ziman de bi awayekî şenber bi gotinkirina têgîna zêhnê ya. Li vir, em ku bahse wê hevgirtina wateyî ya gotinê dikin, her wusa pîr-wateyî bi wê re em dibînin ku dihê dîtin. Pîr-wateyî, bi awayekî 'naqşeyî', weke têgînekê jî xwe dide dîyarkirin. Em dema ku di vê çerçoveyê de li wê naqşaya gotina hevgirtî dihizirin, her wusa, bi awayekî bi hanîna cem hevdû û ankû ji hevdû afirandina wateyên

wê, têtîneka bi rengînî a naqşayî ya zêhnî jî xwe dide dîyarkirin. Li vir, bi gotinaka din, em dikarin bibêjin ku gotinên hevgirtî, weke naqşayna zêhnî ên ku di nava ziman de bi zanîna zimên re ku hatina afirandin in. Zimanê zanînê ku mirov bahse wê bike, her wusa, di vê çerçoveyê de mirov dikarê biawayekî ji ewla bahse wê bike.

Zimanê zanînê, li vir, li ser vê rewşê re mirov divê ku hinekî li wê bihizirê. Têtîna zanînê, dema ku mirov li wê dihizirê, mirov di çerçoveya ziman de wê dibînê. Ziman, bi hanîna ser ziman a aqil re her wusa wê rewşê diafirîne. Li vir, em vê yekê bi awayekî din jî divê ku werênina ser ziman. Zimanê zanînê, her wusa, dema ku mirov bi aqil û zanîna zimên, ku di nava zimên de, bi têtîneka çêkerî li ser wate û kirdeyê re bi levkirinê re ku mirov bahse wê dike, wê weke aliyekî wê yê zanînî jî bê. Ji vir, mirov divê ku hinekî bi zanîn û afirandina bi zimên re li zanîna zimên jî bi hizirê. Di vê çerçoveyê de ziman, weke awayekî giring ku mirov divê ku wê werêne ser ziman a. Têtîna zanînê, di nava ziman de, her wusa bi gotinê re, bi rengê gotinê re dihê li holê. Piştî ku nivîsandin pêşket û pê de, ew rengê nivîsandin bi gotinan re wê êdî weke aliyekî şenber ê têtîni ê aqil bê. Her gotin, dema ku hat bi tîpkirin û nivîsandin, ew rengê wê gotinê ê bi tîpkirinê bisalixkirinê di navaroka wê de, wê xwe bi awayekî aqilî bide dîyarkirin. Her gotin, tiştêkî ji me re dibêje. Ev, weke têtîneka zimanî ya ku em divê ku li vir werênina ser ziman a. Têtîna ziman, li vir, dema ku em bi gotinê û li ser nivîsandina wê re lê dihizirin, her wusa em weke aliyê zanînê ziman dihênina ser ziman. Li vir, ziman, weke aliyekî têtîni xwe dide dîyarkirin.

Em li vir, divê ku bi çêkerîya bi gotinî a bi gotinên hevgirtî re wê zanîna ku êdî diafirîne werênina ser ziman. Ev, weke aliyekî giring ê ziman a. Têtîna ziman, li vir, vê yekê, bi xwe re dihêne ser ziman. Têtîna ziman, em li vir, li ser zanînê wê bi gotinên hevgirtî re dihênina ser ziman. Her wusa, di nava ziman de bi gotinkirina têtîna jîrî jî bi awayê çêkerîya gotinîyên hevgirtî re xwe dide dîyarkirin. Têtîna gotinên hevgirtî, li vir, gelek tiştan bi zanînî dike ku ji me re di çerçoveya aqilê me û pêşketina aqilê me de ji me re bibêje. Her wusa, gotinên hevgirtî, weke pêvajoyeka pêşketina aqil a bi ziman re jî mirov dikarê werêne ser ziman. Çawa ku bi ziman, mirov diafirîne û di nava ziman de b têtîna zanînî û jîrîya wê re diafirîne û dihêne ser ziman, bi wê rengê xwe dide dîyarkirin. Têtîna

gotinên hevgirtî, di vê çerçoveyê de weke bi hanîna ser ziman a têngîna aqil re xwe dide dîyarkirin.

Li vir, ez divê ku vê yekê jî, werênima ser ziman ku pêşketina bi aqilê mirov, dem bi dem zêde dibê û mirov dixwezê ku wê pêşketinê bizimanê xwe re bi awayekî baş û têr werêne ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de dema ku mirov hewl dide ku gotinên hevgirtî fahm bike, mirov bi kirina tiştêkî rast re temenê hanîna ser ziman a wê zanînê jî fahm dike. Her wusa, dem bi dem, çendî ku zanîn pêşket û zêde bû, wê pêwîstî bi gotinên hevgirtî ên ku di ziman de werina afirandin wê hebe. Em dema ku di vê çerçoveyê de dihizirin, em dikarin bêjim ku zimanê kurdî de hê di dema gûtî, hûrî û mîtannîyan de em dibînin vê yekê dibînin. Ji ber ku em pêşxistina gotinên hevgirtî di zimanê kurdî de hê di van deman de kifş dikin. Gotinên hevgirtî, di temenê wê de hizirkirinaka bi rêk û pêk heya. Her wusa, em dikarin bêjin ku nivîsandin jî heya. Ji vê yekê, em dikarin bibêjin ku zimanê kurdî di van deman weke zimanê nivîsandinê, gihiştîya astaka ku êdî bi vî rengî bi gotinên hevgirtî di nava xwe de bidest afirandina zêhnî û jîrî a bi çêkerî jî dike.

Di vê çerçoveyê de gotinên hevgirtî, weke aliyekî ziman ê zêhnî û pêşketina wê jî ya. Lê li vir, em bi gotinên hevgirtî re, her wusa, rastî aqilekî çêker ê bi ziman re tên. Ev di her rewş û pêvajoya fahmkirina gotinên hevgirtî de derdikeve ber me.

Di vê çerçoveyê de dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, weke aliyekî giring ê zimanî mirov bihizirê û werêne ser ziman. Li vir, ziman, rastîyaka aqilî a jîyanî û hizirkirina mirov a. Mirov, piştî ku bi dest hizirkirinê kir û pê de, di xêva mirov de girtinê dest pêkir. Girtin, bi awayekî mirov dikarê weke nivîsandinê jî werêne ser ziman. Ziman, her wusa, bi pêşketina aqil mirov re xwediyê hevlingîyekê ya. Em dema ku bahse ziman bikin, divê ku em bi vê hevlingîyê re bahsê bikin. Ziman, bi wê re aqil dihê ser ziman. Her gotin, piçekî aqil jî ya.

Em nikarin, gotinê, biserê xwe weke tiştêkî vala bibînin û werênina ser ziman. Em dema ku wusa bibînin, emê rastîya aqil a bi ziman re înkâr bikin. Ku ziman bêaqil hebûya, wê çawa divê ku mirov bipirsê ku çima bêaqil ziman xwe nayênê ser ziman.? Ziman, bêaqil xwe nayêne ser ziman ji ber ku ziman bixwe jî ji aqil a. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Her tiştê ku di jîyanê de hatî dîtin û bi navkirin û ankû hatî hizirkirin, êdî weke aqilekî ku di zimane me de heya ya. Em î ro, li

pêşketina zimanê demên buhurî dinerin, hewl didin ku fahm bikin ku ka çi hizirîna û bi hizirkirina xwe re çawa hizirîna û hanîna ser ziman. Em hewl didin ku vê kifşkirinê biaqilê xwe re bikin. Ev ji çi tê? Ev ji wê tê ku di nava ziman de û bi rengê ziman û pêşketina gotinên ziman re ew rengê aqil heya. Her wusa, awayê pêşketina ziman jî, di vê çerçoveyê de rengê pêşketinê dide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de aqil û ziman bi hevdû ve girêdayî na. Em nikarin wan ji hevdû bikin. Pêşketina ziman, wê her wusa, di vê çerçoveyê de bi pêşketina aqil re bê. Lê li vir, wê pêşketina aqil jî, wê bi pêşketina aqil re bê. Li vir, mirov vê yekê û rewşê bi pêşketina gotinên hevgirtî ên di zimanê kurdî de re baştir fahm dikin. Dema ku têgîna aqilî zêdebû, ziman, bi zêhnî dike ku çekerîya xwe bikarbêne û gotinan hilbêrêne bo hanîna ser ziman. Yanî, li gorî hevdû pêşxistina hevdû, bi ziman û aqil re heya. Em vê rewşê, bi gotinên hevgirtî re wê kifş dikin. Gotinên hevgirtî, weke pêvajoyaka aqilî a ku ziman dike ku xwe li gorî wê biadilêne û wê werêne ser ziman a. Di vê çerçoveyê de têgîna ku bi gotinên hevgirtî re dihê kifşkirin, têgîneka demî û ya bi pêşketina aqil a. Gotinên hevgirtî, di vê çerçoveyê de weke gotinna ku mirov divê ku wan bi têgînî weke gotinên aqil hilde li dest û werêne ser ziman. Her wusa weke gotinên dema aqil jî mirov divê ku wan werêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov di çerçoveya têgînên gotinên hevgirtî ên di ziman de hinekî din jî bi hizirê. Di vê çerçoveyê de bi têgîn û pêşxistina di nava ziman de a bi zanîna ziman re divê ku mirov li wê bihizirê. Her wusa li vir, em tiştêkî bi teybetî divê ku ji gotinên hevgirtî ên ku di nava zimanê kurdî de diafirin, her wusa ji wan fahm dikin ku ziman dikarê xwe di temenekî afrîner de pêşbixe bi pêşketina demê ya aqil re. Her wusa, divê çerçoveyê de aqil, vê yekê bi ziman dide kirin. Em vê jî divê ku li vir, ji bîrnekin û werênina ser ziman.

Têgîna gotinên hevgirtî, wê ji aliyekî ve bi hebûna têgîna tawandina gotinan a di zimên de, wê bi hevdû tememkirinekê re wê temenê hilberîna di nava zimên de a bizanîna zimên re biafirênin. Her wusa li vir, di vê çerçoveyê de aliyekî ziman ê afrîner xwe bi demê re di nava ziman de û ku di temenê wê de zanîna ziman heya wê xwe bide dîyarkirin. Gotinên hevgirtî, dema ku mirov bi çerçoveyaka hizirî ku li wan bihizirê û hewl bide ku wan fahm bike û werêne ser ziman, mirov wê vê yekê kifş bike ku weke naqşeyna zêhnî ê zimanî na. Di vê çerçoveyê de her wusa, mirov vê

yekê bi başı kifş dike. Rewşa ziman a afrîner, her wusa biaoqil re xwe bi gotinên hevgirtî ênn ku ziman wan bi demê re diafirêne re xwe dide li der.

Têgîna tawandina gotinan, weke aliyekî ku mirov wê weke ya têgîna gotinên hevgirtî, ku divê ku mirov werênê ser ziman. Afrînerîya bi gotinan a bijîrî, xwe bi wê tawandinê re bi aliyekî xwe ve dide li der. Em vê yekê, her wusa vê yekê baş dibînin. Bikarhanîna ziman, di çerçoveya van rastiyên wê de, wê herwusa ziman weke heyîn û hebûna afrîner ya ku diafirêne wê derxe li ber me. Zanîna ziman, weke zanînaka hilberîner mirov wê di vê çerçoveyê de kifş dike. Ev jî, wê her wusa, bi zanînê re bibe. Têgîna ziman bi zanîna wê re, di vê çerçoveyê de bi dîrokê re bi afirandina wê re xwe dide li dest. Di vê çerçoveyê de ziman, aliyekî wê ye ku mirov baş fahm bike heya. Bo pêşketina biaoqil a dem bi dem ku xwe zêde dike, têgîna ziman ku bi wê re ew aqil werê ser ziman, di vê çerçoveyê de li ser xosletên afrînerîya ziman re li ziman hizirîn, wê aliyekî pêşxistina mirov a li gorî wê aqilê jî bê. Her wusa, li vir, ev jî pirr girin tê dîtin ku di ziman de xosletê tawandina her gotinî û çêkerîya bi zanîna ziman a bi gotinên hevgirtî û hwd, wê temenê wê dem bi dem xwe pêşxistina li gorî demê jî bê. Di vê çerçoveyê de dema ku em bahse ziman bikin, divê ku mirov bibêje ku ji ziman ji wan gotinên wê ên ku hatina ferhengkirin zêdetirî xwediyê têgîn, zanîn û pêşketin û gotinên xwe yên ku bi werina ser ziman a. Em nikarin ziman, bi wan gotinên ferhengî ku hatina ser ziman re bitenê werênina ser ziman. Ew, dibê ku nadê ji sadî 10'ê wê jî.

Li vir, ya giring mirov bi aliyê wê afrîner re dibîne. Zimanekî pêşketinê, ê ku xwediyê wê zanîna zimanî a hilberîner a. Her wusa, divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman. Zimanê ku vê rengê çêkerîyê diafirêne di nava xwe de, wê karibê her pêşketinê bi xwe re werêne ser ziman. Temenê hanîna wê ya li ser ziman jî, wê ew afrînerîya bi hilberînî a bi zanîna ziman a di nava zimên de ya. Em, di vê çerçoveyê de dema ku li van herdû teybetîyên zimên dihizirin, em weke ku li temenê pêşketina bi demê re a bi ber pêşarojê ve ku lê dihizirin li me tê. Her wusa, bi giringîyekê, divê ku mirov li wê bihizirê û wê werêne ser ziman. Têgîna tawandina her gotinî zimên de, her wusa, bi vê rengê bitêgîna afirandina gotinên hevgirtî û hwd re, wê biziman re xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de temenê pêşketinê xwe dide li dest. Ev, weke aliyekî giring ê ziman a. Her wusa, di vê çerçoveyê de di serdemeka aqil de herî zêde jî bi pêşketina aql re di ahengekê li van teybetîyan hizirîn, wê temenê pêşketina

wê ya bi demê re jî bê. Têgîna ziman, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku bi dîrokê re van teybetîyên xwe yên weke wê teybetîya ku dikarê hemû gotinên xwe bi tawêne û her wusa gotinên hevgerî çê bike, bo wê pêwîstî bi buhurîna bi hezaran salan bi pêşketina bi aqil a li ser ziman re divêt. Ev, wê weke aliyekî giring ê wê yê pêşketinê bê. Têgîna zimanî, her wusa, dema ku em bi gotinî li wê dihizirin, em vê yekê biawayekî vekirî kifş dikin. Her wusa, ev têgîna tawandina gotinan, ji wê teybetîya ne 'statik' bûyîna ziman tê. Ev, dide nîşandin ku ev ziman ne zimanekî statik a. Her wusa ev ziman, weke zimanekî herîkbar ê bi demê re ya. Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov nêzîkatîya li zimanê bi vî rengî jî wê bi teybetî û biserê xwe bê.

Mejiyê ku bi têgîna tawandina gotinan mazinbûya, ew mejî, wê hertimî di afirandina xwe de li pêş bê. Wê di levkirinên gotinan de û her wusa bi wateyê naqşkirina rewşê û hwd, wê di wê de serkevtî bê. Ev jî, wê di temenê têgîneka ku dikarê di awayekî li dûvhevdu bi ziman fahmkirinê ku dikarê bi fahmkirinê zû pêde herê ya.

Hizirkirina bi ziman, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî, bi teybetî werêne ser ziman ku ziman, weke aliyekî têgînê ê mirov a jî. Mirov, bi ziman têkiliyê didêne û xwe dihêne ser ziman. Mirov bi ziman dikarê aqil bimeşêne. Her wusa bi ziman, mirov hebûna aqil jî salix dike. Li ser ziman re mirov vê yekê dike. Divê ku mirov vê yekê weke aliyekî giring werêne ser ziman. Ziman, rengê têgîna mirov a bi hişarî ya. Her wusa, bi jîyanê re bi aheng diafirê û pêş dikeve. Lê ya ku wê diafirêne jî, mejiyê ku dihizirê ya.

Hizirkirina mirov di vê çerçoveyê de divê ku mirov bi ziman re werêne ser ziman. Yanî, bi ziman re ew hizirkirina mirov heya. Gotinên ziman, weke têgînên aqilî na. Em vê yekê, bi awayekî vekirî kifş dikin. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku ziman û aqil bihevdu re di nava ahengekê de pêş dikevin. Di vê çerçoveyê de bi hevdu re jî pêş dikevin.

Her wusa, em li vir carek din vegehirina ser tawandina gotinan. Ev weke aliyekî ku mirov di çerçoveya fahm û pêşketina aqil de li wê bihizirê ya. Her wusa, mejî bi vê teybetîya tawandinê re xwediyê rewan û herikbarîyeka biçalak a. Mejî, bi wê re zû dihizirê. Zû têdigihê. Zû fahm dike. Her wusa, zû têkiliyê didêne. Ev, weke ancamen wê pêşketina tawandina gotinê ên bi pêşketina ziman re na.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku di serdemeka aqil de, bi awayekî herikbar û çalak bikarhanîna mejî, wê di vê çerçoveyê de bi zanîna zimanî û rengê pêşketina wê re xwe bide dîyarkirin. Divê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku gotinên hevgirtî, ku weke jîra ji zêhnê mirov in, wê di vê çerçoveyê de weyn û rola wan zêdetir xwe bide dîyarkirin. Li vir, çendî ku pêşketinê bû û ziman di nava wê pêşketinê bû, wê ziman, van herdû teybetiyên xwe ên bi awayê tawandin û çêkirina gotinên hevgirtî bi çêkerî û hwd, wê bide nîşandin. Ev rewş, hinekî jî, nîşanaka pêşketina bi aqil in jî.

Di serdemeka bi aqil ku pêş dikeve de, her wusa em divê ku van teybetiyên ziman bi zanîna ziman re bi giringî şîrove bikin û werênina ser ziman. Her wusa, di nava zimên de zêde pêşketina gotinên hevgirtî, nîşanaka pêşketina zêhnî û jîrî a di nava civatê de ku bi wî zimanî dijî jî ya. Divê ku mirov ji vê aliyê ve jî lê binerê. Her wusa, li vir, em divê ku vê yekê bibêjin ku em divê ku civatê û rengê pêşketina wê bi giringî şîrove bikin û werênina ser ziman. Civat, her wusa, demma ku mirov wê bizimanê wê re fahm dike, weke ku mirov wê bi aqilê re fahm dike li mirov tê. Her wusa li vir, ziman, weke rengê pêşketina civatê jî xwe dide dîyarkirin.

Zimanê kurdî, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa biserdemên wê ên ku buhurîn re em rastî gelek pêşketinên mazin ên di wê de tên. Her wusa em serdemên weke serdemên gûtî, hûrî û mîtannîyan, di zimanê kurdî de weke serdemên hemdem ên şariştanî û hwd, divê ku mirov werêne ser ziman. Weke ku me li jor jî hanî ser ziman, wê hê di van deman de pêşketina gotinên hevgirtî wê di zimanê kurdî de xwe bidina dîyarkirin. Heta roja me jî, li herêmên kurdistanê ên weke Cizîra bota, Serhedê, Dersimê, Zaxo, Êrmîya, Qamişlo û hwd, em rastî vê rengê zimanê ên giring tên. Her wusa, herêmên li dora van herêman jî, weke van herêman bi demê re hin bi hin wê pêşketina xwe bidina çêkirin. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku têgîna ziman, di vê çerçoveyê de weke têgîneka civatî ku dema ku xwe pêş dixê, ne tenê xwe pêşdixê û bi pêşxistina xwe re civatê jî bi ppêşxistina wê ya ku diafirê re diadilêne re xwe dide dîyarkirin. Rengê, pêşketina civatî, mirov dikarê birengê gotinên ku dihên bikarhanîn di nava civatê re fahm bike. Her wusa, ev jî, wê ji aliyê zêhnî û jîrî ve xwe werêne ser ziman. Ziman, li vir, jîra herî pêşketî ya bi mejî re ya. Em di vê çerçoveyê de divê ku ziman, bigiringî û bi wê giringîya wê re bi pêşketina ziman re werênina ser ziman. Her wusa,

ziman, weke pêşketinaka dîrokî ya civatî dihê ser ziman. Lê biwê re, têkiliya di nava mejî û pêşketina mirov a di jîyanê de ku bi civatî bê û bi rengên din û hwd bin, wê biziman re ew were û bibe.

Li vir, em divê ku her wusa di fahmkirina xwe ya bi têgîna tawandina gotinan û her wusa bi ya gotinên hevgirtî, bi domênin. Ji xwe, dema ku ziman bi pêşketina civatî re bi ber pêşarojê ve diçê, her wusa di vê çerçoveyê de wê afirandina xwe ya bi demê re zêdetir pêşde bibêt. Her wusa, wê afirandina xwe ya bi pêşde bibê. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku di çerçoveya pêşketina bi aqil re têgînên afirandina zimanê ên weke bi gotinên hevgirtî û hwd re, wê weke têgînên em dikarin weke bergirên zimanê ên bo pêşketinê jî bin ku em werênina ser ziman. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê xwe werêne ser ziman. Ziman, bi afirandina bi vî rengî, dike û dixwezê ku bersivê bide zanîn û asta demê ya bi aqilî biwê zimanîya xwe re. Divê çerçoveyê de bi pêşketina bi aqil re êdî ev bergira ziman, wê di rengê hilberîna gotinê ya li ser zanîna ziman re ku di nava ziman de dibînin re wê bibe. Hizirkirin, dema ku mirov dê dihêne ser ziman, Her wusa li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku afirandinên bi aqilî, wê bi gotinê jî wateyeka wan ya afrînerî wê hebe.

Fahmkirina aqil, her wusa, wê bi gotinên ziman re bigihijê, astaka têgînî. Fahmkirin, wê her wusa weke aliyekî têgînî bê. Li vir, em dema ku bi gotinê dihênina ser ziman, minaq, gotina "gotinê", ku koka wê "go" ya, wê li ser wê re bahse hanîya ser ziman bike. "go", bixwe bahse hanîna li ser ziman dike. Dema ku li dawîya "go" êdî piştî 't' hat bicihkirin û pê de, wê êdî weke aliyekî giring ê di temenê salixkirina gotinê 'gotinê' bê. Dema ku 't', tê dawîya gotina 'go''yê, wê salixkirina gotinê di çerçoveya hanîna li ser ziman de bike. Di vê çerçoveyê de gotin, wê xwe bi koka xwe ya 'go''yê werêne ser ziman. Ez vê yekê jî, werênina ser ziman ku heta roja me jî, li herêma botanê, gelek dayikên kurd ên ku tenê bi zimanê kurdî dizanin, di dema ku bahse hanîna li ser ziman dikin, dibêjin "ne wê go". Di vê çerçoveyê de gotina xwe kin dihênina ser ziman. Dayikên kurd, ên ku tenê kurdî dizanin, di gotinên xwe ên ku dihênina ser ziman de, biawayekî ku carna ew bixwe jî dibê ku ne di farqê de bin, hevgirtinan bi gotinên xwe re dikin. Bi wê re jî, dema ku gotinê dihênina ser ziman, bi dengê teybet wê dihênina ser ziman. Ew deng jî, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, di serê mirov de dike ku gelek gotin, wate û her wusa

têgîn ji xwe re 'şaq bidin. Em em dizanin ku 'şaq' û ankû 'şaqdan' di wateya bi carekê re di mejî de hatina bîrkinê na. Yanî, bi renekî, weke ku bi carekê re werina bîra mirov bixwe re dihêne ser ziman. Ew jî, dema ku diaxifin, carna dibêjin, "ne bi carekê re di serê(mejî) min de şaq da." Her wusa, gotinên xwe diafirênin. Em dema ku li gotinên ku dihênina ser ziman, hê ew gotinên kin in ku bi hevdu ve girêdidin û bi wan hevokên xwe ava dikin û hizrên xwe yên di serê xwe de dihênina ser ziman. Her wusa di vê çerçoveyê de, vê yekê, bia wayekî xweza jî dikin. Gelek kokên kurdî, ku li ser wan gotinên tîn afirandin û hwd, ew bi gotinî bi wan biawayekî pirr bi şahraza hevokna xweşik ên biaqilane diafirênin. Teybetîya hinek dayikên me yên kurd, ew in ku dema ku diaxifin, car bi car, weke hin di gotinên xwe de hemû tîpên wan nabêjin li mirov tê. Minaq, dema ku di nava hevokê de gotina "dît" were bikarhanîn, ji devê wan bi rengê "ne min dî" û hwd derdikeve. Li vir, her wusa, wê 't'ya li dawiya dîtê ku heya wê weke bilêv nakin di nava axiftina xwe ya ku kirin. Di vê çerçoveyê de, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku vê yekê jî, bi awayekî xweza dikin. Yekî ku li ziman serwer bê, di wê yekê de bi awayekî ku zû diaxifê re, wê weke ku hin tîpên gotinê nabêje wê bike ku li mirov were bi axiftina xwe re. Her wusa, ev jî, weke aliyekî din ê gotinî ya. Ji vê yekê, mirov dikarê gav biavêje û vê yekê jî bibêje ku weke ku ew mirovên ku bivî rengî diaxifin, ne li ser tîrkerîya gotinan re diaxifin, weke ku li ser kirdeya ya gotinê re bi herîkî diaxifin dikin. Her wusa rewşeka bi vî rengî ya bizimanî bi wan re xwe bi awayekî vekirî dide li der. Têgîna ziman, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku bi van aliyên xwe yên ku me hanîna ser ziman re, têgîna serdestbûna li ziman dide nîşandin. Zimanê kurdî, ku van waran de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke aliyekî girîng ê ku divê ku mirov li ser wê bisekinê ya. Her wusa, emê li vir, hinekî dî jî bi vir ve girêdayî li ser wê di nava ziman de çêkirina gotinan li wê bihizirin. Serdema me ya aqil ku bi aqil pêş dikeve, her wusa vê yekê weke pêwîstîyekê ji me dixwezê. Ji ber ku ev teybetî, weke teybetîyaka ku dayimî ziman bi zanîna xwe re ya di nava xwe de bi awayekî livandinî ku hertimî xwe diafirêna ya.

Li vir, têgîna tawandina gotinê û her wusa ya çêkerîya bi gotinî ku em wê li vir bi jîrîya ziman re li ser gotinên hevgerî ku dihên afirandin re ku dihênina ser ziman, bi wan re em vê yekê bi awayekî vekirî kifş dikin ku weke li ser kirdeya gotinê re meşîna bi aqil û hwd mirov wê kifş dike. Ne

li ser gotinan re, lê li ser kirdeyê re meşîn û li gotinê nerîn, wê temenê vê afrînerîya jîrî a bi gotinê re bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku gotin, awayekî têrkerî ku em wê bi rengê gotinî ku dibînin, ew tenê weke awayekî hatina hanîna li ser ziman a wê ya.

Gotinên aqil, li vir, divê ku mirov wê yekê bi wan re werênina ser ziman ku weke aliyekî giring a. Li vir, divê ku hinekî din jî, bi wê aliyê re pêde herim û werênima ser ziman. Her wusa rastîya afrînerî a ziman ku di dema aqil de xwe bi afirandina bi aqil re ku pêş dixê, di vê çerçoveyê de bi hanîna wê ya li ser ziman re fahmkirina wê dibe. Ya ku ziman dike herikbar û afrîner jî, wê ev teybetîya wê bê. Î ro, em vê yekê bi zimanê kurdî re hê di serdemên buhurî ên gûtî, hûrî û mîtannîyan û hwd de kifş dikin. Her wusa, em divê ku vê yekê werênina ser ziman ku ev diçê ta berî wan jî. Minaq, weke ku me hinekî li jor jî hanî ser ziman, gotina 'ga, ku navê sawalaka 'gir' a, wê bi rengê şibandina bi wê re gotina wê were afirandin. Gotina "girgamêş", her wusa di vê çerçoveyê de weke gotinaka ku em dikarin, bi heman afrînerîya zimanî ku werênina ser ziman. Ev rengên gotinê, her wusa, di nava ziman de dihên afirandin. Dema ku mirov li vê yekê dihizirê, her wusa, di çerçoveya zanîna ziman de, têtîna ku bi mirov re diafirê, ew a ku ziman di nava xwe de xwediyê wê têtîna bi hevdû ve girêdan û afirandinê ya. Aliyê ziman ê girêdanê, weke aliyekî giring ê ku divê ku mirov li ser wê bisekinê û wê werêne ser ziman a. Li vir, divê ku mirov vê yekê, di vê çerçoveyê de biteybetî li ser wê bisekinê.

Fahmkirina bi gotinan re, wê her wusa temenê girêdana gotinên wê ên bi hevdû re jî di mejî de bi afirêne. Fahmkirina gotinan, temenê wê bi kirdeya gotinî re dihê dîtin. Her wusa, rengê girêdana gotinan jî, dide nîşandin ku gotin, xwediyê têtîneka bi wê salixkirîya ya.

Girêdana di nava gotinan de wê ziman, bi rengê pêşketina wê re bide dîyarkirin. Herwusa, li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku têtîlîyên gotinan ku bi hevdû re bigirêdanî dihên çêkin, wê li ser wê wate û ankû kirdeya gotinê re bin. Ev jî, wê bi awayekî têtînî a nirxî bê. Bi kîjan gotinê re kîjan gotin hat girêdan, wê regekî zêhnî ê aqilî ê bi ziman re bide nîşandin. Her wusa, girêdan, naqşaya ziman a bizêhnê û hwd dide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de jî divê ku mirov wê werêne ser ziman.

Fahmkirina gotina, di vê çerçoveyê de giring a. Bi hevdû ve girêdana gotinan, wê li ser wate û levkirina wê re wê xwe bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de wate û girêdana wê, wê bi wê ahenga ku bi wê re diafirê re

wê temenê girêdana bi hevdû re bi afirêne. Her wusa, li vir, ew girêdan bi têtîn û zanîna zimanê a kirdeyî û wateyî ya. Li ser wê re ev yek dihên û dibin. Girêdan gotinan a bi hevdû ve, her wusa mirov dikarê weke girêdana aqilan a bi hevdû ve jî şîrove bike û werêne ser ziman. Bi hevdû ve girêdan, wê naqşaya zêhnê a aqil jî bide afirandin. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku aqil, weke renekî ku êdî bi wê li jîyanê dihê nerîn a. Di vê çerçoveyê de bi hevdû ve girêdanê re salixkirina wê, wê çerçoveya jîyane a bi gotinan salixkirinê werêne li holê. Lê ev girêdana bi rewşê û ankû bi aqil ku dihê û dibê, wê zêhnekî wê hebe. Ev jî, weke aliyekî din ê ku divê ku mirov bîaqil re fahm bike û werêne ser ziman bê. Ev jî, wê bi ziman û li ser wê afirandina girêdanê a bi hevdû ve û hwd, bi wê re bibe. Têtîna gotinên hevgerî, ku me li jor hinekî hanî ser ziman, tiştêkî dide nîşandin, Ew jî, ew a ku êdî mejî dibîne, kifş dike û bi wê re dixwezê ku salix bike.. Li ser wê re li rewş û gotinên wê digerihe. Hewldana bi zanîna ziman re di çerçoveya afrîneriyekê de pêşxistina gotinên hevgerî, her wusa weke aliyekê jîrî a bi zanîna ziman re ku divê ku mirov werêne ser ziman, wê di ancama vê pêşketina bi têtîna de bê.

Di nava têtîna ziman de aliyê ku em li vir li ser wê disekin, bi teybetî fahmkirina bi têtîna a bingîhînê. Aliyê teknîkî ê rêzimanî, temenê wê yê bi aqilî ku em li vir bi zanîna ziman re hewl didin ku fahm bikin, weke aliyekî giringtir dibe ku mirov wê fahm bike. Her wusa, li vir, di vê çerçoveyê de aliyê rêzimanî ê zimanî, weke aliyekî ku li gorî xosletên ziman bi hevdû re di çerçoveya hûnandina gotinê re dihê kirin a. Li ser gotinê re, dîsa em herin û her wusa hewl bidin ku di çerçoveya mijare me de wê fahm bikin. Li vir, bi teybetî, têtîna zanîna a hîmî, di serî de divê ku mirov weke têtîneka çerçoveyî wê fahm bike. Piştî, ew aliyên din, wê li ser wê re werina ser ziman.

Li vir, di serî de divê ku mirov vê yekê her wusa werêne ser ziman ku gotin, bi teybetî, wê di fahmkirinê de giringîya wê her wusa weke aliyekî têtîna ê giring bê. me li jor, hinekî li ser hinek kokan re bahsê kir. Li vir, divê ku mirov hinekî din jî, bi felsefeya ziman re wê fahm bikin. Gotin, rengê salixkirî ê têtîna ya. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov li gotinê dihizirê, her wusa, weke aliyekî giring ê ku mirov divê ku li ser wê bisekinê ya.

Têtîna gotinan û her wusa rêzkirina wan li hevdû, di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku wê di çerçoveya têtîna li hevdû kirinê

de wê werina ba hevdû. Li vir, di serî de rengê gotinê di nava ziman de, her wusa bi têngîna zanîna zimanî wê xwe bi afirêne. Her wusa, di kurdî de di çerçoveya penî û nepenî de bi sereka mirov dikarê werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de bi aliyê navî ê penî, ew a ku nav di kifşîya wê de zelal a. Her wusa, hat gotin ku "zelal, li malê rûniştîya û dixwêne." wê hingî di çerçoveya zelalîya ku 'zelal' li malê rûniştîya û dixwênê de wê zelalîya wê were dîtî û kifşkirin. Lê dema ku di çerçoveya 'nepeniyê' de were gotin, wê hingî bêgotin ku "ew, li malê rûniştîya û dixwêne." Lê 'ew' kî ya, ew ne zelal û ne dîyar a. Di vê çerçoveyê de bi heman rengî di çerçoveya zayendetîyê de mirov dikarê bahsê bike. Di kurdî de weke teybetîyeka wê ya bi serê xwe, ew a ku gotinên ku aliyê zayendan didina dîyarkirin, bi serê xwe dide kifşkirin. Mînaq, "mê" weke gotinaka ku aliyê mê dide dîyarkirin. Di vê gotinê de çerçoveya wê de jin, mê ya. Di jîyanê de hemû sawal û nirxên vê aliyê zayendê mirov dikarê bi gotina 'mê' werênê ser ziman. Bi heman rengî, beremberê wê, aliyê din ê zayendê ku weke aliyê mêr dihê dîtî û dîyarkirin jî, bi gotina 'nêr' dihê dîtî û ser ziman. 'Nêr', wê di çerçoveya zanîna zimanî de wê vajî ya 'mê' bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê werê ser ziman. Di çerçoveya aliyê 'nêr' de mînaq, navên weke 'mêr', 'kur', 'ap', 'zilam', 'azad', 'baran', 'ga', 'nêrî' û hwd in. Her wusa, vajî wê aliyê 'mê' jî mirov dikarê di vê çerçoveyê de bi van gotinan bi serekek werêne ser ziman. Mînaq; 'jin', 'keç', 'metik', 'zîn', 'pîrek', 'meh', 'çêlek', 'bizin', 'mirîşk' û hwd in. Her wusa, di jîyanê de di çerçoveya dûalîteyekê de her zindî, yan 'nêr' a û yan jî 'mê' ya.

Her wusa, weke daçekên sereke ên kurdî ku 'bi', 'ji', 'di', 'li' û hwd in, di vê çerçoveyê de girêdana gotinê werê kirin. Bi wê re jî, hokerên zimanî ên demkî 'î ro', 'siba', 'zû', dereng' û hwd in. Hokerên cihî jî weke vir, wir, jêr, jor, evraz, nişîv û hwd in. Hokerên awayî jî, lez, hêdîka, zûka, bi asani û hwd in. Di vê çerçoveyê de bi gotina 'rengdêrê' re weke 'gelek', 'sor', 'zêde' û hwd, dihên kifşkirin. Bi wê 'ya navbeynê' 'û' re jî, her wusa di vê çerçoveyê de ev girêdan dihên dîtî. Ev rewş, wê rengna têngînî bidina me. Rengê avakirina gotinê her wusa di çerçoveya girêdana wê ya ku me li jor hinekî li ser sekinî, bide fahm bikin. Emê bi aliyê teknikî ve hemû rêzimanîyê li vir, li dûv hevdû rêz nekin. Bo fahmkirinê hinekî di çerçoveya mijara xwe de emê werênina ser ziman. Her wusa bo fahm bikirinê. Gotinên kurdî, bi rengdêr, navdêr, hoker, çînavk, daçek, pêşbank, paşbankan û hwd re dihên ava kirin. Di vê çerçoveyê de, di nava zanîna

ziman de, wê gotin werina afirandin. Li vir, êdî avakirina hevokê bi herênî û ankû ne herênî wê bê kirin. Li vir, di serî de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku têngîna zimanî weke aliyekî giring ê bizanîna wê re ya. Li vir, ya ku van destûrên ziman û ankû ên din jî dide nîşandin, rengê têngî û zanîna wê ya ku bi wê re pêşketîya. Di vê çerçoveyê de mirov li ser wê bisekinê û wê werêne ser ziman. Li jor, weke ku me bi gotina gotinên hevgirtî re hanî ser ziman, rengê pêşketina gotinan, xwe çawa dide afirandin, mirov wê êdî bi pêşketina ziman re wê kifş dike. .

Em li vir, divê ku vê yekê jî balê bikişênina li ser. Ev divîyabû ku me hinekî li jortir bi hanîya ser ziman. Lê emê li vir, werênina ser ziman. Car bi car, dema ku lêkolîn li ser ziman zimanê kurdî dihên kirin, gelek gotinên bo rewşekê derdikevina li holê. Her wusa, minaq, bo kokê, 'ra', a. Lê herême ya botanê rengê 'reh' jî tê ser ziman. Ev rewşên ku weke ji hevdû cuda di gelek warên din ên gotinî de jî, mirov dikarê kifş bike û werêne ser ziman. Li vir, di serî de, li ser vê rewşê bi mijara me ve girêdayî, divê ku em çend gotinan jî bibêjin. Sedema zêdebûna gotina, bi sê sedeman re mirov dikarê werêne ser ziman. Yek, bi dirêjîya temenê ziman ve girêdayî mirov dikarê werêne ser ziman. Ya din a duyemin jî, her wusa, gotinên hatina hevgirtin(sentezkirin) hena. Ya sêyemin jî, ew a ku hinek gotin, ji bilî wateyên ku berê biwan dihatina bikarhanîn, hatina salixkirin. Her wusa, ev jî, bi lêkolînên zimanî û kifşkirina serdemên ziman û di kîjan serdemê de çi gotin hatina bikarhanîn bi kifşkirina wan re, mijaraka ku wê werê çareser kirin a. Ên ku vê rewşê, weke rewşeka asteng li pêşîya zimanekî û pêşketina wê dibînin jî, vê gotinê ji nezanîya xwe ya di derberê ziman de dibêjin.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, werêne ser ziman ku heta roja me, li ser zanîn wate û kirdeyê di gotinan de ti lêkolînên mazin ên li berçav ne hatina kirin. Lê ku ev were kirin jî, wê bê dîtin ku ev rewş hemû, di çerçoveyekê de wê werina çareser kirin Her wusa, civateka ku hatî bişavtin û nikarê zimanê xwe bikarbêne, wê çawa andamên wê karibin wê kifş bikin, gotinên zimanê wê zêde na.? Ji xwe, aqilekî ku di ziman de gotinê zêde bibîne, di serî de wî aqilî nezanîya xwe denezendîya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê, kifş bike û werêne ser ziman ku her gotin, bi rewşekê û tênginekê ya. Her wusa, gotinên ku hatina ser ziman, di serî de gelek wateyên wan esasî ku hena, ji wan dûr hatina salixkirin. Ev jî, bi gotina, ne pirsgirêka gotinan, lê pirsgirêka bi watekirina li gorî rewşa

wê ya rast a. Li vir, dema ku em vê gotinê dibêjin, em li gorî pêşketinên zimanê ên serdemên berê dibêjin. Ne rewşên ku nû hatina afirandin, her wusa rewşên ku berê hatina kifşkirin, heta roja me jî, rewşa zimanê kurdî jî wê ne buhurî ya. Ev jî, ji ber nebûna perwerdeya wê ya bi zimanê wê ya.

Ez li vir, vê yekê jî, werênima ser ziman ku ziman, weke aliyê wê yê ku me li jor hanî ser ziman ê gotinên hevgerî û ankû sentezkirî, awa û pêvajoyên pêşketina aqil bi wê re dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov li wê zêdebûna gotinan binerê. Her wusa, pêşketinên biaqilî ku bûna, bi salixkirina wan re ew gotin afirî na. Li ser wê re jî, êdî hatina ser ziman. Li vir, em vê yekê jî, werênina ser ziman ku bi dengdêrî ku gelek gotinên ku dihên kifşkirin û dihên nivîsandin û ser ziman, gotinên ku di çerçoveya vê têgîna zanîna ziman a tawandin û çêkerîya gotinî a bi gotinên hevgerî de ku hatina afirandin in. Dengên nû, ku bi rêya şibandîne bê û ankû bi rengên din bin ku hatina salixkirin weke gotinan, rengê wê zêdebûnê dihêne ser ziman. Gotina, 'ra' ku weke navê kokê ya, her wusa, ku ji wê were derhanîn 'reh' û were bikarhanîn, em wê nebê gotinaka nû. Ev wê bê, gotinaka ku hatî derhanîn û ku di wê mêylê de ya ku rewşeka nû bi xwe re salix bike û bixwe re werêne ser ziman û ankû xwe ji wê re bike nav. Ev jî, weke renekî afirandina di nava ziman de ya. Her wusa, teybetmendiya zimanê kurdî jî yek ji wê jî ew a ku di afirêne ya. Di vê çerçoveyê de bi demê re hin bi hin diafirêne. Her wusa, ez dikarim bêjim ku pirranîya ku gotinên ku ez bi awayekê û renekî bi kardihênim ku yekî din ku serwerîya wî li zimên hebe, wê bi rengna din ji wan bi şibandîne bê û her wusa bi awayna din bê, wê gotinna derxe li holê. Her wusa, ev ji wê rewşa afirandina bi hilberên a bi zanîna ziman re ya. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov li wê binerê. Zimanê kurdî, pîr zêde xwediyê afirandinekê ya. Lê li gorî wê afirandinê bi rêk û pêk û baş hanîna li ser ziman nabê. Ji vê aliyê ve jî, divê ku mirov li wan gotinan binerê. Her gotin, çend ku di roja me de dihê gotin "di heman wateyê de ya" jî, lê ku bi têgînê û zanînkana ziman a hinekî kûr lê were nerîn, wê ew gotin jî bi wateyên wan ên teybet re werina kifşkirin. Di serî de di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku her wusa, ne pîrsgirêka zêdebûna gotinan a, lê pîrsgirêka fahmkirinê di serî de ya. Çerçoveya têgînî a zimanî, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, di vê çerçoveyê de mirov hin bi hin bersivên ji van rewşên ku divê ku werina bersivandin re dibînet. Li wê

zêdebûna gotina, di çerçoveya têtîna zanîna ziman a hilberîner û afirîner de divê ku mirov li wê binerê.

Em di vê çerçoveyê de li ser temenê bikarhanîna ser ziman û bi wê re hilberîna wê ya bi têtîni bisekin in. Ev li vir, wê weke aliyekî giring bê. Emê vê jî, li ser hîmê gotinên hevgirtî ku me li jor bahse wan kir, li ser afirandina wan re werênina ser ziman. Ev, weke aliyekî ziman ê afrîner a. Ev aliyê ziman, dide nîşandin ku di pêvajoya pêdeçûna pêşketina bi civatê û di nava jîyanê de êdî ziman bi pêşveçûnên bi aqil re û bi xwe re pêşketinê dide çêkirin li gorî demê û pêşketinê û asta demê. Ya ku mirov li vir, bi vê rengê pêşketinê re kifş dike di serî de ev a. Teybetmendîya sereka li vir ku em di vê çerçoveya mijara xwe de bi fahmkirina ziman re werênina ser ziman tawandin û her wusa hevgirtin a. Di her zimanî de bi awayekî tawandin heya. Minaq, tawandinên li ser pêvekên gotinan re ku dihên kirin hena. Minaq; weke ku koka wê "kir" bê, bahse "kirina tiştêkî dike, ku li dawîya wê "...îya" hat bicihkirin, wê bê "kirîya". Ev rengê li ser rêzimanî re ê tawandinê, weke renekî gotinê ê li ser rêziman re ya. Her wusa, ev pêvekên weke "...îya" û hwd, em di dema hûrî û mîtanîyan de jî rastî wê tên. Di wê demê de jî, li ser van re tawandin hatina kirin. "Pêvekên tawandinê ên ku li dawîya gotinê dihên danîn, ên weke "...îya", "nna", "...îtannî", "...îlannî", "...îstanî", "...îsta". "î", "ê", "na", "nn", "mn", "ana", "iya", "ama", "lla" û hwd, in. Her wusa, weke van dawikan gelek dawikên ku em dikarin ji van deman ji zimanê van deman kifş bikin hena. Ev jî, her wusa, di vê çerçoveyê de bi wan dihê nîşandin. Minaq, dema ku min got "kurdî", ew "îya" ku li dawîya wê hat danîn wê "aîdîyetê û ankû yawêtîyê bide nîşandin. Ev dawikên ku me hanîn ser ziman, di roja me de jî di kurdî weke xwe dihên bikarhanîn. Ev rengên gotinê û afirandina wê, her wusa, tiştêkî bi me dide nîşandin, ew jî, ew a ku ev rengê pêşketina bi ziman re weke renekî bi aqilî û jîrîya. Di nava zanîna ziman de bikarhanîna aqil û bi wê re afirandina bi ziman re pêşketîya. Hinekî jî, weke pêvajoyên destpêka pêşketina serdemên hemdem, her wusa di vê çerçoveyê wê bi aqilî xwe bidina nîşandin.

Li vir, em hinekî, bi çend gotinan jî, li ser hemwateyîya gotinan bisekin in. Ev jî, bi serê xwe weke mijaraka ku pêwîstî bi fahmkirina wê heya. Ti gotin, di aslê xwe de em nikarin bitememî bahse hemwateyîyê bi wê re û bi gotina din ya ku were cem wê weke ya beremberê re werênina ser ziman. Minaq, di kurdîya roja me de

”dagirt” ku bahse tişteki ku hatî ‘tişî’ av û ankû tişteki din weke wê hatîya kirin dike. Lê bi hemwateyî, her wusa gotina ”tişî” jî dihê hanîn ser ziman. Gotina ‘tişî’, weke gotinaka ku di kurdî de dîroka wê heta serdema hûrî û mîtannîyan diçê ya. Di dema hûrîyan de bi rengê ”tişsan” dihê dîtin a. Her wusa, koka gotina ”tişsan”, ‘tişî’ ya. Ew herdû tîpên dawîyên ên weke ‘..an’ jî, bi awayekî rengê ‘zêdebûna’ wê tişîbûnê û ankû gelek tiştên ku hatina tişîkirin û hwd dike. Di vê çerçoveyê de, weke pêvekên alikar in. Lê li vir, di vê rewşê de, em bo kurdî rewşek din jî, werênina ser ziman, Çend ku her wusa, bo pirranîtîyê danîn nîşandinê pêwîstî bi pêvekên zêde û ankû gelek nîşandinê hebe jî, di hinek rewşna de ev yek pêwîstî bi wan nabê. Minaq, dema ku min got ‘her kes’, ez di gotina ‘her kes’ de bahse gelek kesan dikim. Li vir, dema ku min gotiba ‘her kesan’, wê ne xelat ba. Lê wê ji aliyê rêzimanîya wê ve jî, lê ne hatiba. Ev jî, divê ku mirov wê werêne ser ziman. Di çerçoveya rewşê de ev xwe dide dîyarkirin. Her wusa di vê çerçoveyê de bo gotinê, pêvekên weke ‘daçek, lêker, rengdêr, dengdêr, hoker, navdêr û hwd, bo avakirin û bi navkirina rewşê û li gorî wê tawandinê bi gotinê re bide kirin in. Ev, weke aliyekî zimanî ku li ser rêzimanîyê re, hema bêja ti dikarê bêje ku tê di her zimanê re rastî wê were bê. Ji xwe, ji van aliyan ve wê her ziman, xwe li gorî rewşan bi tawandin û rengdayînkirinê û hwd re, biafirîne. Her wusa, divê çerçoveyê de têgîna zimanî, bi vê rengê ziman bi rewşê re dihêne astaka ku dikarê xwe werêne ser ziman. Ev aliyên teknikî, hinek aliyên zimanî ên ku dihên bikarhanîn in. Li vir, ev rengê tawandinê bi hinek awayna zêdetir jî di kurdî de heya. Gelek awayên wê, heta roja me, hê ji xwe ne hatina kifşîkirin û bikarhanîn jî. Minaq, em vê yekê bibêjin, bi vê rengê rêzimanî û her wusa ji gotinên kokî derhanîna gotinan û bi wê re zêdekirin dihê kirin. Lê li vir, hem ew gotinên kokî û hem her gotina ku hat derhan(aafirandin), wê bi gelek rengên ku weke ku me li jor hanî ser ziman, rengê tawandinê ”li ser giştîya gotinê” re weke ku bi ‘ziman’ re bi rengê ”zimên” û hwd ku were derhanîn û hwd, wê bê çêkirin. Ev jî, weke dîmenê dûyemin ê zimanê kurdî ku tenê em di vê zimanê de ku hata nûha pêşketîya rastî wê tên a.

Ev rengê tawandinê, her wusa, dikarê were pêşxistin. Lê ev bidemê re gelek pêvajoyên pêşketinê buhurîna wan ji temen ve divêt. Di vê çerçoveyê de dema ku em bahse afrînerîya zanîna zimanî û hilberandina wê ya biçêkerî weke bi gotinên hevgrîtî û hwd re bikin, her wusa di vê

çerçoveyê de divê ku mirov bahse wê bike. Têgîna ziman, li vir, weke aliyekî giring ê ku divê ku mirov wê biteybetî û baş bixwêne û werêne ser ziman. Fahmkirina zanîna ziman, di temenê pêşketina wê ya dijîyanê de jî ya.

Bi demê re pêşketina bi aqil, her wusa weke aliyekî ku zorê dide vê pêşketina a bi demê re jî. Her wusa, dema ku em rewşa çêkerîya hîm û bingihînî a bi afirandina gotinên hevgerî re li berçav digrin, her wusa di vê çerçoveyê de mirov fahm dike ku çendî ev weke rastiyekê ya.

Li vir, em dema ku bahse tawandina gotinê dikin, weke ku me di paragrafa li ser vê de bi aliyê rêzimanî û teknikî hanî ser ziman, ew aliyek a. Lê aliyê duyemin ê weke 'zimanê duyemin ê dîmen' jî, her wusa bi rengê 'afirandina ji 'ziman' ku 'zimên' û hwd re xwe dide dîyarkirin. Li vir, em vê rewşê jî, werênina ser ziman ku gotinên ku di kurdî de bi rengê 'xêr', 'mêr', 'çêr', 'fêr' û hwd jî, bi heman rengî tawandina ya li ser bi rengên din de dibê. Minaq, navê 'mar' ku weke navê ajalekî bi zahr û pêvedide ya. Lê dema ku weke 'mar' tê nivîsandin, di nava gotinê de li gorî rewşê dikarê di heman wateyê de bi rengê 'mêr' jî werê nivîsandin. Wek me li jor hanî ser ziman 'mêr', navê zayendekê ya. Her wusa, divê çerçoveyê de bûna weke hevdû ya van gotinan, wê wê wateyîya wan ya cuda ji wê nede winda kirin. Di vê çerçoveyê de, weke hevdû heman gotin ku dikarê bibe navê du tiştan, wê bi rengê bia wayekî din were ser ziman. Minaq, "kêr", ku navê tişteke tûj ku bi wê tişt tên birrîn a. Lê dema ku bi rengê tawandinê, dikarê bibe navê sawalaka bi navê 'ker'ê jî. Her wusa, di vê çerçoveyê de wê heman destûra tawandina dîmena zimanê duyemîn a zimên wê buhurîner bê.

Ev rewşa tawandinê a duyemin ku weke 'dîmenê duyemin' jî xwe bi 'zimên' re dide nîşandin, wê weke rewşeka teybet a ziman bê. Her wusa, li vir, em vê yekê dibînin ku li ser vê rewşa tawandina teybet a zimên re wê dûalîteyek xwe bide dîyarkirin. Weke ku mirov xwediyê du-zimanan bê, wê li mirov werê. Her wusa, di vê çerçoveyê de, mirov vê rewş, weke rewşek teybet a ziman kifş dike. Bi dîrokê re, her wusa, ev herdû rewşên zimanê di nava hevdû de hatina bikarhanîn. Lê li ser wan re dahûrîyek kûr bo fahmkirinê ku dihê kirin, her wusa, sînorê ziman jî di çerçoveya têgînek dû-zimanî de berfirehtir dike. Ev rengê tawandina teybet a li ser gotinan re, her wusa her gotinê, weke ku xwediyê gotinaka din bi gîyanî bê dibe. Di vê çerçoveyê de, yek dibê du. Ev, bi awayekî êdî xwe dide zêdetir kirin.

Em vê rewşê, her wusa weke rewşeka teybet ya pêşketinê dibînin. Divê çerçoveyê de, salixkirina gotina pêşî bi rewşê re û li ser zanîna ziman re dihê kirin. Lê dîmenê duyemin ku xwe weke ji wê dide li der jî, temenê salixkirinek nû ya bi gotinê ku wê dide dîyarkirin û didêne li holê li ber mirov. Di vê çerçoveyê de têngîna gotinê, dema ku mirov li ser wê bi hizirkirin û dahûrkirinê re hûr û kûr dihizirê û hewl dide ku fahm bike, di vê çerçoveyê de mirov rastî rewşa wê ya teybet tê. Di vê çerçoveyê de her gotina ku hatî salixkirin, weke têrkerîyeka ku hatî bi dîmenkirin, dihê li berçav. Divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku weke 'rewşeka zelal' ya li berçav, mirov wê kifş dike. Di vê çerçoveyê de rengê gotinê, her wusa giring a ku mirov vê yekê fahm bike. Li ser wê re jî, êdî gotin, li ser koka xwe ya ku bi wê re xwediyê têkiliya afrîner a bi derve bi gotinên din re ya. Lê li vir, her wusa ew têkilîya rewşî ku dihê û dibe jî, divê ku mirov werêne ser ziman, weke teherekê xwe bi girêdana zimanê re weke rewşek teybet dide dîyarkirin. Rewşa ziman, di vê çerçoveyê de dema ku mirov li ser wê rewşa tawandina gotinê û bi wê re ew afrînerîya ku di ancama wê de dibe ku mirov li wê dihizirê, her wusa di vê çerçoveyê de weke rewş û renekî din ê pêşxistinê jî mirov bi wê re rast tê. Ev jî, weke aliyekî din ê zimanê ya ku mirov divê ku wê werêne ser ziman.

Em li vir, divê ku li ser rengê tawandina giştî a du-dîmenê hinekî din jî bisekin. Lê li vir, bo fahmkirina wê rengê tawandinê, weyn û rola tîpa 'ê' jî divê ku ji bîrnekê û bi teybetî li ser wê bisekinê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman, ev tîpa 'ê', xwediyê weyneka mazin a. Her wusa, di vê çerçoveyê de dema ku mirov li vê rewşa tawandinê dihizirê, mirov vê tîpa 'ê', weke aliyekî hîmî ên bingîhînê jî dibîne. Di kurdî de kitayên gotinê ên weke yên girêdanê pîrr zêde na. Hinek ji wan bi sereka ev in. Minaq, kitayên girêdanê 'û', 'jê', 'a', 'ya', 'ji', 'ku', 'di', 'de', 'bi' û hwd, in. Her wusa, bi van re mirov dikarê gelek ji wan werêne ser ziman. Her wusa, dema ku mirov di nava wan de jî, weke ên giring, her wusa 'û' û 'kû' ya. Ev herdû kitayên gotinê, her wusa, xwediyê giringîyeka mazin ya girêdanê û hîmî na di vê rewşa zimanê de. Di çerçoveya pêşketina zimanê zanînê de her wusa giringîya girêdanê jî xwe biawayekî xweza li ser pêşketina ziman re dide dîyarkirin. Her wusa, di vê çerçoveyê de ev jî, êdî hin bi hin dîyar dibin. "Û", weke navbeynka gotinan a giring a. Her wusa ew dengê ku ew derdixe jî, li vir, dema ku mirov li wê dihizirê, bi teneserê xwe hin wateyên weke kirdeya nîşandina jî di xwe de divêşêrê.

Her wusa, bi awayekî nîşankirina li berçav, ku bide nîşandin jî, weke ku di xwe de dihêne ser ziman. Her wusa, li vir, me bahse tîpên ku weynê di ziman de dileyizin kir. Em li vir, ji vir dewam bikin û weyna tîpên ku bi demê re pêşketinaka mazin bi xwe re dane kirin û bûna xwediyê wateyên bi serê xwe, em divê ku bahse wan bikin. Minaq, di kurdîya berê de tîpa 'a', her wusa, dema ku em bahse bikin, bi gelek wateyan mirov dikarê bahse wê bike. Di serî de weke manaya 'herê!', "herêkirin", bi têkilîyê nîşandin û derxistina dengê tîpa 'a' re nîşandin û hwd, wê çend ji wan wateyên ku bi wê xwe didina dîyarkirin bin. Her wusa li ser tîpa 'a' re mirov dikarê gelek wateyên ku hatina kifşkirin, werêne ser ziman. Heta roja me jî, li herêma botanê, dema ku weke bersivdayînê ku mirovan dixwestin ku bêjin 'herê!' bi dengêkî stûr û hinekî dirêj digotin 'a!' û hwd. 'A', weke tîpeka bi zanîni di xwe de pêvajoyîna pêşketinê ku li ser zimên re ku bi xwe re bûhurandîya ya. Her wusa di vê çerçoveyê de divê ku mirov bahse wê bike û werêne ser ziman.

Tîpa 'a', weke gotinekê kar kirîya û dengê xwe pêşxistîya. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov hinekî kûr û dirêj li ser tîpa a bisekinê. Weyna tîpa 'a', ji ya 'ê'ya kurdî ne kêmtir û piçûktira. Her wusa, 'ê', zimên dike ku bigihijêne dîmenekî din ê wê yê zimanî. Her wusa, di vê çerçoveyê de tîpa 'ê', weke tîpaka hîmî û ku ji bo ziman ji karê û erka tîpî zêdetirî bûya xwediyê weyn û rolê. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê werêne ser ziman.

Tîpa 'ê', bi dengê xwe yê ku derdixe re her wusa weke aliyekî teybet ê ziman a. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku ev tîp, bi demê re wê li ser tîpên din ên ku hena re jî, dengna cuda ên ku rengê xwe de lê ku di awayê wan tîpan de wê pêş bixe. Divê çerçoveyê de tîpa 'ê', çend ku dibê tawandina 'a'ê her wusa, bi heman rengî, weke awayekî xweyê teybet weke tîpek serbixwe pêşketîya û pêvajoyên pêşketinê jîya na. Tîpa 'ê', bi dengê wê re her wusa bi awaye yê pêşketî û afirandiniyên ku kirina, karakter û rewşa zimên jî bi xwe re bi ber aliyê zanîni e dide guharandin. Her wusa weynea wê ya teybet heya. Em vê tîpê, bi gelek cûreyên wê di dema hûrî û mîtannîyan de dibînin ku dihê bikarhanîn. Her wusa, dema ku em dengên van serdeman dahûr dikin û hewl didin ku fahm bikin, di vê çerçoveyê de em rastî pêşketinên wê tên. Li vir, vê yekê cardin binxatkin û bibêjin ku tîpa 'ê', wê zimên bi ber zanîntîyê de biherikênê. Her wusa, rengê pêşketinê ê ziman ku bi têngîna girêdanan re xwe dide li

dest, her wusa ev dengê bê tîpa 'ê', ji hin aliyna ve wê hîm bi afirêne. Her wusa tawandin û dondirandina gotinan, wê bi wê re we bide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de weke tîpa 'ê', weke tîpeka zanînî, hişî û hwd a. Bêhna zanînê ji rengê wê tê. Her wusa, di vê çerçoveyê de divê ku mirov wê werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku weke hîmekî hizirînî a bi aqilî, wê ji vê rewşê xwe bide li der. Em di vê çerçoveyê de dikarin werênina ser ziman ku tîpa 'ê', weke tîpeka zanîstî û ya dema zanîstê ku pêşdive ya di ziman de. Em li vir, divê ku bi awayekî giring hebûna tîpa 'ê' di nava ziman de werênina ser ziman. Ev wê aliyekî pêşketina dû-dîmenîtî a gotinên zimên jî bi xwe re werêne li holê û bide dîyarkirin.

Tîpa 'ê', dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, weke aliyekî ku mirov divê ku wê bi awayê wê yê pêşketî di zimên de kifş bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de gotinên ku bi tawandinê bê ku bi 'ê' tên nivîsandin û ên ku bi awayekê xwe afirandî ku bi xweza ku bi tîpa 'ê', tên nivîsandin, her wusa, dema ku mirov li wan dinerê, mirov vê rewş bi awayekî vekirî bi wan re di çerçoveya pêvajoyên pêşketina aqil û ên tîpa 'ê' de kifş dike. Dengê 'ê', dengekî ku bi zanînî xwe dide dîde dîyarkirin a. Her wusa, weke tîpeka k u gelek keda wê ji pêşketina girêdan, afirandin û tawandina gotinan re heya.

Pêvajoyên pêşketina ziman, her wusa, bi pêşketina aqil de wê di rewşa dengên tîpan de jî hin bi hin li ser wê hişariyê re ku bi şibandîne bê û ankû întibaya ku diafirê û hwd bê, wê gûharînan hin bi hin de çêkîrin. Di vê çerçoveyê de bi aqil re, hertimî di demê de wê li ya têr, li gorê wê, hevgerî, levkîrî, û hwd werê lêgerîn. Ev rengên pêşketinê wê di nava tîkilîyên zimanî de jî, êdî hin bi hin bi demê re bi çerçoveya wê pêşketina aqil û hizirkirinê re wê vaca xwe ya zimanî a di jîyanê de ku li gorî wê pêş dikeve biafirêne.

Em divê ku vê yekê, her wusa bi teybetî werênina ser ziman, dengên weke 'î', 'ê', 'ä', 'û', 'ş', û hwd, wê hinek ji wan dengên bi tîpîkirî ên ku em li vir bahse wan bikin bin. Divê çerçoveyê de dengên tîpî ên teybet li vir ku em bahse wan bikin, wê her wusa, xwediyê vê giirngîyê bin. Di çerçoveya zimên de ku weke çerçoveya tîpî a temenê wê dîmenîya duyemînî a bi tawandinê a ziman diafirênin her wusa bi tîpên weke 'x', 'w', 'q', 'î', 'ê', 'ä', 'û', 'ş', û hwd, in. Hinek dengên din ên ku di vê çerçoveya van dengên hatina konsantrakirin de ku mirov

bi konsantra bike li ser tîpên din re jî hena. Ji xwe, her tîp, di vê çerçoveyê de weke ku xwediyê du-dengî bê ku di wê de hatîya konsantra kirin a. Ev den bi ber hevdû ve herîkîna wan dibê. Minaq, dema ku em dengê 'û' lê dinerin, weke ku bi ber 'au' û ankû 'eu' dîtina wê, wê werê dîtîn. Mîtannîyan wê di vê çerçoveyê de di axiftinên xwe de ji ber vê yekê ya ku li cihê 'û''yê bikardihênin dengê bi kitaya 'wa' re û hwd, bikar dihênin. Divê çerçoveyê de konsantrabûna wan heya. Her wusa, dengên ku ew derdixin jî, weke ya kurdên botanê, ji qiriqê û hinekî stûr a. Dengê 'a', stûr û dirêj dikin. ..

Em dema ku her wusa li rewşa konsantraya dengan dinerin, em di vê çerçoveyê de rastî rewşekê tîpên. Her wusa, heta ku dem bi ber dema me ve hatîya bi guharînan bê û ankû bi herîkînan û hwd, bê, hinekî di dengan de tenikbûn û zirevbûn bûya. Ev jî, weke aliyekî ku hin bi hin li ser pêşketina aqil re bûya. Çend ku pêşketina aqil zêdetir bûya, pêwîstî bi dengên zêde ku werina bikarhanîna hatîya dîtîn, her wusa di vê çerçoveyê de rewş afirîya. Î ro ku her tîpên ku di kurdî de ku herî kêm xwediyê du dengan bê di xwe de, her wusa di vê ku mirov bi vê yekê re werêne ser ziman. Ev yek, ji xwe di serdemên aqil û zanîstê de, weke temenekî afirandinê û pêwîsta jî.

Divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku dengên tenik û zirev bûna, her wusa, wê bi demê re êdî li gorî wê konsantrabûnê di ziman de werênina li holê. Lê ev rewş, wê "dengên navîn" ku weke bi zaravayên kurdî ên weke hawramî, soranî, goranî û hwd re dihê dîtîn, wê ji dengê tîpekê weke herîkîna li tîpa din ku deng derxe wê rewşekê bi xwe re biafirîne. Ev jî, wê weke rewşeka teybet bê. Ev rewş, wê van zaravayên kurdî, bike zaravayna ku rengê zimanê kurdî ê di ancama van rengên pêşketinê de ku weke ziman pêşbixin bin. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov bo fahmkirina van rewşên zaravayî jî, dahûrîyeka tîpî ya bi herîkînan û guharînan pêşbixe li ser zimanê kurdî re. Ev rewş, wê weke rewşna ku pêwîst bin bo fahmkirina ziman jî. Di vê çerçoveyê de her wusa cihê van zaravayên kurdî, ji aliyê ziman û zanîna ziman ve, wê di temenê demên buhurîner de bin. Ev jî, wê her wusa, weke rewşna pêşketî ên giring bin. Di vê çerçoveyê de êdî piştî ku beşên civatên kurd kêm têkilîya wan bi hevdû re hebû, ev jî, wê temenê wê pêşketinê zûtir pêş bixe. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî, bibêje ku î ro ku hemû zaravayên kurdî,

ku zazakî û ankû kirmanckî bê, hawramî, soranî, goranî û hwd bin bi hemû devik û zaravayên din de, hinek gotinên ji serdemên berê ên weke gûtfî, hûrfî û mîtannîyan ku li wan belavkirî û hatina li wan raşandin mirov wê kifş bike. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov vê reşê jî werêne ser ziman ku bi demê re ev afirandinên bi devkî û zaravayî û hwd, wê temenê pêşketinên nû bi afirênin. Ziman, çendî ku weke darekê ji temen ku çiqilên xwe dide û bi wê re mazin dibe, wê bi heman rengê ew rewşa devik û zaravayan jî xwe bide dîyarkirin.

Rewşa zimên, weke rewşeka têgîhiştî ya civatî ya. Çawa weke rewşeka têgîhiştî ya? Her wusa, dema ku mirov li gotinên wê û rengê bikarhanîna wan binerê, wê mirov vê yekê kifş bike. Ziman, her wusa, ew pergaliya wê ya civatî ku mirov li wê dihizirê, her wusa mirov wê pêşketina wê ya bi dîrokê re bi wê re dibînê. Serdemên civate kurd ên bi dîrokê ji serdemên sûmerîyan û bi vir ve heta ku tê serdema me, wê xwe bi pêvajoyên aqil ên zimanî re jî bide dîyarkirin. Her dem, xwediyê rengê pêşketina xwe ya zimanî jî ya. Divê ku mirov vê yekê jî di serî de kifş bike.

Her wusa, lê çend ku her ziman xwediyê rengê pêşketina xwe jî bê, wê di xatekê de li ser rêgezên ku bi wê re ji destpêkê bidest pêşketina xwe kirîya, wê bi wê re pêşketina xwe bi jîyanê re bidomêne. Li vir, ya ku mirov dibînê jî ev a. Têgîna ziman, dema ku mirov li wê dihizirê bi rengên pêşketina wê re, her wusa, weke pêvajoyên wê yên dîrokî û hwd re, bi wan re xwediyê rengê pêşketinê ya. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku her wusa weke ku me hinekî li jor bi rengê pêşketina wê li ser tîpan re hanî ser ziman, mirov dikarê ji wir bidomênêne û werêne ser ziman.

Ev yek, her wusa pêwîsta jî. Tîpên ziman, dema ku mirov li wan dihizirê, bi hevdû re çerçoveya ziman, bi ahenge wê re diafirênin. Her wusa, di çerçoveyê de kîjan wê bi çî dengî werê bikarhanîn, her wusa li ser wê re xwe dide dîyarkirin. Em dema ku li rengê dengên demên berê ên tîpên ku bi wan kurdî dihat axiftin û ziman ku li wan dinerin, hinek ji wan weke hinekî stûrtir û ji qiriqê, weke ku bixiritêne bûn. Bi teybetî, em dema ku li serdemên Hûrfî û mîtannîyan dinerin, em vê yekê dibînin. Her wusa zimanê wan, hinekî bi dengna stûr in. Em vê yekê, bi wan re kifş dikin. Hûrfî û mîtannî, wê di dema qasî û gûtfîyan de bide hanîna li ser ziman

bikin. Her wusa, li vir, em rastî rewşek teybet tên. Di serdemên qasîtan de, ziman, weke ku hinekî din bi rengêkî din ê ji ya hûrî û mîtannîyan bû. Lê hûrî û mîtannîyan, temenê wan li ser qasît û gûtîyan a. Her wusa, piştî wan re jî, wê temenê 'medan' li ser hûrî û mîtannîyan bê. Di vê çerçoveyê de di rêzekê de li dûv hevdû herîkînek bûya. Di her demê de, dengên ku dihên bikarhanîn, em di wan de li gorî rengê pêşketina wan, di wan de cûdahiyên dibînin. Her wusa, li vir, em dibê ku di çerçoveya serdemek aqil de, serdemên sûmer û qasîtan weke serdemekê werênina ser ziman. Piştî, gûtî, hûrî û mîtannîyan jî, weke serdemekê di çerçoveya pêşketina zimanî de werênina ser ziman. Piştî wê re jî, serdemên dawîyê ên mîtannîyan û serdema medîya, weke serdemeka destpêkê werênina ser ziman.

Xate pêşketina ziman, fahmkirina wê giring a. Di vê çerçoveyê de wê werê fahmkirin ku çawa gûherîn, herîkîn û her wusa pêşxistin bi ziman re û di nava ziman de bûya. Em dema ku di çerçoveya zanîna ziman de li mijarê dinerin, em dibînin ku ev pirr giring dibê. Zimanê dema gûtî, hûrî û mîtannîyan, weke zimanekî pêşketî ê aqil a. Em bi gotinên aqil pêşketina wê kifş dikin. Her wusa, di vê çerçoveyê de em dibînin ku bi wênakirina têgînê û her wusa ew têgîna ku hatî bi wênakirin, piştî bigotinkirin, wê weke rengêkî pêşketinê ê ku teybet bê. Di vê çerçoveyê de gotin, weke ku zindî û bi gîyan in. Em vê yekê wusa xweşik bi wan re dibînin. Çerçoveya vê yekê, wê aliyekî têgînî bide afirandin. Di mejî de, ew wêneyên ku bigotin bûna, di mejî de bicih dibin. Ev jî, wê êdî di çerçoveya salixkirina gotinan de werê ser ziman. Di nava çîrokên civate kurd ên weke 'şahmaran', 'çîrokên keçelok', çîrokên weke ên 'rûstemê zal' û hwd, rengêkî vegotinê ê teybet heya. Çîrok, her wusa, wusa xweşik hanîna ser ziman, bi wê re dibê, êdî gotin weke ku bi wê vegotina wê re zindî û bi gîyan dibe. Her wusa, di vê çerçoveyê de zaroyekî kurd ku bi 'çîrokên keçelok' ku bi sadan li dûv hevdû dihatina vegotin, wê bi wan re di mejiyê xwe de rengê pêşketinê bidina afirandin. Gotinên van çîrokên civate kurd ên weke 'çîrokên keçelok', çîroka 'şahmaran' û hwd ku bi gelek çîrokên din re wê miftiya zêhnê mejiyê kurd bin. Em divê ku di vê çerçoveyê de li wan binerin. Bo vê yekê, ew çîrok, çendî ku weke çîrokin jî, em nikarin weke çîrokekê nêzîkatîyê lê bikin. Divê ku em divê çerçoveyê de di çerçoveya nêzîkatîyek zêhnî de jî li wê binerin û fahm bikin.

Li vir, li ser van çîrokên kurdî re ez divê ku vê gotinê bibêjim. Di nava çîrokan de gelek leheng bi vegotinê dihatina ser ziman. Dema ku zarokan

li wan dihisand, ew di mejîyê xwe de bi wêna dikir, her wusa ew jî, wê di vê çerçoveyê de di zaroyê de cih bigrê. Zaro, heta ku weke ku xwe di wê keseyetîya wan mirovên ku di wan çîrokên de dihatina ser ziman de didît. Di vê çerçoveyê de bi wênakirina wan gotinan, wê weke aliyekî zêhnî ê mejî bê.

Di nava kurdan de gotinaka ku ji nava çîrokên wan firîya, gotina "cin" a. Heta ku dem bi dem ji kurdan bi xwe re jî hatîya gotin ku "kurd, cin in." Ev gotina cina, wê kurd, di çerçoveya wê de, weke çîrokên civatî ên çîrokên keçelok, şahmaran û hwd, wê bi sadan çîrokên din jî ku di wan de cin weke gîyaneka ku xwedî aqil û xwedî jîyan lê ku ne xwediyê laşekî li jîyanê ya dihê ser ziman. Lê wusa hanîna ser ziman ku "cin, dikarê li jîyanê xwe bilaş bike." Ev gotin, wê têtîneka baş di çerçoveya mijara me de bide me. Her wusa, gotin, weke têtînekirin û hanîna ser ziman li berçav, çawa bi şenberî pêşketîya û hatîya salixkirin, wê dide nîşandin. Bi wê re jî, bi teybetîyên laşekî re jî, ku ew dikarê xwe di jîyanê de jî werêne ser ziman. Gotina 'cin', weke gotinaka ku bi wêneyî û mejî dikarê wê tefkîr bike û ji wê şîroveyê pêş bixe ya. Her wusa di vê çerçoveyê de ew gotina cin, sînorê wê nîna ku karibê pêşketinê û afirandinê di xwe de bide çêkirin. Ji ber ku xwediyê têtîneka 'afsûnê' ya.

Ev minaqe bigotina 'cin' re, wê têtîneka baş bide me di derbarê bi wêna kirina gotinê de ku di mejî de. Her wusa, çîrok û vegotinên bi heman rengî, ku xwediyê wê têtîneka wênakirinê na, wê weke aliyekî giring ê ku mirov divê ku werêne ser ziman bê. Divê çerçoveyê de ku werêne ser ziman.

Hizirkirina li ser gotinan re dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, weke biwênakirina gotinê, weke ku minaq dema ku mirov li 'mîtra' dihizirê ku çawa ya û hwd. Rengê bi wênakirina gotina di nava zimên de di vê çerçoveyê de pêşketî ya. Hinekî jî, her gotina ku hatî bi vî rengî bi wênakirin, temenê afirandinên nû ên bi dengî û dengzanî ku ji xwe ya. Her wusa, di vê çerçoveyê de bi zanîna zimanî jî, gelek afirandin bûna.

Em li vir divê ku vê yekê jî werênina ser ziman ku têtîneka wênakirinê, her wusa, wê gotinê bi çerçoveya wê ya salixkirî û hwd re, wê weke regekî pêşketinê bide diyarkirin. Li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku di vê çerçoveyê de biwênakirina gotinan, wê tenê aliyekî têtîneka ê di çerçoveya vê mijarê de bê. Di vê çerçoveyê de ji hevdu derxistina wateyan û hwd, wê temenê afirandina gotinî bi regekî din bê. Her wusa,

her salixkirina ku di nava mejî de bû, wê mejî karibê wê di çerçoveyaka afrîner de bikarbêne. Hizirkirina bi gotinê, her wusa, wê bi vê rengê birengêkî afrînerî bê. Li vir, di vê çerçoveyê de ji hevdû derhanîna gotinan li ser wateyê re bi hizirkirinê û hwd re, wê êdî temenê wê bi zêhnî mirov û zanîna ziman re biafirê. Di vê çerçoveyê de ku weke êdî li ser hîmê gotina ku weke kok û hwd afirandina gotinan bi mejî re zêdetir dibe. Minaq, weke koka 'kir', ku 'kirin', 'kiribû', 'kirîya', 'kirî', 'kirkir', û hwd.. Lê ev gotin, bi vê rengî bi rengêkî wan ê afirandinê ya. Lê piştî ku ev bûn û piştire, êdî wê zanîna ziman, di nava xwe de, weke ku me bi têngîna tawandinê a bi tîpa 'ê' û hwd re hanî ser ziman, wê êdî dîmenê wan ê duyemin weke zimanê duyemin ku biafirêne wê ji wan bibe. Minaq, ku em tenê gotina kok 'ê' a 'kir' hildina li dest, wê karibê, bi rengê 'kêr' ku di hamana wateyê de werê ser ziman. Bi heman rengî, bi tîpên din re jî li gorî rewşan û hwd, wê afirandinên li ser wê re bibin. Ev rengê afirandinê, weke rengêkî xwezayî ê zimanê kurdî ê ku bi dîrokê wê re pêşketîya ya. Weke ku çawa ku weke ku me li jor hanî ser ziman ku hevgirtin(sentezkirin)a gotinan hê di wan serdemên gûfî, hûrî û mîtannîyan û hwd de pêşketîya, bi heman rengî, bi pêşketina aqil û hwd re, ev rengê afirandinê bi tawandin û ji hevdû derhanîn û afirandin ku bi awayekî hilbirînî û hwd dibe, wê êdî pêş bikeve bo hanîna li ser ziman. Ev rengê pêşketî ê bi zimanê kurdî re wê her wusa weke rengêkî pêşketina wê ê dîrokî bê. Em çendî ku bi dîroka wê re pêde diçin, her wusa em bi wê re kifş dikin. Em bi wê re dibînin. ..

Me ji wateyê destpêkir. Piştire jî, hinekî me bahse rewşa kita'yan di kurdî bahsê kir. Rewşa kita'yan, di nava kurdî de gelek tiştan gelek tiştan ji me re dibê. Li gorî rastîya zimanê kurdî, rastîya kita'yan, weke 'gotinên bi kirde' xwe didina dîyarkirin li ber me. Divê çerçoveyê de divê ku mirov bibêje ku hinekî jî, ev rewş rengê pêşketina kurdî ê bi dîrokê re dihêne ser ziman. Î ro, dema ku em gotinên bi aqilî ên kurdî ên dirêj dahûr dikin, em di nava wan de yek bi yek, gotinên bi kirde kifş dikin. Her gotinek ji gelek gotinan pêk tê. Dema ku rewş ev bê ku gotinek diserê mirov de ji wateyekê zêdetirî gelek wateyan zindî bike bi xwe re wê ne şaş bê ji mirov re.

Hinekî, təkiliya vê rewşê bi hebûna ziman û pîrr gotinîya wê ya bi gotinîyê ve girêdayî ya. Divê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman ku têngîna gotinî, her wusa weke têngîneka ku mirov divê ku wê werêne ser ziman. Gotinên kurdî ên dirêj, weke ku me li jor bi gotina 'zanebûnê' û ya 'têgihîştinê' û hwd re hanî ser ziman û ku em dikarin bi hemû gotinên din ên kurdî re bikin, têngînekê bi rengê pêşketina xwe re dide me û her wusa, bi wê re her gotinek weke naqşayak zêhnî a ku bi zimên re ku hatîya afirandin jî radixe li berçav.

Em dema ku li serdemên Sûmerîyan wan dinerin, em dibînin ku bi gotinên kin û piçûk, bi du û ankû sê tîpî wê gotin hebin. Di vê çerçoveyê de gotin hatina çêkîrin û bi deng û wate kirin. Wateyên ku li wan hatina kirin, di vê çerçoveyê de weke têngîn û zêhnê zanînê ê bi gotinê re ku afirandîya û di serdemên piştire de ku daya domandin a. Em li vir, bi vir ve girêdayî vê yekê jî werênina ser ziman ku wê kurdî gotinên wê ên pêşî ên kin û piçûk, wê her wusa, piştire hûnadina li dora wan ku bibe, wê temenê wan gotinên bi pîrr-gotinî jî bi xwe re biafirîne ku bi wan aqil werênina ser ziman. Û ankû, ku gotinên "mazin" ava bikin ku karibin bi wê zêde û mazin werênina ser ziman. Di vê çerçoveyê de hertimî mirov di serê xwe de dihizirê ku mazin werêne ser ziman. Hertimî, di serê xwe de li ya 'baş', 'qanc' û 'mazin' ku têngihîştî li wê digerihê. Mirov çendî ku mazin hanî ser ziman, bi wê re jî xwe mazin dibînê û hîs dike. Her wusa, hinekî jî, weke ku teherek di vê çerçoveyê de di nava mazin û bi zanebûn hatina li ser ziman de bi keseyetîyê re heya. Keseyetî, di vê çerçoveyê de,

her bi asta ku hat hanîn ser ziman, bi hêstîyarî û têtîgînî xwe bi wê re weke ku salix dike û dihêne ser ziman. Bi gotinaka din, xwe li gorî wê diadilêne. Aqil, di vê çeçoveyê de di temenê vê rastiyê de ya. Aqil, keseyetîyê û ziman, di vê çerçoveyê de bi pêşketina xwe re digihêne hevdû û bi hevdû re dihoyêne. Di vê çerçoveyê de pêşketinên bi aqil, ji aliyê ziman û zanîne ve çendî ku xwediyê wate û têtîgînê na, her wusa bi heman rengî ji aliyê keseyetîyê ve bi vî rengî xwediyê hîm û wateyekê ya.

Ji vê aliyê ve jî divê ku mirov hinekî bi kûrahî li ser gotinên dirêj ên kurdî rawastihê. Ev gotin, her yekê ji wan, weke çend gotinan a. Yanî, weke ku ji çend gotina afirîya dihê dîtin. Weke teybetîyyeka salixkirina dengî ya di kurdî de, wê derfetê dide me ku her tîpên bi kitayî hatina hanîn berhevdû, weke gotinê bi kirdeyî û hwd re dihêne holê û dide nîşandin. Em vê yekê divê ku weke teybetîyyeka zimanî ya kurdî ya giring jî werênina ser ziman. Li vir, rewşa ku derdikeve li holê ku weke ki hîyererşîyek ji gotinîyên kin û bi ber yên dirêj ve heya di çerçoveya gotinên kurdî de.

Ev hîyererşîya gotinan, dema ku mirov li wê dihizirê, rengê afirandin û pêşketina têtîgîna gotinê jî di derbarê wê de hizrekê dide me. Bo vê yekê jî bê, giringa ku mirov li ser wê bisekinê û wê fahm bike. Têtîgîna gotinî, her wusa, weke têtîgîneka ku em li vir di vê çerçoveyê de bi gotinên hûnayî re werênina ser ziman.

Pêvajoyên kurdî ên ji serdemên Sûmerîyan û hwd, ku bi gotinên kin, di vê çerçoveyê de mirov li ser ziman re rêyekê bi gotinên wê re kifş dike ku bi wê re herê û xwe bigihêne wan û wan jî kifş bike û fahm bike. Em bi vê yekê jî, xate pêşketina zimanî ya bi zanîne jî kifş dikin. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov li ser gotinê re dihizirê, her wusa, mirov vê yekê kifş dike ku gotinên dirêj, weke naqşayna têtîgînê ên ku zanîna ziman li berçav hatiya girtin û bi wê re hatina afirandin in. Mirov, her wusa vê yekê bi awayekî vekirî kifş dike. Gotinên ku weke naqşayên zêhnî ên aqilî na ku di nava xwe de pîr aqilîyê dihawênên, her wusa, di vê çerçoveyê de vê têtîgînê didênina ber me.

Gotin, di dema fêrbûn û ankû fêrkirinê de jî bi dahûrîya wê ya di vê temenê de wê temenekî baş bide çêkirin. Her wusa, her gotinên bi têtîgîn û gotinên kin ên di nava wê de na ku werina kifşkirin re, her wusa, wê temenê fêrbûn û fêrkirina zêhnî ya bi ziman jî biafirêne. Ev rengê gotinê, zêhnê zanîna ziman radixe li berçav. Em vê yekê, her wusa vê baş dibînin.

Pêvajoyên pêşketina ziman, di vê çerçoveyê de weke ku me li jor jî hanî ser ziman, li ser aqil re dimeşîn. Her wusa, em vê yekê bi gotinên ziman û bi hevdû ve bi hûnandina wan re jî kifş dikin. Di çerçoveya hûnandina gotinê de her wusa pêvekên weke ên ku bo zêde nîşandin, û ankû tawandinê ku dibin ew jî, bi qasî aliyekî wan ê gotinî heya, her wusa aliyê wan ê bi vî rengî bi gotinê re tememker jî heya. Em li ser vê afirandina gotinên dirêj ji gotinên kin re, hinekî din jî ji aliyê zanîna ziman ve lê bihizirin. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov lê dihizirê, di çerçoveya levkirin, levhanîn û her wusa ku karibin bi hevdû re ahengekê bi levkirin û levhanîna xwe re bi hevdû re çê bikin re dihên hanîn cem hevdû. Ev jî, her wusa, weke aliyekî din ê zanîna zimanî ya ku mirov divê ku li vir wê kifş bike û hewl bide ku fahm bike ya.

Bi hevdû re hanîna cem hevdû hanîna cem hevdû, her wusa, di vê çerçoveyê de li ser gotinên kokî re dibê. Minaq, em li vir li ser gotina 'hebûn'ê re herin. Gotina hebûn'ê, di navaroka xwe de bi 'he ...' weke koka ku têngîna 'bûyînê' û hwd ku bi xwe re dide mirov re. Lê weke gotinî jî, mirov dikarê wê werêne ser ziman. Minaq, bi rengê tawandina wê re gotina 'hê' wê derkeve li holê. Aliyê din jî, 'dawika' wê ya "...bûn"ê jî, çêbûn'ê dihêne ser ziman. Bi tawandina gotinê re 'bê' û hwd bi hinek rengên din re mirov dikarê biafirandinî werêne li holê. Ku ev gotinên kokî hatina cem hevdû, wê gewdeya gotina "hebûn"ê bi afirandinî werênina hanîn li holê. Em dema ku bi gotinî li gotina "hebûnê" bihizirin, hizirin, her wusa bi kirdeyî emê rastî çend gotinan werin? Minaq: 'he', 'heb', 'eb', 'e bû', 'he bû', 'hebû', 'bû', 'he bûn', 'bûn', 'ûn' û hwd, mirov ji navaroka wê bi kirdeyî gotinan kifş dike. Rengekê gotina "hebûn"ê bi tawandina wê re "hêbûn" a. Dema ku mirov ji vê aliyê jî dahûrîya wê ya bi gotinî bike, mirov wê hinek gotinên din ên kin ji vê aliyê ve jî bi wê re kifş bike. Mirov ku hinekî din lê bihizirê bii dahûrî, mirovê hê jî kifş bike. Her wusa, di vê çerçoveyê de gotinek, çend kirdeyên gotinî ku piştî kuem kifş bikin ku em bi gotin bikin, em ji wê kifş dikin. Her wusa, li vir, têngîna kirdeyê giringa ku mirov di çerçoveya zanîna ziman de ku li wê serwer û serwaxt bê. Têngîna kirdeyê, her wusa weke têrkerîyeka têngînî ya vêşerî ya. Dema ku mirov li wê dihizirê mirov vê yekê her wusa bi wê re kifş dike.

Mirov, dema ku li gotinekê dihizirê, bi wê re çend kirdeyan bi vî rengî kifş dike? Her wusa, di vê çerçoveyê de dema ku mirov dihizirê, mirov dikarê bibêje ku ti carî herî hindik, wê kirdeya gotinê ku em kifş bikin, w,

weke gotina ku em li ser wê dihizirin wê ne yek bê. Wê ji wê zêdetir bê. Li vir, ya ku tenê mirov bike, bi zanîna zimanî re ku li wê gotinê û ji çî pêkhatîya û çawa pêkhatîya her wusa ku mirov wê kifş bike û werêne ser ziman. Em li vir, vê yekê jî werênina ser ziman, ev gotinên ku her wusa bi kirdeyî pirr-gotinîyê ji wê kifş dikin, ne gotinên bijarteker(eclectic) in ku mirov wan bi wê rengê werêne ser ziman in.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku gotin û pirr kirdeyîya wê, her wusa wê dem bi dem di hişkirin, fahmkirin û bi zindîbûna wateyên cuda bi cuda ên di mejî de re wê xwe bide dîyarkirin. Ev jî, her wusa, di çerçoveya wê ya ku mejî, her wusa di xwe de wê bi hiş dike dihêne ser ziman. Mejî, di xwe de wê yekê, li ser wê kirdeyîya gotinîyê re dike. Her wusa, di vê çerçoveyê de dema ku li gotina 'hebûn'ê hat hizirîn, wê ji wê pirr têngînên ku bi hebûn û bûyînê û çêbûnê û hwd ve ku eleqeder in, wê bi carekê re heya ku di mejiyê mirov de zindi bibin û weke ku werina bîra mirov. Ev, wê di vê çerçoveyê de bi hevdû re di ahengekê de bi têngîna levkirinî û levhanînî û hwd re wê bibin. Di vê çerçoveyê de ku bi hevdû re ne di nava nakokîyê de bin. ..

Ev rewşên kirdeyê, her wusa, bi fahmkirina mirov a ji jîyanê ve girêdayî ya. Mirov, di vê çerçoveyê de divê ku vê yekê jî, werêne ser ziman ku fahmkirina mirov a di jîyanê de wê bi têngînên ku me berê girtina re wê pirr-alîfî bi wê re hebe. Her wusa, gotinên aqil, di vê çerçoveyê de pirr-kirdeyêfî ku xwe bi wan re dide dîyarkirin, wê di vê çerçoveyê de temenê fahmkirina a zêde biafirêne.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî werêne ser ziman ku aqil, li vir, weke têngîneka ku mirov wê baş kifş bike ya. Her wusa, bi ziman re xwe dihêne ser ziman. Lê ziman ji du aliyên ve ji xwe re dike weke qadaka afrîner. Yek, weke ku me hinekî li jor hanî ser ziman ku bi gotinên dirêj re ku di temenê têngînek pirr-kirdeyî û hwd de ku zêhnê pêş bixe ya. Aliyê din jî, her wusa li ser hebûna gotinê ya. Li vir, tehera ji têngîn û zanîna gotinê çûyîna ber wê ber bi wê zanîna aqil de, her wusa, wê aliye têngîna zanîna biafirêne. Lê ji aliyê têngîn û zanîna aqil ve, dema ku mirov ber bi gotinê ve herê, her wusa di vê çerçoveyê de têngîna zêhnî û jîrî wê xwe bi wê re bide dîyarkirin û werêne ser ziman. Li vir, gotinên dema aqil ên dirêj, weke gotinna ku em dikarin weke naqşaya zêhnî ku werênina ser ziman in. ew zêhnê zimanî û ankû jîra zimanî ku em bahse wê dikin, li vir divê ku mirov ji vê cuda bigrê. Ew jî, bi serê xwe bi zanîna hebûna ziman re ji xwe re

heya. Lê ev zanîn, her wusa, weke aliyekî têtînê ê wê yê ku mirov di temenê têtîna afrînerî de ku hilde li dest a.

Pirr-kirdeyî, her wusa, divê ku mirov werêne ser ziman ku weke teybetîyeka têtînê a zanîna gotinên zimanê kurdî ya. Di vê çerçoveyê de nêzîkatîyek rast ya bi aqil ji fahmkirina wê re divêt. Ji gotinekê pir-kirde fahmkirin û her wusa bi wê re jî hanîna ser ziman, wê temenê pêşketina aqilî û zêhnî bê. Li vir, divê ku mirov vê yekê baş fahm bike ku têtîna gotinê a pirr-kirdeyî, wê her wusa di vê çerçoveyê de weke têtîneka afrîner ya bi zanîna ziman re jî bê.

Têtîna gotinê, bi aqil bi deme re dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, di vê çerçoveyê de pêşketina wê mirov kifş dike. Aqilê, serdemên destpêkê, zelal û safî ya. Ne tevlihev a. Her wusa, piştî ku aqil pêş dikeve ew tevlihevî derdikeve li holê. Wateya gotina tevlihevîyê jî ew a ku pirr-kirdeyîya gotinê ya. Ji gotinekê fahmkirina pirr têtînê û fahman a. Di vê çerçoveyê de gotinên dema aqil, xwediyê têtînê na. Di vê çerçoveyê de zanîna ziman, giringîya wê ne tenê bo fahmkirina hebûna ziman a. Her wusa bo derxistina li holê û pêşxistina wê aqilê bi gotinê re jî ya. Divê çerçoveyê de xwediyê weyn û rola xwe ya zimanê ya. Zanîna ziman, di vê çerçoveyê de bi aqilê kirdeyî ê di gotinê de kifş bike û werêne ser ziman. Salixkirina wê aqilê kirdeyî, her wusa weke têtîneka ku were têrkerkirin a. Kirde, piştî ku bi têtîhî hat dîtin û kifşkirin, êdî şenberîya wê xwe dide dîyarkirin. Ev jî, wê temenê hanîna wê ya bi gotinê a li ser ziman bê. Kirde, pêvajoyên wê yên afirandina bi gotinê, di vê çerçoveyê de bi kifşkirinê bi aqil re xwediyê wateyekê ya.

Bi dîroka pêşketina ziman re aqil, xwediyê hevlingîyekê ya. Em vê yekê jî, dikarin ji rwş û têtîna kirdeyê û bi wê re bi gotinê re fahm bikin. Dema ku mirov li dîroka hizir dihizirê, her wusa, mirov vê yekê bi awayekî vekirî dibînêt.

Hizir, temenê wê bi gotinê, li ser hizirkirinê û ankû têtîna bi hizirkirinê re ku hatî bi dest kirin ava ya. Her wusa, hizirkirin, di vê çerçoveyê de weke têtîneka aqilî a bizanînê ya. Bi gotinaka din, dahûrîya aqilî ya bi zanîna ziman a jî. Her hizrên ku me hanîn ser ziman, wê aliyekî wan ê zimanê hebe. Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman, ku aqil û ziman bi hevdû re ji navîkê ve xwediyê têtîlî û girêdanaka bi têtînê na.

Dema ku ez li ser gotinê dihizirim, her wusa têtîna hizirkirinê bi awayekê di mejiyê min de şaq dide. Gotin, wê têtîniyê dide min. Gotin, bi

awayek xwe ya kirdeyî a gelemperî ew a ku 'tişta ku were gotin' û ankû 'tişta ku tê gotin.' Yanî jî, 'tişta ku hatî gotin''ê bi xwe re dihêne ser ziman. Mirov, çî dihêne ser ziman? Mirov tişta ku dî bi nerîna xwe re wê dihêne ser ziman. Binerînî dîtî jî, her wusa, temenê gotina 'hiş' diafirêne. Bi gotinaka din, weke tişta ku hatî hişkirin jî mirov dikarê bahse wê bike. Tişta ku hatî hişkirin, tişta bi aqilî mirov têgihîştî ya. Her wusa weke gotinaka aqil, têgihîştin, her wusa vê yekê dihêne ser ziman. Têgihîştin, tişta ku bi nerînî hatî dîtî, têgihkirin û hatîya kirin weke têgînekê dihêe ser ziman. Di vê çerçoveyê de têgihîştin, weke gotinaka têgihîştî a aqil a. Çerçoveya vê gotinê, her wusa bi zanînê dihê afirandin. Dema ku mirov li navaroka wê jî dihizirê, her wusa, mirov vê aliyê wê her wusa kifş dîke û dihêne ser ziman.

Têgihîştin, aqilê bi zanînî ku hatîya bi gotinkirin dihêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de jî ew aqil, dema ku mirov bahse wê bike û bo ku mirov wê bi gotina têgihîştinê re werêne ser ziman, mirov divê ku werêne ser ziman ku weke têgîneka bi hişî ku têgihîştî. Her têgîn, piştî ku di mejî de di derbarê wê de hiş bû û pê de, wê bi kirdeyî ber bi gotinîyê ve herê û bibe. Di vê çerçoveyê de li ser gotinên zimên re pêvajoyîna wê yên di mejî de ên di çerçoveya afirîn û hişkirinê û hwd de hena.

Em li vir, divê ku têgihîştinê, weke aliyê gotinê ê şûbjeyî û nirxî werênina ser ziman. Her wusa gotin bixwe bi zanîna xwe re bi têgîna dahûrî a bi gotinî re xwediyê têgînê û wateyê ya. Têgihîştin, weke nirxîtiya wê ya şûbjeyî ya. Her wusa, dema ku mirov tişteki hiş dîke, her wusa divê ku mirov werêne ser ziman ku aliyê wê nirxî jî bi hişkirinê û hwd dihê holê. Têgîna şûbjeyî ya li ser gotinê re bi aqil, di vê çerçoveyê de bi têgînî mirov divê ku wê werêne ser ziman. Lê dema ku mirov di çerçoveya gotinê de werêne ser ziman, Divê ku mirov werêne ser ziman ku gotin û têgîna wê bi hevdû re weke ku xwediyê çerçoveya objeyî û şûbjeyî ên ku di çerçoveya têgîna kirde û heyberîyî de dihê hanîn ser ziman a. Li vir, dema ku em li ser gotinê re bahse aqilê şûbje bikin, divê ku em bi aliyê wê yê kirdeyî û ankû şûbjeyî re hinekî zêddetir eleqeder bibin. Ev jî, wê weke aliyê bitêgîn û hiş, wê xwe bide dîyarkirin. Her wusa, bi gotinaka din, weke aliyê ku dihizirê jî, întîbayek bi mirov re diafirê. Gotin bixwe, weke çerçoveya wê ya heyberî ku li berçav bi rengê wê re û hwd dihê dîtî, wê her wusa weke xwediyê têgîna bi gotinî a hîmî ya dahûrî bê. Di vê çerçoveyê de gotin, weke heyîna hebûnî xwe dide dîyarkirin. Hizra li wê

weke têtîneka şûbjeî xwe dide dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de gotin, bi aqil û hişî, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa weke têtîneka ku em aliyekî wê bi gotina dahûrîyî re werênina ser ziman û aliyê din jî bi têtîna kirdeyî ya bi hişî û hwd re werênina ser ziman, wê derkeve li holê. Gotin, di vê çerçoveyê de ew aliyê wê hişî, ku em divê ku weke şûbjeya wê jî werênina ser ziman, wê hin bi hin hîmekî afirandinî bi têtînî bi xwe re biafirêne. Gotin, bi wê re weke ku bi tevger a. Her wusa li vir, em dema ku bahse zanîna gotinê dikin, em hinekî jî bahse zanîna aqil dikin. Di vê çerçoveyê de zanîna aqil, xwediyê kifşkirineka bi hişî ya. Aliyê têtînî ê kirdeyî di vê çerçoveyê de bi gotina aqil re wê xwe bide dîyarkirin. Gotin, li vir weke temenê afirandina kirdeyê li ser aqil re xwe êdî bi wê re dide dîyarkirin.

Çerçoveya gotinê, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, bi aqilê mirov re mirov li wê dihizirê. Bihizirkirina li gotinê re mirov ji wê aqil kifş dike. Ev aqil, her wusa bi fahma li ser kirdeya wê re ya. Ankû, ew fahm kirdeya wê ya. Lê li vir, divê ku mirov vê yekê werêne ser ziman ku di çerçoveya têtîna gotinî û aqilî de, divê ku bi mirov tehereke têtîne ya 'dîyelektîkî', her wusa ji gotin, ber bi kirdeyê û ji kirdeyê jî ber bi wateyê û hwd ve werênina ser ziman. Dema ku em vê çerçoveyê her wusa lê dihizirin, em vê yekê kifş dikin, ku li ser hişê mirov re mirov dikarê vajî wê jî, bi rengê li ser wate'yê, ber bi kirdeyê û piştre bi afirandina gotinê û hwd re, mirov dikarê werêne ser ziman. Pêvajoyên hizirkirinê wê bi watekirinê re werina ser ziman. Pêşî bi hîskirinê re, piştre wê hişkirineka ku em dikarin di çerçoveya têtîna wateyê de werênina ser ziman wê biwê re bi afirê. Piştre jî, ew wê şenberîyekê bi darêjkî bistêne û bê weke kirdeyê. Piştre jî, wê bi gotinkirina wê êdî bibe.

Di vê çerçoveyê de pêvajoyên ji hîskirinê û heta afirandina gotinê, dema ku mirov li wan dihizirê, her wusa mirov bi aqil re kifş dike. Aqil, di mejiyê mirov de di xêva mirov de bi girtinê re temenê xwe bidest dixê. Piştre jî, li ser wê re êdî bidest pêşxistinê dike. Lê li vir dema ku em her wusa, weke ku me li jor jî hanî ser ziman ku bi aqil û pêşketina wê re ku gotinên aqil ên dirê êdî dihên afirandin, ev wê di regekî hevgirtinî ê bi têtînî de wê bibe. Her wusa, di çerçoveyekê de hevgirtinîya ku bi têtînê re dibê, wê di vê çerçoveyê de bi kirdeyê û piştre bi gotinê re jî wê rewşê bi xwe re bide afirandin û pêşxistin. Hilberîna di çerçoveya gotinan de ku xwe dide dîyarkirin, wê di vê çerçoveyê de afirandina zanîna aqil re xwe

bide dîyarkirin. Pêvajoyên pêşketina aqil, dema ku mirov li wan dihizirê, her wusa di vê çerçoveyê de mirov bi rengekî hem ji aqil bi ber kirde û gotinê ve ku dibê û piştî ku ji gotinê ber bi hizirkirin û afirandinê ve ku dibe, mirov kifş dike.

Lê dema ku mirov di vê çerçoveyê de bi aqil re kifş dike, her wusa mirov vê yekê bîafirandina gotinê re jî kifş dike. Afirandina gotinê, wê bi du rengan bibe, yek li ser kokê re ku êdî bi kirdekirinê û her wusa birengê pêvek û girêdanên bi gotinê re ku tawandin û hwd dihê kirin ve mirov dibînê. Lê bi awa û aliyê din jî, mirov bi rengê weke ku me li jor jî, bi dahûrîya gotinê ku hanê ser ziman ku ji gotinekê girtina pîrr-kirdeyan û hwd, bi wê re mirov kifş dike. Ew kirde jî, dema ku mirov wan bi hiş kifş dike û dihêne ser ziman, êdî weke ku bi gotin bûyî gotina. Di vê çerçoveyê de aqilê gotinê, divê ku mirov bî pîrr-kirdeyîya wê re di çerçoveya zêhnê û têkilîdanîna bi gotinê a bi hevdu re werêne ser ziman. Li vir, gotinên dirêj, her wusa mînaqna pîrr baş in ku mirov dikarê bi wan re têgîna zêhnê ya bi girêdanîyabi hevdu re ku dihê kirin û hwd, bi zanîna wê gotinê û zanîna ziman û hwd kifş bike û werêne ser ziman. Zanîna ziman, di vê çerçoveyê de bi têgînê weke zanîna zêhnê jî ya. Aqilê ku ji zêhnê, di kurdî de ji wê re 'jîr' tê gotin. Jîr, dema ku weke gotinê, ku mirov wê dahûr dike, her wusa, bi wateyên 'ji wê', 'ji jê', 'jê bûyî', 'ji jê hatî hildanû hwd, bi gelek wateyên din re mirov dikarê werêne ser ziman. Jîr, zanîna zêhnê, her wusa ku mirov wê bi têgîna gotinê re dihêne ser ziman, bi xwe re salix dike û dihêne ser ziman.

Çerçoveya bi zanîna ziman re ku mirov li wê dihizirê, her wusa di vê çerçoveyê de weke çerçoveyeka aqilî û zanînê mirov wê kifş dike. Bi gotinên dirêj re mirov hinekî jî, hin bi hin bi zanînê re aqil ku xwe hevdigirê (sentez dike) û hwd, mirov wê kifş dike. Ji xwe, ev yek ji gotinê jî, her wusa dihê dîtin û fahm kirin. Gotinên aqil û ankû ku bîaqil dihêna afirandin û ser ziman, di vê çerçoveyê de rastîya hev girtîniya têgînê ya bi demê re ku di nava ziman de bi aqil re dibê jî radixe li berçav. Mirov vê yekê, her wusa bi aqil û pêşketina aqil re kifş dike. Lê li vir, ev aliyê têgînê ê bi hev girtinê ku çawa di keve temenê afirandina bi aqil a gotin û kirdeyê de, divê ku mirov hinekî li ser wê jî rawastihê û wê fahm bike. Ev alî, wê weke aliyekî têgînê ê ku mirov divê ku bi wê re temenê pêşxistina gotinên zimên jî ku bi wê re fahm bike bê. hev girtîniya ku bi demê re bi hiş re ku bi tîrîfiya aqil re diafirê, wê êdî di wê çerçoveyê de bi kirdeyî xwe bide

dîyarkirin. Di vê çerçoveyê de gotinên dirêj ên aqil ku bi wê dihê hanîn li ser ziman, êdî wê bi afirin. Gotinên weke 'zanînê', 'zanebûnê', 'têgihîştinê', 'fahmkirinê' û hwd, wê êdî xwe bi afrînerî bidina dîyarkirin.

Di vê çerçoveyê de li ser gotinan re divê ku mirov hinekî din li ser têtîna hevgerîniyê rawatîhê. Ev wê weke aliyekî giring bê ku bi wê mirov pêşketina bizanînê û her wusa ya bi ziman û zanîna ziman re ku fahm bike bê. Gotinên dirêj, ku me li jor bahse wan kir û hinekî di vê çerçoveyê de bi dahûrî bahse wan kir, bi têtîni di çerçoveya pêşketina aqil de tiştêkî ji me re dibêjin. Ew jî, ew a ku aqil, her wusa hertimî di pêvajoya pêşketinê de ya û her wusa dem bi dem bi rengê tîrîtiyê xwe pêş dibe. Di hîmê têtîna tîrîtiyê de têtîna hişbûnê heya. Tîrîtî, her wusa, dema ku bi zanînê re mirov li wê dihizirê, di çerçoveya wê ya ku afirê de, bi aliyekî xwe ve weke hevgerîniyekê jî xwe dide li der. Di vê çerçoveyê de têtîniya tîrîtiyê bi aqil re bi hevgerîniyekê re bi demê re diafirê. Dem bi dem, me di jîyane xwe de yan ev gotin gotîya û yan jî ji yên ku gotina bihîstîya ku gotina ku 'bi çend gotinaka bi sereke emê hewl bidin ku werênina ser ziman.' Hewldana hanîna li ser ziman bi çend gotina û ankû bi kortasî û hwd, wê di vê çerçoveyê de têtînekê bide me. Bikortasî hewldana hanîna li ser ziman, bi rengêkî têtîni ê hevgerî(sentez)î re mirov wê dihêne ser ziman. Her wusa, ku mirov di farqê de bê û ankû ne di farqê de jî bê, bikortasî hanîna li ser ziman, bi tîrîtî û hevgerî hanîna li ser ziman. Li vir, dema ku di vê çerçoveyê de dihizirê, mirov digihîjê wê têtîni ku weke ku têtîna tîrîtiyê, wê di çerçoveya têtîneka hevgerîni de were ser ziman. Ji aliyekî ve wateyeka wê ya bi vî rengî heya. Tîrîtî, têtîna bihiş ku di mejî de hatîya zelal kirina jî.

Vê têtîna tîrîtiyê, em dema ku ji aliyê gotinê ve li wê dihizirin, her wusa, mirov bi vê aliyê wê ve kifş dike ku bi têtîna gotinên dirêj re di wê çerçoveyê de dihê ser ziman. Tîrîyek bi gotinên dirêj re jî heya. Her wusa, ew têtîna bi 'zelal'î û ankû şenber ya bi gotinên dirêj re, di vê çerçoveyê de mirov dikarê wê werêne ser ziman. Gotina 'zelal'î, ku mirov li wê dihizirê, her wusa, têtîna ku bi navaroka xwe re dide me bi 'ze', 'zel', 'zela', 'el', e lal', 'lal', û hwd dide me. Wateyên ku ji kirdeyên van gotinên ku em ji nava gotina 'zelal' dixwênin, di temenê têtîna "navarokê", Têtîna "zayînê" û ankû "bûyînê", têtîna "gihîştina xale herî navê", têtîna "safî"îtiyê, têtîna "penê" ku 'ne nepenîya' û ankû 'ne vêşarî ya' û hwd bi xwe re dide me. Di vê çerçoveyê de di aslê xwe de ku tîrîtî, hinekî jî safîbûn

û zanîna wê bê û ankû gihiştina têngîna wê ya rast bê, mirov dikarê bi vê re jî werêne ser ziman. Wê çaxê, mirov dikarê bêje ku tîrî, hinekî jî zelalî ya. Yanî, êdî ya ku hatîya zanîn a bi navaroka xwe re.

Têngîna tîrîyê, li vir, li ser gotinê re dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, hinekî jî ev me hin bi hin dibê û digihêne wê çerçoveya ku me li jor hinekî hanîbû ser ziman ya bi gotinên dirêj re. Dahûrîya gotinên dirêj, bi xwe re dide nîşandin ku di navarokê de gelek kirde bi wê re bi hevdû re di gotinê de dijîn. Her wusa di vê çerçoveyê de ew kirde û wateyên gotinî, li hevdûkirî na. Li hevdû tên. Hevdû bi têngîn û wateyî û hwd temem dikin. Di vê çerçoveyê de êdî bi rengê gotina dirêj re di astaka duyemin a bilind de têngîna hevpar bi wê wateya ku ew êdî li wê gotinê hatîya kirin diafirêne. Her wusa, di vê çerçoveyê de têngîna li hevdûkirinê ya di nava zanîna ziman de ku mirov li wê dihizirê, di vê çerçoveyê de ev têngînîyên gotinî bi pîr-kirdeyî û hwd ku dihên ser ziman, wê di vê çerçoveyê de werêne ser ziman. Em vê rengê gotinê, dikarin bi şibênina hevokê ku ema ku tê avakirin ku ji çend gotin û navbenk û pêvekan pêktê û bi wê re di çerçoveya li hevdûkirina wê de hewldana rastkirina wê û hwd, di vê çerçoveyê de zanînek rengê wê xwe bi gotinên aqil ên dirêj re dide nîşandin.

Gotinên aqil, gotinên ku xwediyê çend kirdeyên hevbeş in. Di vê çerçoveyê de bi wê aqil dihê hanîn ser ziman. Yanî li vir, gotin, bi rengê wê yê ku weke bi wateya wan kirdeyan ku hatîya hevgirtî kirin, di wê çerçoveyê de pozisyonekê dide der bi xwe re. Di dema hanîna ser ziman de jî, di vê çerçoveyê de bi wê hevgirtîniya kirdeyî ya hevbeş a di gotinê de wê êdî ew zanîn li gorî wê were şîrovekirin û ser ziman. Hanîna li ser ziman, di vê çerçoveyê de bi gelek hevbeşiyên ku bi gotinê re çêdibin dibêt. Ev hevbeşî, hemû jî, xwediyê têngînên ku em dikarin wan ji gotinê fahm bikin in. Gotinên aqil, di vê çerçoveyê de weke gotinên hevgirtî ên aqil in. Bi zanîna jî, dema ku mirov li wan dihizirê û dahûr dike, her wusa di vê çerçoveyê de mirov rastî rewşek teybet ya bi gotinê re tê. Teybetîya gotinên kurdî, ew a ku kita'yên ku weke kitayên gotinê dihên afirandin, hemû jî weke gotin dikarin werina bikarhanîn û ankû jî dihên bikarhanîn.

Ev rewşek teybet ya zimanê kurdî ya. Ev rewş, dema ku mirov li wê dihizirê, her wusa, mirov bi wê re vê yekê kifş dike ku serdemên pêşî ên zimanê kurdî weke serdemên demên sûmerîyan û hwd ku bi gotinên kin û hwd ku dihatin bikarhanîn. Piştîre bi pêşketina bi aqil re, hin bi hin, lê zêdekirina, bi lêker, bi daçek, hoker, rengdêr, navdêr û hwd re êdî wê

pêşketina ya li gorî demên aqil û rewşa aqil bi demê re biafirêne. Di vê çerçoveyê de, wê êdî gotin werina cem hevdû.

Dahûrîya gotinên zimanê kurdî, di vê çerçoveyê de mirov di nava rûpelên dîrokê de bi têgînî li ser zanîna ziman û ya pêşketina aqil û hwd bi xwe re dibê û digêrêne. Pêvajoyên pêşketina ziman, bi zanîna wê re her wusa, mirov bi vê rengî bi rengê pêşketina bi wê re kifş dike. Dîroka ziman, di vê çerçoveyê de xwediyê gelek teybetîyên giring in ku mirov divê ku wan kifş bike. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku her kifşa piçûk jî, wê têgîneka mazin bê di serdema aqil de û di pêşketina wê de.

Em li vir, divê ku wê yekê jî werênina ser ziman ku pêşketina bi zimanê kurdî re wê her wusa xwediyê pêvajoyîna bi dîrokê re bê. Gotinên wê ên ku em î ro roja me de bikarhanîn jî, gotinna hevgirtî na. Em dema ku wan gotinan bi awayekî rast dahûr dikin, hin bi hin em digihijina zanîna ziman û pêşketina wê ya bîaqil re. Her wusa, mirov bi wê re digihijê gelek têgînên di derbarê pêşketina dîrok aqil a di nava vê zimanê de jî.

Em dema ku gotinan di çerçoveya aqilê roja me de dahûr bikin û hewl bidin ku bi wate bikin, wê ev me zêde negihêne aqilekî mazin di derbarê dîroka wê bê. Her wusa, berî wê, divê ku mirov bi kirdeya wê re aqilê gotinê bixwe kifş bike û werêne ser ziman. Li ser wê re divê ku mirov bi fahmkirina ziman, pêşketina wê û dîroka wê de pêde heya. Gotin, bixwe, dema ku bixwe were dahûr kirin, wê têgînekê bide me. Her wusa ew têgîna ku em ji wê kifş bikin jî, wê têgîneka ku di çerçoveya zanîna ziman de bê. Wê di nava wê têgînê de dîroka pêşketina ziman hin bi hin xwe êdî werêne ser ziman.

Li vir, divê ku mirov zanîna ziman, her wusa bi awayekî bizane û têgîhiştî hilde li dest û di çerçoveya wê de hewl bide ku ziman fahm bike. Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku her ziman, xwediyê teybetîyên xwe yê sereke ên navxweyî na. Di vê çerçoveyê de nêzîkatîya li ziman, ne ji ya zimanekî din bê. Divê ku nêzîkatîya li ziman ji wê zimanê li wê bê. Di vê çerçoveyê de mirov wê hilde li dest û werêne ser ziman. Ev jî, weke aliyekî têgînî ku em divê ku bi zanîna ziman re ku werênina ser ziman a.

Di vê çerçoveyê de dahûrîya gotinên kurdî, têgîneka baş di derbarê pêşketina xwe ya bi dîrokê re didina me. Dema ku em gotinan di hildina li dest û ji hevdû di felişênin di çerçoveya zanîna ziman de, mirov bi wê re bi pîrr-kirdeyîya wan re kifş dike. Gotin, bi pêşketina aqil re wan

teybetîyên xwe distêne. Her wusa digrê. Lê li vir, em vê aliyê dema ku di çerçoveya zimanê kurdî de werênina ser ziman, ev wê hinekî din cudatir bê. Zimanê kurdî, xwediyê dîrokek ku ne bin deh-hezarsalî re ya. Her wusa, pêvajoyên ziman ên ku bi gotinên kin û piçûk ku buhurandina, di vê çerçoveyê de bi hezaran salan mirov dikarê werêne ser ziman. Piştê jî, dema ku ji wê buhurîna li dema aqil û li nava pêşketina aqil bûya jî, êdî li ser wê re hûnandna bi hevdû re bi gotinê re bûya. Di vê çerçoveyê de êdî gotinên hevgirtî ên bi pirr-kirdeyî hatina û afirîna. Gotinên ziman, di vê çerçoveyê de dema ku pirr-kirdeyî bin, hingî jî, ji gotinekê pirr wate derxistin, wê tiştêkî asayî bê. Her wusa, heman wateyê bi rengna cuda xwandin û ankû hanîna ser ziman, wê di vê çerçoveyê de weke tiştêkî asayî bê. Li vir, van rewşan hemûyan, divê ku mirov di çerçoveya têgîna zanîna ziman re lê bihizirê, fahm bike û werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de êdî wê hingî, li gorî ya xwe ya rast wê were ser ziman. Dewlemendîya ziman, hingî wê were dîtin. Ziman, xwe di çerçoveya zanîna xwe ya zimanî de dike ku biafirêne û pêşde bibe. Ev jî, bi aqil dibe. Mirov, di vê çerçoveyê de gotinên aqil diafirênê û bi wê re dihêne ser ziman. Her wusa, weke ku çawa ku gotinên pirr-kirdeyî ku di kurdî de afirandina wan heya. Ankû, weke ku çawa dîsa di kurdî de çî gotina ku hat afirandin dikarê were tawandin û hwd. ..

Li ser têgîna hevgirtin(sentez)kirina gotina re, mirov dema ku dihizirê, her wusa di vê çerçoveyê de mirov bi zimanê kurdî re bi gotinên aqil ên dema me re digihijê têgînekê. Têgîna hevgirtinîyê, her wusa, gotinê, weke gotinên aqil diafirêne. Ev yek jî, bi demê û aqil re dibê.

Li ser nirxîfîya gotinê re me li jor di vê çerçoveyê de hinekî hanîbû ser ziman. Lê li vir, mirov dikarê bi têgîna hevgirtinîyê re hinekî din jî, lê binerê. Gotinên nirxî ên weke "mazin" û hwd ku mazinbûnê û hwd didina nişandin, wê bi aliyê gotinê ê şûbjeyî re were ser ziman. Di vê çerçoveyê de dema ku mirov li gotinê dihizirê, her wusa gotin, weke têgîneka ku bi awayê wê yê şûbjeyî ku mirov ji wê fahm bike dibê. Di nava têgîna ziman de pêşketina aqil bihiş, wê aliyekî wê şûbjeyî bê ku bi ziman re dihê ser ziman.

Li vir, ya ku mirov bi gotinê re fahm dike ew a ku gotin, weke têgînekê dema ku mirov wê kifş dike, di demê de li gorî ast û radaya demê ew kifşkirina wê dibê. Yanî, kifşkirina gotinê, wê weke têgîneka demkî bê. Divê çerçoveyê de her wusa dema ku mirov li watekirin û wateya wê ya

”hevbeş” jî dihizirê bi aliyê aqilî ê şûbjeyî re mirov di vê çerçoveyê de bi afrînerîya demê re wê kifş dike. Yanî, gotin, weke nirxeka demî ya ku bi demê re xwe pêşdixe bi pêşketina zanîna zimên re. Her wusa, ev pêşketina ku em bahse wê dikin jî, pêşketina aqil û ankû zanînê ya.

Li vir, bi demê re kifşkirina gotinê, di vê çerçoveyê de weke têtîneka demkî, wê ev têtîna jî xwe li ser fahma têtîna ya aqil ku di demê de pêşketîya ava bê. Minaq, di serdemên hûrî û mîtannîyan de aqil bi rengê ’felsefeyê’ pêşketîya. Di vê çerçoveyê de gotinên ku dihên avakirin û ser ziman jî, wê gotinên vê rengê aqil û hizirkirinê bin.

Felsefe, weke têtîneka temenê wê jî li ser pêşketina ziman ava ya. Em nikarin felsefeyê bê pêşketina ziman werênina ser ziman. Gotinên aqil, ku me li jor bi gotinên dirêj ên aqil re bahsa wan kir, weke gotinên dema vê rengê aqil jî mirov dikarê bahse wan bike. Di vê çerçoveyê de, li ser gotinan re hizirîn û hewldana xwe gihandina aqilekî û ankû têtînyekê, wê weke rêbezaka kirina felsefeyê jî bê. Her wusa, di vê çerçoveyê de hewldana felsefeyê ya sereke ew a ku hertiştî ku karibê ”vêbeje.” Çendî ku karî **vebêjt**, her wusa wê êdî kirina felsefeyê were kirin. Vebêjtina bi xwezayê û jîyanê re wê pêş bikeve. Her wusa **vebêjtîya** bi ziman re wê bi serekeyî pêş bikeve.. Mirov, wê biaqil xwe re karibê, şîrove û dahûr biike. Têtîna şîroveyê, di çerçoveya vegotina rewş bi gotin û ankû hevokên ku hatina bijartin re ya. Dahûrî jî, bitêtîneka lêkolînê û lêgerînê, hewldana bi şîroveyî ji hevdû derxistin û bi wê re dane fahmkirinê ya. Di vê çerçoveyê de têtînyê wê bi gotinê re dihê ser ziman. Me li jor bahse gotinê û pîrkirdetîya di hundurê wê de kir. Dema ku me minaq, gotina ’têtîhiştinê’ û ankû ya ’zanebûnê’ ji hevdû felişand û hewlda ku navaroka wê bi gêtînyên wê navarokî ên hevbeş fahm bikin, hingî me dahûrîyek kir. Ev rengê vegotinê, bi ziman re dahûrîyê dihêne ser ziman. Dahûrî, hewldana fahmkirina navarokê ya.

Felsefe jî, divê ku mirov di çerçoveya vê mijarê de bi wê re çend gotinan bi wê re bi bêje ku bi têtînek dahûrî pêş dikeve. Lêgerîn û lêkolîn, her wusa, aliyê wê yê dahûrî, li vir xwe bi felsefeyê û rengê hizir û hizirkirina felsefeyê re xwe dide nîşandin û dîyarkirin. Felsefe, di vê çerçoveyê de bi zimanî, ku mirov di çerçoveya zanîna ziman de li wê bihizirê, mirov wê karibê bi wê re vê yekê werêne ser ziman. Hewldana fahmkirina hertiştî, bi navkirin û her wusa salixkirinê ya wê, wê regekî dahûrî bê. Her wusa, bi felsefeya dahûrî jî, re ji hevdû derxistina têtîna û

hizrên ku di nava hevdû de û ankû di hevdû de di buhurin a. Di vê çerçoveyê de dema ku felsefe, derdikeve û bi vê rengî pêş dikeve, hingî, mirov dikare werêne ser ziman ku êdî bi têtîna li gorî wê ziman jî xwe pêş dixê. Gotinên ziman ên serdema aqil, gotinên vê têtîna salixkirinê a bi lêgerînê, lêkolînê û her wusa bi hewldana xwe gihandina navarokê û bi jî hevdû derxistinê re ku afirîna na. Yanî, ew gotinên wê salixkirinê na. Ev jî, gotinên aqil in. Gotinên ku bi aqil hatina afirandin in. teybetîya gotinên serdema felsefeyê ên ku dihên afirandin, mirov bi rengê gotinên 'avêsta' ya Zerdeşt re baş û qanc dibîne. Her wusa rengê gotinên ku ew dihêne ser ziman dirêj û berfireh in.

Armanca gotinên dirêj û ankû berfireh çî ya? Her wusa armanc ew a ku bi têtînek mazin re ku werê hanîn ser ziman. Mejî, tiştê ku dibîne û her wusa ku bihiş dike, dixwezê ku wê werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de bi ziman re dikeve lêgerînê de ku gotinên li gorî wê kifş bike û bi wê re ku wê rengê hişê werêne ser ziman. Di vê çerçoveyê de gotinên dirêj û ankû mazin, weke gotinên ku nîv-hevokî na. Gotinên dema qil, di vê çerçoveyê de xwediyê wate û têtîne na.

Gotinên dirêj, di vê çerçoveyê de dema ku mirov li wan dihizirê, her wusa, weke gotinên berfireh in. Bi wan re hewl dihê dayîn ku bi berfirehî û dirêj û ankû mazin werê hanîn li ser ziman. Ev gotin, di vê çerçoveyê de xwediyê hinek armanca. Gotinên dirêj, di dema Hûrî û mîtannîyan de hin bi hin binavan û hwd diafirin. Hin bi hin hewl dihê dayîn ku mazin werê hanîn ser ziman. Divê çerçoveyê de pêşî li ser navan re ew dihê hanîn ser ziman. Di nava çanda kurdan de ku zaro navê wê hat hildan li dawîya navê wan ya navê dayîka wan û yan jî yê bavê wan dihê daynîn. Ev jî, bo ku nasnematîya wan were hanîn ser ziman. Bo danasîna wan, ev yekê bi vê rengê dihê kirin. Wê bi demê re bi rengên bi vî rengî, hin bi hin mejî pêşî, li dûv hevdû gotinên dirêj ava bike û bibêje.

Têtîna gotinên dirêj, her wusa bi armanca wan re dihê dîtin. Di vê çerçoveyê de wê weke gotinên aqil, bi çerçoveyî ku werê hanîn li ser ziman, wê li wan werê hizirîn. Li vir, pêvajoyên dirêj ên kurdî, wê di vê çerçoveyê de fêrîyeka bixweza di çerçoveya zanîna ziman de di mejîyan de bo afirandinê bide çêkirin. Mejî, dema ku serwerîya wê ya li gotinê û navaroka wê bû, wê êdî bi hesanî afirandinê jî wê bi rengê ku dixwezê wê bide kirin. Lê ev jî, li ser kirdeyê û serwerîya li têtîna kirdeyê û hwd re

dibê. Divê çerçoveyê de têngîna li kirdeyê, wê gotinê bike weke amûrekî ku mejî lê serdest a dikarê wê bi rengê dixwezê biafirêne.

Di vê çerçoveyê de divê ku mirov werêne ser ziman têngîna gotinê, wê pêşketina xwe di nava pêşketina aqil de bike. Dema ku aqil li wê serdestî nebû, wê ew serdestîyê li ziman û rengê hizirkirinê bike. Her wusa, êdî li gorî wê çawa wê bê afirandin, wê rengê aqil bide dîyarkirin. Felsefe, li vir, têngîneka ku di vê warê de destê mirov di derbarê hizirkirinê de ku xort dikê ya. Her wusa, mirov pêşî bi wê re li ziman bi zanîna wê re serdest dibê. Hewldana fahmkirinê pêşî bi hizirkirinê wê bi gotinê re destpê bike. Ji ber ku felsefe, meşandina aqil bi aqilê ku heta wê demê pêşketîya ya.

Li vir, divê ku mirov vê yekê jî bibêje ku di aslê xwe de astaka aqil ya mazin bi xwe re dihêne ser ziman. Ez nikarim bêjim ku felsefe weke destpêka afirandina aqil û ankû bi wê re aqil bidest afirandinê kirîya ya. Lê ez dikarim bêjim ku bi wê re ji astaka nû û pê de, aqil bidest afirandinê kirîya. Ev ast jî, asta ku êdî aqil bi mejiyê mirov re ku li mirov êdî di jîyane mirov de hin bi hin serdest û serwer dibe û dikeve temenê pêşketina di jîyanê de. Her wusa li gorî vê astê pêşxistin û pêşxistina ziman û hwd, wê di vê çerçoveya afirandina gotinên aqil û hwd de bê. Aqil, di vê serdema felsefeyê de di wê astê de ya ku mirov dema ku di gotinê re dinerê, dikarê dûnyayê bi hişê xwe re bibînê. Ev jî, weke rengê pêşketina wê ya bi demê re ya.

Di vê çerçoveyê de aqil êdî pêş dikeve. Aqil, dema ku pêş dikeve, êdî bi wê re giringîya têngîna zanîna ziman jî, xwe bi wê re radixe li berçav. Ev rewş, wê bi hevdû re di nava ahengekê de pêşketina xwe bidina çêkirin û jînkirin. Di vê çerçoveyê de têkilîya aqil û ziman, weke çerçoveyekê divê ku mirov werêne ser ziman. Gotinên dema aqil ku êdî pêş dikevin û bi wan re dûnya dihê dîtin û 'fahmkirin' û hwd, wê weke aliyekî giring ê bi pêşketina ziman re jî bê. Di vê çerçoveyê de bi ziman û gotinê re di çerçoveya bi navkirin û biwatekirinê û hwd de wê bi ziman re pêşketin di jîyanê de bibe. Gotin, divê çerçoveyê de divê ku li gorî têngîna fahmkirinê bin û werina avakirin. Li gorî ku karibin bidina fahmkirin û werênina ser ziman bin. Di vê çerçoveyê de wê êdî hewldana ji nû ve afirandina gotinan bi demê re dem bi dem wê bibe. Hewldana fahmkirinê bi aqil û pêşketina aqil re derdikeve li pêş. Ev fahmkirin, çi ya û ne çi ya, li ser wê jî bi gotinên ziman û hwd re pîrr serî hatîya wastandin. Bi gotinên ziman re hewl hatîya dayîn ku were fahmkirin. Dema ku gotin, tişteki hanîna ser ziman, ew

gotina ku bi wê ew tişt hat hanîn ser ziman, çendî ew gotin wê tiştê dihêne ser ziman, bi hizikirina li wê re li têgîneka di ahengekê de lê hat lêgerîn. Ev nêzîkatî û hewldan, wê her wusa hewldanên fahmkirinê bi ziman re jî bidina pêşxistin. Di vê çerçoveyê de li ser gotinên ziman jî pirr serî êdî dihê wastandin. ...

Abdusamet Yigit, Cizira bota/Kurdistan.

,